
# FELSEFEVAN

## Kovara felsefî, zanistî û ramanî

**hejmar 6, sal 2.**
**nîsan, gulan, hezîran 2016**




**DENG Û RENGÊ FELSEFE Û ZANYARIYÊ**

**KOVARA FELSEFEVAN**
**Kovara felsefî, zanistî û ramanî**

Xwedî û berpirsiyarê giştî

**Ali Gurdilî**

*Chef Edîtor*

Ali Gurdilî

Hejmar 6, Sal 2

Nîsan, Gulan, Hezîran 2016

Sêwirandina berg û rûpelan:

Weşanên Felsefevan

Berg

school of athens, greece the ancient greek philosophers

E-peyam: felsefevan@hotmail.com

facebook: https://www.facebook.com/KovaraFelsefevan

twitter: https://twitter.com/KovarFelsefevan

Malper: www.felsefevan.org



# BIBE ABONEYÊ KOVARA FELSEFEVAN

Heke hewesa te li ser felsefe, civaknasî, psîkolojî, lêkolîn, mîtolojî, aforîzma, hevpeyvîn, zanist û hwd. hebe û bixwazî ku bi zarê xwe yê şîrîn û zimanekî herikbar haya te ji wan mijaran hebe, pêşniyazeke me heye; ji kerema xwe bibe aboneyê Kovara Felsefevan. Abonetiya ji bo salekê/salewext (çar jimar) 40 TL û ji bo Ewropayê jî 40 € ye.

Bo têkilî: felsefevan@hotmail.com

Buhayê Kovarê: Li Kurdistana Bakur û Turkiyeyê: 10 TL û ji bo Ewropayê jî, 10 € ye.

facebook: https://www.facebook.com/KovaraFelsefevan

twitter: https://twitter.com/KovarFelsefevan

Malper: www.felsefevan.org

Hotmail adres: felsefevan@hotmail.com

**NAVEROK**

01- Bangawaziya Felsefeyê | Ali Gurdilî
07- Hevşêwaziya Hişî | Emre Mûhargînî
10- Felsefe Ronahiya Bîra Netewî ye | Fêrgîn Melîk Aykoç
11- Felsefe, Dîn û Îdeolojî | Ali Gurdilî
19- Însan Heyîneke Felsefîk e | Ferhat Dayan
20- Dibistana Stoa / Stoaparêzî | Ali Gurdilî
25- Çima Pêdiviya Kurdan Jî Bi Felsefeyê Heye? | Shînê Bekirê Soreklî
26- Dibistana Epîkurosparêz / Epîkurosparêzî | Ali Gurdilî
30- Felsefe, Vajbawerî û Dilwasiyê Tazî Dike | Nûrhat Heftaro
33- Septîsîzm | Ali Gurdilî
37- Pêdiviya me bi Dirûstî, Heqîqet û Rastgotinê Heye | Çorê Arda
39- Campanella û Welatê Rojê | Mahmut Ozçelik
47- Li Ser Hebûnparêziyê | Jan JAN
52- Felsefeya Dibistana Stoayê û Bandûra wê ya li ser Ramana Îslamê | Prof. Dr. Ibrahim Çapak
60- Bextewariya Mirovî û Bajarê Xwedîerdem di Ramanên Farabî de | Georgios Steris
66- Felsefe Fikirîna Pirhêlî ye | Mahmut Ozçelik
69- Zayîna Ramana Aqlî | Ali Gurdilî
73- Felsefe û Civak | Najbeer AL Shekh
75- Bergson û Felsefeya Fransî ya Dewra Dawî | Ali Gurdilî
79- Hevpeyvîn bi Têmûrê Xelîl re
90- Mirov û Siberoja Felsefeyê | Ali Gurdilî
93- Komponêntên Felsefeyê | Brahîm Şêxo
95- Hevpeyvîn bi Tengezarê Marînî re
104- Li Ser Pêdiviya Felsefeyê | Ali Bayram
105- Pêdiviya Felsefeyê | Çetoyê Zêdo
107- Ziman, Huner û Felsefe | Xalî Bîngol
110- Civaknasî: Prensîp û Unsûrên Bingehîn Yên Demokrasiyê
112- Psîkolojî: Zanistên Din û Psîkolojî
113- Ferhengoka Felsefeyê (06)

# BANGAWAZIYA FELSEFEYÊ

Jiyana me ya rojane, pirî caran me bi gelek tiştên ku nepêwîst in mijûl dike. Ligel vê yekê çi dema ku em derfetê dibînin, em xwe ji wan pêdiviyên rojane rizgar dikin û li ser wateya wan difikirin. A niha wê demê em dest bi pirsiyarên xwe yên bingehîn dikin, ku ew pirsiyar ne pirsiyarên rojane ne. Ew lêpirsîn û pirsiyar, dibe ku bi gelek hêlên jiyanê yên cihêreng re têkildar bin. Mesela di warê siyasetê de, bi awayekî bêrawest mirov behsa *'azadî'*, *'wekhevî'* û *'dada civakî'* dikin û li ser van mijaran digengeşin. Lê carinan mirovek dertê û pirsên mîna <*baş e, bi rastî jî wateya serbestiyê ya rastîn çi ye?*> yan jî <*dema ku behsa wekheviyê tê kirin, em jê fahma çi dikin?*> dike û ew rewş, dibe ku vebiguhere rewşeka ku dahûrandina wê gelekî dijwar e. Mesela ew mirov dikare pirseka wiha jî bike: <*Gelo ma em jê biguman in, ku serbestî û wekhevî li dijî hev in û di pêvçûnekê de ne?*> **Dîsa dikare bibêje ku** <*heke me bikariba jiyana xwe bi serbestî bijiya, ma wê demê em ê ne di rewşeka newekhev de bûna? Ev yek jî, bi tenê ma ne bi têkilîpêkirina dewletê dikare ji holê rabe? Heke rewş wisa be, ji bo me tu feydeya guftegoya wan pirs û têgehan tune. Lewra, di vê xalê de nakokiyek xwe dide der.*>

'*Destpêka felsefeyê, meraq e û felsefe,*
*bi meraqê dest pê dike.'*
***PLATON***

Çi dema ku mirov pirsên bi vî rengî bikin, mirov dikare bibêje ku ew êdî bi awayekî felsefîk difikirin. Pirsên ku me li jorê wan weke mînakan dan, mijarên felsefeya siyasetê ne û pirsên felsefîk in. Her warê jiyanê, dibe ku rojekê bibe babeta pirsyarikirinên bi vî rengî yên bingehîn. Ango her warên jiyanê, dikarin bibin mijarên felsefeyê yên bingehîn. Hemû gotinên ku têne gotin, divê bikaribin verin rexnekirin, dahûrandin û pirsyarîkirin. Lewra ji bo felsefeyê nîqaşkirin, îdîakirin û peyitandin girîng in. Lewma jî carinan wiha jî tê gotin: Ji bo kirina felsefeyê, herî kêm du mirov pêwîst in û

felsefe, bi hinekên din re pêkanîna çalakiya lêgerîna heqîqetê ye. Hiqûqzan *(mafnas)* bi awayekî bêrawest behsa sûc, bêtawanîtî, dad û dadgeheka dadwer dikin.
Dîsa doktorek, dema ku pirsa <*tenduristiyeke bêhempa heye gelo yan na? Heke tunebe, wê demê em ê çawa bikaribin behsa xweşiyê bikin?*> ji xwe bike, eşkere ye ku wî dest bi felsefeya tipê *(tenduristiyê)* kiriye. Di hemû warên jiyanê de, şaxê felsefeyeka ku li rêbaz û têgehên bingehîn yên giştî vedikole heye. Lewma felsefeya zanistê, felsefeya ol, felsefeya ehlaqê, felsefeya heyînê, felsefeya siyasetê, felsefeya zanayiyê, felsefeya jiyanê, felsefeya mirovî û hwd. hene. Pêkhênerên babetên navborî, bala xwe herdem didine felsefeya mijarên xwe û li wan vedikolin.

Fîlozofeke felsefeya siyasetê dema ku pirsa <*azadî çi ye?*> dike, divê mirov pê bizanibe ku daxwaza wî ne tenê wergirtina danasînek *(pênaseyeke)* wê têgehê ye. Derdê wî/wê heke bi tenê ev bûya, bêguman wî/wê dikaribû li ferhengê jî mêze bikira. Heçku pirs, ji wateya peyvê berfirehtir e. Bi riya wê pirsê, fîlozof dixwaze ku di jiyana me de bi rol, girîngî, pêdivî û bi wateya peyvê *(têgehê)* jî bizanibe û bi awayekî nedîtbar, li ser têgehê bifikire. Dîsa bi riya wê pirsê, fîlozof dixwaze ku hem zêhna xwe û hem jî zêhna me rohnî bike. Xebateka bandorker û efsûnî be jî, rohnîkirin û pênasekirina têgehan, suretê felsefeyê yê xwiyakirî ye. Heçku fîlozofên mezin, xwe bêtir berdana kûrahiya wan têgehan û li hêlên bingehîn yên jiyana me vekolane.

Mirov, çavên xwe li dinyayeke nenas vedikin û pê nizanin, ka ew çawa hatine vê dinyayê jî. Eşkere ye ku ji hêla wesfên xwe yên bingehîn ve çerçoveyeka dinyaya me, ya ku ji dem û warê pêk hatiye heye û ev çerçove, gelek nesneyên madî yên cihêreng diguncîne.
***Ji ber vê çendê jî, fîlozofan gelek pirsên bi vî rengî pirsîne:***
<*Dem/zeman çi ye?*>

<*Gelo bi rastî jî, hemû tiştên ku henê* <*mirov jî di nav wan de*> *nesneyên madî ne yan na?*>
<*Gelo, ma rast e ku ji bilî madeyê tişteke din tune?*>
<*Tiştekê ku ne madî be, çawa dikare hebe?*>
<*Heke bikaribe hebe, xwezaya wê hebûnatiyê çi ye?*> û xwestine ku xwe bigihînin wateya nesneyan *(heyînan)* yên berfireh û kûr û têgihiştineka wan ya gelemperî *(giştî)*. Dema ku vê yekê pêk tînin jî, mîna mijareke pîroz li meseleyê mêze nakin û xwe naspêrîn peyvên desthilatdariyekê.
Dibe ku mîna şexseke, baweriyeke fîlozofan jî hebe û ew jî, şexsên bawermend bin. Bêguman, em dizanin ku fîlozofên xwedênenas jî hebûne, hene û wan jî baweriya xwe, bi baweriyeke pîroz neanîne û naynin. Lê em dizanin ku gelek fîlozofên mezin jî, xwediyê baweriyên olî bûne. Ligel vê yekê ji bo peyitandina *(piştrastkirina)* felsefeyên xwe, ti caran serî li ol *(dîn)* nedane.

Peyîtandineke felsefî, delîlên xwe mîna delîlên aqilane *(zêhnî)* di nava xwe de diguncîne. Lewra tiştên ku felsefe ji me dixwaze ne bawerî yan serîtewandinek e, pêrazîbûneke aqilane ye. Felsefe dixwaze ku sînorên aqilê me nîşanê me bide û bizanibe, ka aqil ta çi radeyê dikare bizanibe? Tiştên ku felsefe dixwaze bi riya aqil bi wan bizanibe, tiştên bingehîn in. Ji ber vê yekê jî felsefe, pirsên ku bi zêhn û xwezaya zanayiyê re têkildar in dipirse.
Ê baş e ji bo ku em bikaribin hemû pirsên xwe bibersivînin, divê em ji kû dest pê bikin? Bi rastî jî, em dikarin bi tiştekê bizanibin gelo? Heke em pê bizanibin, em dikarin bi çî bizanibin? Ger em pê bizanibin jî, em ê çawa jê ewle bin?
Bi gotineke din, em ê çawa bizanibin ku em dizanin?

Pirsên bi vî rengî, mirov dikare bibêje ku pirsên bingehîn yên felsefeyê ne. Fîlozof ji bilî pirsên ku bi cîhana me ya hawirdorî re têkildar in; pirsên ku bi xwezaya sehek, azmayîş û zêhnê re têkildar in jî dikin. Heke em bi gotineke giştî bibêjin, wê demê em dikarin bibêjin ku di berfirehbûna felsefeyê de du pirsên bingehîn

herdem di navendê de bûne. ***Pirsa yekemîn*** *<xwezaya hemû tiştên ku hene, çi ye?> ye û ya* ***duyemîn*** *jî <heke em bikaribin bi wan bizanibin, em ê çawa bi wan bizanibin?> ne.*

*'Danîna zagonan, ne karê felsefeyê ye. Karê felsefeyê, xwegihandin û çareserkirina darazên taybet yên aqilê hevpar e.'*
***Immanuel Kant***

Lêkolîna *(lêpirsîna)* pirsa yekemîn, bi heyînên ku hene û xwezaya wan re têkildar e û şaxa felsefeyê ya ontolojiyê ***(hebûnnasiyê)*** pêk tîne. Pirsa duyemîn ya ku bi xwezaya zanayiyê re têkildar e jî, şaxa epîstemolojiyê pêk tîne. Berfirehbûna van herdu pirsan û pirsên ku ji van du pirsan dertêne holê, di dîroka felsefeyê de bûne du tevgerên bingehîn. Şaxên girîng yên mîna felsefeya ehlaqê, felsefeya siyasetê, felsefeya zanistê, estetîk, felsefeya dîn û şaxên din, xwe berdidine wan du şaxên bingehîn yên felsefeyê. Şaxên din yên felsefeyê herçuqasî bo felsefeyê girîng bin jî; pirsên ku bi heyîn, xwezaya heyînê û awayê zanîna me ya heyînan re têkildar in, ji hêla mantiqî ve ji pirsên din girîngtir in. Bêguman, dibe ku ti caran em ê nikaribin bersivên çend pirsên ku ji bo me girîng in bi dest bixin. Lê, di pêşiyê de em bi vê yekê nizanin. Ji ber vê yekê jî, ti caran divê em dev ji pirsên xwe bernedin û di lêgerîna bersivan de, xwedîbiryar bin.

Di dema lêgerîna bersivan de, heke em bigihêjin wê baweriyê ku bersiva pirsa me tune û sebebên vê yekê yên xurt hene, wê demê divê em rêyeka lihevkirinê peyda bikin. Mîna hemû encamên felsefeyê, divê ev encam jî xwe bispêre sebebên xurt û saxlem. Ji ber baweriya xwe yan ji sedemên din yên cihêreng, divê em hema di cih de qîma xwe bi encamê neynin û divê em bizanibin, ka em çima jê bawer dikin. Ji bo felsefeyê, pêşengiya aqil pêwîstiyek jêneger e û ev yek, taybetmendiyekê felsefeyê ya xweser e. Taybetmendiya ku felsefeyê ji dîn û hunerê cihê dike jî, ev e. Di mijarên olî *(dînî)* de carinan serî li aqil bidin jî, em dizanin ku di mijarên olî de rola wehî, ayîn *(dêlindêz)*, bawerî û stûxwarkirinê

gelekî mezin e û aqil jî, di vê rêyê de nikare herdem rêhevaltiya mirovan bike. Hunermendên afirander jî, mîna fîlozofan bi temamî di lêgerîna heqîqetê de ne û dixwazin wan rastiyên veşartî, yên ku li pişt tiştan in bibînin û bi awayekî kûr, têbigihêjine jiyana mirovî. Belam awayê diyarkirina fikrên wan, ji ya fîlozofan cihê ye. Xebatên wan ji peyitandineke aqlî zêdetir, xwe dispêrin têgîhanan û ferasetê. Di navbera felsefe û zanistê de jî, sînorekî cihêreng li ser kar e. Zanyar jî, mîna fîlozof û hunermendan, daketine lêgerîna heqîqetê. Ji ber vê çendê jî dixwazin ku derheqê gerdûn, dinya, xweza û jiyana me de xwe bigihînin vedîtinên nû, ji wan vedîtinan wateyên *(şiroveyên)* nû bi dest bixin û ji bo me wan eşkere bikin. Mîna fîlozofan, zanyar jî hewl didin ku ramanên wan beriya her tiştî aqlî bin û xwe bispêrin aqil. Mîna fîlozofan, ev yek ji bo wan jî metirsiyeke mezin e. Belam, pirsên zanyaran xwe dispêrin ezmûn û çavdêriyan û pirsên bi vî rengî ne. Lê em dizanin ku em bi riya tu ezmûn yan çavdêriyan, nikarin pê bizanibin ka destpêk yan dawiyeka demê *(zemanê)* heye yan na. Herweha, ezmûn û çavdêrî, nikarin ji me re bibêjin ka çi <*rast e*> yan jî <*ne rast e.*>
Herçuqasî pirsên bi vî rengî ji bo deranên aqilane guncan bin jî, ji ber ku ne li gorî rê û rêbazên zanistî ne *(ezmûn û çavdêrî)* pirsên felsefîk in û li benda bersivandina fîlozofa ne, mîrateya wan e. Dîsa gelek girîng e ku mirov bizanibe di navbera felsefe, zanist û hunerê de, dubendiyek *(lihevnekirinek)* jî heye. Di nêrîna ewilî de, mirov gelek hêlên wan yên hevpar dibîne. Lê di rastiya xwe de çawa ku dê em ê di vê kitêbê de nîşan bidin, zanist ji felsefeyê derketiye. Diya zanistê, felsefe ye. Cîhana ku felsefe, zanist û huner lê vedikole, heman cîhan e. Her sê jî, bala xwe didine wê nepeniya hebûna dinyayê û nepeniya hebûna mirovî û dixwazin ku bi awayekî kûr têbigihêjinê. Her sê jî, ji best û rexneyê, sûd werdigirin. Her sê jî, ji bo dîtina mirovan encamên xwe eşkere dikin. Belam ji ber ku rê û rêbazên wan cihê ne, kesên ku bang li wan dikin jî mirovên cihêreng in. Ligel vê yekê, lêkolîna zanayî û jiyana mirovî, eşkerekirina tiştên nepen û ji bo têgihiştina hemû

mirovan sererastkirina encamên ku têne bidestxistin, armanca wan ya hevpar e.
Her sê jî, hevdu dewlemend dikin. Mirovê kamil *(gihiştî)*, bala xwe dide her sê waran jî û nikare beyî wan bijî. Felsefe jî, yek ji wan tiştên qîmetdar yên mirovahiyê ye û mirov dikare bibêje ku siberoja wê, dê ji rabirdûya wê dewlemendtir be.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
**07.10.2014**

**jêder**

**1-** Destpêka Felsefeyê. Ali Gurdilî. Weşanên Soran. 2015
**2-** Profesor Bryan Magee. Kurteçîroka Felsefeyê. Weş. Dost.
**3-** Antolojiya Feylesofan. Ali Gurdilî. Weşanên Soran. 2015
**4-** www.felsefevan.org

‘Pîvana, başî û xirabiyê, feraset e. Li gor xwe tevbigere ku tu hem jî bo xwe û hem jî, bo yên din bikaribi a baş bikî. Heke tu li gor xwe tevbigerî, ev yek hem ji bo te û hem jî bo yên din, baş e.’
**(H. Bergson)**

## HEVŞÊWAZIYA HIŞÎ

Li jiyaneke bifikirin, ku hemû rastî û nerastî, başî û nebaşî ji aliyê televîzyon û çapemeniya civakî ve tê kifşkirin.

Li Jiyaneke bifikirin, ku lixwekirin û çanda wê, ji aliyê televîzyon û çapemeniya civakî ve tê kifşkirin.

Li jiyaneke bifikirin, ku bi piranî sînorê sincî û exlaqî, nirx û rûmetên wê ji aliyê televîzyon û çapemeniya civakî ve tê kifşkirin.

Li jiyaneke bifikirin, ku hemû pêdivî û lazmatî û hetanî xwarîn û vexwarina wan jî, ji aliyê televîzyon û çapemeniya civakî ve tê kifşkirin.

Li jiyaneke bifikirin ku pîsîtî, qirêjî û kirêtiyê li ser rûyê vê cîhanê, bi alîkariya televîzyon û çapemeniya civakî, wekî karêkî pîroz û birûmet tê xuyakirin.

(…)

Pir dûr ve neçin. Lewre ev jiyan, jiyana ku îro em di navê de soberiya dikin, bixwe ye. Di roja me de, awê ku ramanwerê fransî Jean Baûdrîllard jî gotiye; ‘***Jiyan di nav televîzyonê da û televîzyon jî di nav jiyanê da winda bûye.’*** Tekevîzyon û çapemeniya civakî ji her alî ve me dorpeç kiriye û bêhn li me çikandiye. Dîsa Baûdrîllard dibêje ku bi alîkariya televîzyon û çapemeniya civaki, em jiyana xwe ya rast najîn û em din av cîhana sîmulasyonan *(texlîdkirin)* de dijîn. Di vê dinya a nerast û derewîn de êdî rastî û nerastî ji hev û dinê nayê cudakirin. Jiyana rast û a derewîn, li hev ketiye û ti standart û bingehek ku bikaribe rastî û nerastiyê ji hev cuda bike nemaye.

Gelo sîmulasyon çi ye û Baûdrîllard çima vê têgînê bikaraniye?

Sîmulasyon; texlîdê tiştekî rast an jî nimana wî tiştê ye. Gava ku em dinêrin, em dibînin ku Baûdrîllard di pirtûka xwe ya bi navê ‘Sîmûklark û Sîmulasyon’ *(Simulacred er Simulation)* ê de, bi bikaranîna peyva sîmulasyonê dixwaze nîşanê me bide, ku jiyana

roja me ya postmodern, ne civakekê rast e, lê wekî ku rast be xuya dike. 'Rastiyek Rawejî' ye ku hêma, nîşane, îmaj û berbiçavî tê de hene. Mirovê postmodern, pêlt û bêtevger û pasîv e û di guherînan de, ti tevkarî û alîkariya wî/ê tuneye û şûna ku ew ê jiyana xwe bijî, ji derve ve bi tik û tenê, temaşeyê bûyerên ku diqewimin dike. Li der û dora wî çi diqewime, kî dimre kî dimîne, kî li kî zilm û zordestiyê dike, kî jar û belengaz û ji birçîna dimire, welatê kî hatiye şewitandin û wêrankirin?... Ev hemû tişt ne xem û derdê wî/ê ne û ji wan tişta yek hebekî jî hewşêwaziya *(konformîzma)* wan kesan xera nake.

Ji kerema xwe, ka werin em binêrin hevşêwazî çi ye?

Hevşêwazî; pejirandina şert û mercên dorhêla civakê yên ku nayên kontrol kirinê, ye. Serîdanîna li ber tehdê ye; pejirandina gerdîş, adet, rêz û rêzikên edebên yên di meriteyê de ne. Em dikarin bibêjin dîtane ya ku erêkirin û pejirandina fikr û dîtinê, belave bi xwe ye. Yanî demîn girtine.

Çawa ku pirî kes di jiyana xwe de dixwazin di nav hevşêwaziyê de bijîn ku ev ji bo laş û tenduristiya wan girîng e, pirî kes weke vê yekê dixwazin ku di nav hevşêwaziya xwe ya hişî de jî bijîn. Ji ber vê yekê jî ew kes bêvepirsîn, bê ku mêjiyê xwe bixebitînin, ev rewşa ku tê de ne wekî rewşa herî baş, bisûd û rast dibînin û îteata wê rewşê dikin.

Îca ka werin em binêrin çi girêdanî di nav cîhana sîmulasyonî û di nav hevşêwaziya hişî da heye.

Awê ku tê zanîn televîzyon û çapemeniya civakî, dîrokê ji nû ve û li gorî dilê rêveber û desthilatdaran ava dike. Gava ku em li dîrokê dinêrin (Û xasma jî di roja me de) em dibînin ku pirî rêveber û desthilatdar yên ku televîzyon û çapemeniya civakî di destê wan da bûne, girse û garanan di çemê xwe da av dane, wan li ser pirê xwe da bihûrandine û wan di merg û satarê xwe de çêrandine, bê ku zirar bidin hevşêwaziya wan a hişî û kirine ku girse û garan di nav cîhana sîmulasyonî de bijîn. Û hem wan kesan

nehiştine û hem jî girse û garanê bi xwe jî nexwestine fêrî û leqayê rastiya vê cîhanê bibin. Bi rastî jî ku hetanî mirov hevşêwaziya xwe ya hişî xera neke û ji cîhana sîmulasyonî dernekeve, mirov fêrî rastiya vê cîhanê nabe. Lêbelê ji bo vê yekê divê mirov wêrek û bitirûş be. Encax mirov hevşêwaziya xwe ya hişî xera bike û ji cîhana sîmulasyonî xwe azad bike, pêda mirov dikare pîsîtî, qirêjî, neheqî, zilm û zordestî û hemû nebaşiya vê cîhanê bibîne û li hemberî wan serî hilde. Lewre awê ku civaknasê faris Alî Şerîatî gotiye: '**Taybetiya mirovan ya herî mezin û binirx, serhildan e. Herkes bi qasî *(wekî)* serhildana xwe binirx e û di pîvana kêmbûna serhildana xwe de, nêzî ajal û nebata dibe.**'

Ê de ka fermo werin em hevşêwaziya xwe ya hişî xera bikin. Lewre ku di hiş û dilê mirov da alozî û gelcoyî tune be, mirov nikare ti carî karekî pîroz û birûmet bike.

**Emre MÛHARGÎNÎ**

10.04.2016

'Ez Sofîst im û mirovan perwerde dikim. Ev çend sal in ku ez di nava vê hunerê de me. Xorto! Ger tu li cem min bimînî, dê tu ê ji roja ewilî ve bigoherî û wê tu ê baştir bibî. Her roj, wê tu ê baştir bi pêşve biçî. Tiştên ku wê ez ê fêrî we bikim, ev in: Di karên malbatî û dewletê de têgihiştina hêza kargerandinê û di siyasetê de pêdiviyên bihêzbûnê. Ez ji bo yek tiştekî sozê didim ku wê ez ê, mirovên azad bikim mirovên şehraza.'

**(Protagoras| Fîlozofê Antîk Yewnanî ê Sofîst)**

**<u>Hişmendî Kakilê Felsefê, Felsefe Ronahiya Bîra Netewî Ye</u>**

**<u>Fêrgîn Melîk Aykoç</u>**

Felsefe ne tenê hezkirin û têgihîştina zanyariyê ye; dema diyarde, pêkahatin, têgîn yan jî mijareyekê dinirxîne bi pirsiyariyên hişmendî, etîk, metafîzîk, pênase û rewşa heyî jî nêzîkê objeya li ber nirxandinê dibe. Ev jî tê wê wateyê ku mijar bi hemû aliyan ve tên veristin û zelalkirin. Bi zanistî şirovekirina rastiyan jî rê li pêş mirov, gel û neteweyan vedike.

Hişmendî kakilê felsefe ye, bi rêya dîsîplîn, azîn û pirsiyariyên cûda, bi her aliyê ve hûrkolîna rastiya bireserê; rêya zanyariya rast ramandin û fikirandinê vedike. Ev jî ji bo kes, kom, civak û gelan jiyanî ye. Her çendî dem bi dem hozan, zanyar û ramanwerên me yên wek Baba Tahîr Ûryan, Meleyê Cizîrî, Ehmedê xanê ûhw.
Di nava sewaneyên helbestên xwe de pirsiyariyên sofîstîk û felsefîk bi cîhkirine jî, ji xetên bîra ereb *(îslamî)* bi tevahî neqetyane. Ji ber vê rastiyê hê di nava me de felsefeyeke bikane di gelek waran de pêşiya ramanê û bîra civakê ronîke, rûneniştiye.

Filosofan di pêşketina raman û bîra neteweyên xwe de rolên mezin lîstine û hişmediyêke têr li pey xwe hîştine. Dema em li neteweyên wek alman, fransiz, ingîlîz, rûs, îtalyan dinêrin; em dibînin ku felsefeya bi destên fîlosofan hatiye geşkirin di bingehê pêşketin û serkeftina van welatan de roleke gelek girîng lîstiye. Ew di zanista vê rastiyê de ne, lema jî li van welatan hima bigire di bin perên her zanîngehê de beşên felsefê hene.

Mixabin ku wekî hemû warê jiyanê em di warê felsefeyê de jî bêpar mane, li ber pêlê felsefeya ola biyanî û dagirkeran ketine, av û av çûne. Bi dîtina min; ev gavên tên avêtin jî hê tenê çirûskên dê bikanin di siberojê de bibin hîmê felsefeyeke kêrhatî ne.

**Fêrgîn Melîk Aykoç**
**14.02.2016**

# FELSEFE, DÎN Û ÎDEOLOJÎ

Di destpêkê de ez dixwazim ku hinekî li ser pênaseya her sê têgehan rawestim û piştre jî, dakevim nav mijara xwe ya resenî. Bi rastî jî, dema meriv bala xwe dide van sê têgehan, meriv dibîne ku têkiliyeke xurt di navbera van sê têgehan de heye û bandûrê li hevdu kirine û hêjî dikin. Di dîroka ramanê de wekî tê zanîn ramana mîtolojîk, wekî ramana sîstematîk ya ewil tê zanîn û pejirandin. Ramana dînî jî, ji dilê ramana mîtolojîk derketiye û xwe bêtir sîstematîze kiriye. Yanî meriv dikare bibêje ku ramana dînî, li gor ramana mîtolojîk, bêtir sîstematîk e. Ramana felsefî jî *(ramana sîstematîk ya felsefî)* bi rexnekirina ramana dînî dest pê kiriye û bi demê re bûye mîna ramaneke sîstematîk û hêzdar.

Ramana zanistî jî, *(zanista gelemperî û teorîk, ne ya pratîkî)* ji ramana felsefî der çûye û bi wî hawî, xwe sîstematîze kiriye. Belam, di hemû dewr û dewranana de, hemû cure zanayiyan bandûrê li hev kirine û ji hevdu ketumet bûne. Mesela dema meriv li felsefeya Serdama Navîn mêze dike, meriv dikare bibêje ku felsefeya navborî, rengeke xwe a dînî *(olî)* hebûye û felsevanên wê demê jî, pirranî merivên oldar bûne.

Ol, felsefe û îdeolojî, sê rahişmendiyên mirovî û hilberên ramana mirovî ne ku bi demê re, xwe sîstematîze kirine û kirasekî civakî li xwe kirine. Armanca her sê rahişmendiyan jî *(di vê xalê de jiber ku dîn (ol) xwe di civakê de organîze kiriye, di heman demê de bûye saziyeke civakî jî. Ango, saziyeke nedîtbar ya civakî; yên wekî siyaset, ehlaq, zewac, hevberdan û hwd.)* xwedêgiravî ber bi **<*ya baş*>** ve dahfdana mirovan û ji bo xwegihandina bersivan, alîkariya mirova ye.

*Ê baş e, gelo bi rastî rewş ev e yan na?Yanî, bi rastî jî armanca her sê rahişmendiyan jî, alikariya mirova ye yan na û em dê çawa têbihêjine wê ferqa ku di navbera wan de heye?*

Ji bo zelalkirina vê pirsê, pêdivî bi destnîşankirina çavkaniya ramana olî, felsefî û îdeolojîk heye, û wê demê em ê çêtir bikaribin bersiva xwe bidin.

<Fikirîn yek ji wan xebat û nîrxên mirovî ê hêja ye û bi vê yekê re mirov, ji heywanên cur be cur cihê dibin. Çimku bi tenê mirov dikare bi hêza xwe ya ramanê hemû gerdûnê, dinyayê, xwezayê û ta civakê jî biguherîne. Heke fikirîna mirovî tunebûya, niha ne pêkan bû ku mirov behsa şaristaniya mirovî jî bike. Çimku fikirîn, weke hêza dahfdanê ye, wek motora pêşveçûnê ye. Bi saya fikirînê meriv li ser wateya objeyan difikire, wan dike lod, ji wan hindek wateyên nû derdixe û di encamê de fikirîn, dibe makîne, firoke, pirtûk û hwd. Ji ber vê çendê jî, mirov tu carê ji hinekên din re nikare bibêje <nefikire!> An jî <wek min bifikire!> Ev gotin an qedexekirin, dawiya jiyana mirovî ye. Mirov çawa ku xwarinê dixwin, avê vedixwin, radibin û rûdinên, wisa jî difikirin. Ev bûyer çawa tiştên xwazî bin, fikirîn jî ramanên cihêreng jî xwazî ne û heta meriv bi hêsanî dikare bibêje ku, tiştekî herî mirovî ye jî.

Dema ku mirov bi alîkariya bikaranîna dest û lingên xwe, bi hebûna xwe hesiya, wê demê pêdivî bi watedarkirina jiyanê kir. Ev ê pêdiviyê *(hewcedariyê)* wiha kir ku mirov, li wateya jiyana xwe bigerin. Ez kî me?, çî me? di xwezayê de hebûna min bi kêrî çî tê? û hwd. Helbet mirov dikare bibêje ku di her heyamê de *(serdemê de)* bersivên mirovan jî cihêreng bûne. Lê dema ku mirovên pêşîn ê ku hê nû nû bi hebûna xwe û bi hêza fikirînê hisiyabû, li hindek bûyerên xwezayî  rast hat û hêza wî negihijte şirovekirina wan bûyeran; wê demê rabû û li heyîneke bihêztir geriya ku, wê heyînê xwe li hemû hawirdora wî rapêçabû. Avê wî dixeniqand, agir wî dişewitand û bayê jî wî dikişkişand…

Li hember vê yekê mirovê pêşîn wiha fikirî ku heyînekî ji wî rasertir heye û xwe li hemû warên jiyanê rapêçaye û gerdûnê bi rê ve dibe. Mirovîne pêşîn wiha fikirî ku ew jî perçeyekê wê heyînê ye û ger ew tunebe, ew jî bi serê xwe tenê nikare jiyana xwe bidomîne. Ev ramana mirovî, di civakê de demekê dirêj berdewam kir û rojekê gihêjte radeyeke wiha ku bûne delk û zagonên civakî. Bûne perçeyeke jiyana mirovî, perestgehên yekemîn hatin

avakirin, oldarên yekemîn di perestgehan de xwe bi cîh kirin û hêdî hêdî ol bû serdetsê hemû jiyana mirovî. Perestgehên wê demê jî, bûn banqeyên toxim û zadê, bûn saziyên alîkariyê, bûn xwarinxana feqîran hwd. Heta dawiya Serdema Navîn jî, vê rewşê kêm zêde wiha berdewam kir. Li ser navê bêolîtiyê an jî bi tawanbarkirina jirêderketinê, bi milyonan mirov di agirên sor de hatin şewitandin, yan jî hatin sêdarekirin. Sedem çî bû? Sedem ew bû ku cuda difikirin û destdirêjiya ramana pîroz dikin. >

Hemû olên dinyayê, wuha diparêz in ku ramanên wan yên pîroz *(ayet, gotin, kitêb, rê û rêzikên olî û hwd.)* heqîqet in û armanca ola wan jî, xizmeta mirova ye. Ji bo vê armancê jî, hem li vê dinyayê jiyana mirovan ya takeksî û komelî dikargerînin û hem jî, wan ji bo dinyaya din *(axretê)* amade dikin. Di dawiyê de mirovên bawermend, bi awayekî hişkebawer ji wan zanayiyan bawer dikin û wusa difikirin ku ew raman, di hemû dewr û dewranan de ramanên rast in û nikarin werin guhêrandin yan jî desttêdan.

Di vê xalê de ramana olî, êdî ne tenê rahişmendiyeke mirovî ye, di heman demê de rê û rêbazeke jiyana takekesî û komelî ye jî, ku dixwaze hemû jiyana bawermendên xwe verast bike. Ev yek jî, dibe sebebê dogmatîzm û hişkebaweriya olî û mirovan ber bi tevgerên xirab ve diajo. Herçuqas hemû ol, xwe mîna riya bextewarî û dilşadiya vê cîhanê û ya din bibînin jî, di rastiyê de wuha nabe û dîn *(ol)*, di destê hinek bawermendan de dibe avaleke zordestî û xirabiyê. Herçuqas çavkaniyên ramana olî, mirov bi xwe bin jî piştre, ev raman vediguhere ramaneke pîroz û rexnekirina wê jî, qedexe dibe. Wekî ku di gelek metnên dîrokî û felsefî de jî hatiye destnîşandkirin ku bingeha ramana olî, mirov bi xwe ne û bi demê re, ev raman veguheriyaye ramanake pîroz yan olî. Mînakeke balkêş, fikr û ramanên Sokrates in ku beriya destpêka olên yekxwedayî, fikra **<*yekê*>** destnîşan kiriye û tiliya xwe ber bi asîmanan ve liba kiriye. Ramana **<*yekê*>** ya Sokrates, li cem Platon vediguher **<*îda'yê*>** û li cem Arîstotales jî dibe **<*Forma Zelal*>.** Dîsa

dema meriv li ramanên Plotînosî mêze dike, meriv dibîne ku gelek feylesofên îslamê jê ketumet bûne û piştre, ramana Wahdetî Vucudê ***(Yekîtiya Heyînê)*** parastine.

Ji bo têgihiştineke çak ya mijara ramana felsefî û ramana olî, pêdivî bi zanîna wesfên wan heye, ku dê mijarê zelaltir bikin. Di destpêkê de meriv dikare bibêje ku herdu zanayî jî, zanayiyên kirdewar in û ne teqez in. Lê angaşta ramana olî ew e ku xwe weke ramaneke naguhêr û teqez *(misoger, qutebir)* dibîne. Wekî çend mînakan, dixwazim çend wesfên wan li jêr aresteyî we bikim:

**Zanayiya Olî**: Di vê zanayiyê de, gurza têkiliya kirde û heyberê, afiraner *(Xwedê)* yan jî, pîrozî ye. Weke tê zanîn, ol sîstemeke baweriyê ye û di vê sîstemê de, fermanên Xwedê bi navcîtiya pêxemberan têne hinartin/şandin. Zanayiya olî, xwe disperê pirtûkên pîroz û wehiyê û jiber yekê jî, naguher e û nikare were rexnekirin. Ev yek jî, nîşan dide ku zanayiya olî, zanayiyeke hişkebawer *(dogmatîk)* e. Bingeha zanayiya olî herçiqas girêdayê baweriyê be jî, zanayiya olî zor dide mirovên nebawer û dixwaze ku ew jî, baweriya xwe pê bînin. Mesela, heke li gorî zanayiyeke olî; Xwedê di heft *(7)* rojan de dinyayê afirandibe, pênebawerî nabe û ev zanayî, nikare were rexnekirin. Ev yek, taybetmendiya zanayiya olî ya dogmatîk e. Lewra ev zanayî ji layê Xwedayê afiraner ve hatiye şandin û nabe ku mirovî pê baweriya xwe neynin, yan jî jê fikaran bikin. Erka zanayiya olî ew e ku hem li vê dinyayê, hem jî li dinyaya din; verastkirina jiyana giyanî ye. Xwedayê afiraner bi rêya wehiyê, hem jî vê dinyayê û hem jî ji bo axretê, hindek delk û zagon bi rê kirine û divê hemû mirov, li gor van delk û zagonan tevbigerin. Bi vê yekê re jî, ji aliyekî ve jiyana mirovan tê verastkirin û li aliyê din jî, di babetên wekî afirandin, axret, mirin, tevgera ehlaqî û hwd. de ku babetên derê ezmûna zanistî ne, hinek zanayî têne vegotin. Zanayiya olî, ji ber ku nabe babeta ezmûn û çavdêriyê, weke zanayiyeke kirdewar *(subjektîv)* tê pejirandin.

**Zanayiya Felsefî:** Zanayiya felsefî, di encama têkiliya fîlozof û nesneya wî/wê de dertê holê. Fîlozof berê her tiştî dixwaze ku pê *(bi heyberê, bi nesneyê)* bizanibe û bi vê helwestê, xwe nêzîkê babeta xwe dike. Zanayî jî, wê di dawiya vê têkiliyê de bi helwest û awireke rexnekar, dê weke hilberekê derbikeve holê.

***1- Zanayiya felsefî rasyonel (mantiqî) e:*** *Zanayiya felsefî, mantiqî ye. Nivîsareka felsefî, beriya her tiştî divê li gor mantiqê be û mantiqî be. Di naveroka xwe de, divê tu nakokiyan nehewîne.*

***2- Zanayiya felsefî, bi rêkûpêk (bi sîstem) e:*** *Zanayiya felsefî, ji hêla mantiqê ve dişibe karê honandinê. Fîlozof, ramanên xwe bi awayekî hûr û kûr; ji tevayiyê dest pê dike û bi awayê pêşniyaran pêşkêş dike. Ji van pêşniyaran jî, xwe digihîne encaman. Encama ku ji layê fîlozof ve hatiye bidestxistin, ji bo têgînîkirinê yan jî ji bo fikreka din; vediguhere pêşniyareka serdestpêk û heta ku digihêje pêşniyara dawî, bi vî awayî berdewam dike.*

***3- Zanayiya felsefî, zanayiyek hevgirtî ye:*** *Zanayiya felsefî, ji ber avahiya xwe ya mantiqî û rêkûpêk, divê hevgirtî be jî. Ramanên ku tênê pêşkêşkirin, divê hevdu çewt dernexin û bikaribin hevdu temam jî bikin. Ramanên bi hevdu re ne girêdayî, yên derheqê heyînê de; ji bilî felsefeyê, mirov dikare bibêje ku wê ew encax di asta ceribandinê de bimînin.*

***4- Zanayiya felsefî, zanayiyek tevdeyî ye:*** *Zanayiya felsefî, derheqê tekaneyan (yekhejmar-tekîl) de fikrên xwe nabêje. Ango, ji bo felsefeyê yeko yeko wesfên daran, di rêza duyemîn de ye. Ji bo felsefeyê ew wesfên ku hemû daran dikin dar, girîng in. Lewma jî felsefe, ji me re yeko yeko behsa taybetmendiyên her darekê nake. Lê, di derheqê hemû daran de bi nêzîkayîtêdanek tevdeyî, dikare hindek zanayiyan bide me.*

***5- Zanayiya felsefî, zanayiyek nedîtbat/razber e:*** *Zanayiya felsefî, di nav hewl dana bi awayekî gelemper de, bi awayê razberkirinê dertê holê. Pirsa felsefeyê* **< Çî? >** *ye. Ango ji bo felsefeyê ne dar, lê daristan girîng e. Felsefe dibêje; <Çawa dibe ku em ji vê nesneyê re dibêjin dar?> Ji bo felsefeyê, ya girîng ev e. Piştî vê yekê, ew taybetmendiyên ku daran dikin dar, ew êdî ne taybetmendiyên yek dareke ne; ew vediguherine taybetmendiyên hemû daran. Ev yek jî, taybetmendiya zanayiya felsefî ya* ***<razberîtiyê>*** *ye.*

***6- Zanayiya felsefî, ji bo fikrên din jî dibin bingeh:*** *Di dema hilberandina zanayiya felsefî de, fîlozof bala xwe didinê ku fikrên wan, ji bo fikrên din jî, bikaribin bibin bingeh û spartek.*

***7- Zanayiya felsefî, zanayiyek kirdewar e û ne misoger e:*** *Zanayiya felsefî weke misogeriya zanistan, ne xwediyê misogeriyekê ye. Felsefe, ti caran nakeve lêkolîna misogeriyê û helwesteka wê ya wiha jî tune. Felsefe, di tu mijaran de, gotina xwe ya dawî nabêje û derdekî wê ya bi vî rengî jî tune. Zanayiya felsefî ji ber ku ji layê fîlozofan ve tê hilberandin û ramanên her fîlozofekî ji yê din cihêwaz e, ji misogeriyê dûr e û zanayiyek kirdewar e.*

***8- Zanayiya felsefî, tiştên ku divê pêk werin dibêje:*** *Ev yek, taybetmendiyeka girîng ya zanayiya felsefî ye. Zanayiya felsefî, herdem ne tiştên ku hene, lê tiştên (zanayiyên) ku divê hebin dibêje.*

***9- Zanayiya felsefî, têgînî (kavramsal e) ye:*** *Fîlozof, têgînan (têgehan) hildiberîne û li hawirdora wî, têgîn herdem ne amade ne. Fîlozof bi awayekî cihêreng xwe nêzîkê têgehekî dike ku, ev helwesta wî wiha dike ku ew têgeh, ji nav loda têgehên ji rêzê derdikeve. Mesela têgeha* ***<hilik>*** *a Arîstoteles,* ***<îdeaya>*** *Platon,* ***<cogitoya>*** *Descartesî û* ***<geîsta-rih,giyana>*** *Hegelî, bi vî awayî ne.*

***10- Zanayiya felsefî, şopên dema xwe dihewîne:*** *Di ramanên her fîlozofekê de, şopên dema wî hene. Lewra fîlozof jî di civakeke de dijî, bandorê li civaka xwe dike û dikare di bin bandora civaka xwe de jî bimîne.*

***11- Zanayiya felsefî, li ser hev dicive:*** *Zanayiya felsefî, weke zanayiya zanistî bi pêş ve naçe, encax dikare li ser hevdu bicive. Weke mînak: Zanyarek, dema ku li ser kêşanê ezmûnekî pêk tîne; ranabe hemû zagonên kêşanê ji nû ve îcad nake (naceribîne); ew weke zagon ji xwe hene û zanyar, bi tenê wan bikar tîne. Lêbelê fîlozof, ji bo ku bikaribe berhemek xweser biafirîne û awira xwe nîşan bide; divê ew serî li hemû zanayiyên ku bi mijara wî re têkildar in bide û bi vî awayî, dîtina xwe pêşkêş bike. Dubarekirina hindek zanayiyan jî, ti kesî nake fîlozof.*

***12- Zanayiya felsefî, bi pirsên xwe gerdûnî ye:*** *Zanayiya felsefî bi pirsên xwe yên ku li benda bersivdanê ne re, dibe zanayiyek gerdûnî. Her fîlozofek li gor awira xwe pirsekî peyda kiriye û li bersiva wê pirsê*

*geriyaye. Helbet, bersiv jî girîng in. Lê pirsên fîlozofan, ji dema xwe derbas bûne û bûne weke pirsên ji bo hemû dewr û dewranan. Mesela di felsefeya* ***Kantî*** *de, pirsa <zêhna mirovî, gelo dikare bi çi bizanibe?> giirîng e û mirov dikare bibêje ku girîngiya vê pirsê, hê jî berdewam e.*

Îdeolojî jî, dazanînên siyasî û civakî ne, ku di mijarên siyasî, felsefî, hiqûqî, zanistî, olî û ehlaqî de xwediyê yekîtiyekê ne û tevgerên hiqûmet, partiyên siyasî û çînên civakî, berhêlî dikin. Ango kes, kom, komik, hiqûmet, endamên partiyên siyasî, karkir, bazirgan û hwd. di bin bandûra îdeolojiyan de dimînin. Heke meriv çend mînakan bide, meriv dikare behsa îdeolojiya marksîst, îdeolojiya îslamî yan jî îdeolojiya kapîtalîst yan jî sosyalîst bike.

Herçuqasî îdeolojî jî ramanên bi rê û pêk bin jî, ew jî mîna ramanên naguhêr têne pejirandin. Mesela îdeolojiya Marksîst, li gor wesfên hilberandinê, civakan disenifîne û wuha diparêze ku rewşa civakan ya siberojê jî dikare were zanîn. Lêbelê, em baş dizanin ku îdeolojî ne zanistek e û ne pêkan e ku em bikaribin bi kirû û bûyerên siborojê, ji a niha ve bizanibin. Çimku gelek faktorên ku rê li ber evrîma civakî û xwezayî digrin hene û bi tu hawî, meriv nikare bi wan guhêrbaran *(değişken, fakor)* bizanibe. Lewma jî, angaşta wan çi dibe bila be, di rewşa ramanên utopîk û hişkebawer de dimînin û nikarin hemû pirsên me bibersivînin.

Li gor bîr û baweriya min rahişmendiya herî mirovî, felsefe bi xwe ye. Felsefe, tu carî ya ***<herî baş>*** destnîşan nake, lê rêya lêgerîna vê yekê dide pêşiya mirovan. Yanî meriv bi aqilê xwe li ya ***<baş>*** digerin û di dema lêgerînê de jî, xwe naspêrin tu pîroziyan.
Lêbelê ol û îdeolojî, bi demê re dibin *(vediguherine)* ramanên qalibgirtî û lêpêwîstker. Lewma jî, raman û angaştên ku didin pêşiya mirovan jî, pirî caran wekî ramanên dogmatîk têne dîtin û di dawiyê de jî, zererê didine mirovan. Çimku ne ol û ne jî îdeolojî, wekî ramanan namînin û di civakan de vediguherine sepandinên

berbiçav û lêpêwîstker. Guman têde nîne ku ev yek jî, rê li ber afirandêriya mirovî, digre û ta radeyekê heta dibe asteng jî.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
23.09.2015

**Jêderên giştî**

**1-** http://www.felsefevan.org/raman-pirozi-u-ol-3.html
**2-** Destpêka Felsefeyê. Ali Gurdilî. Weşanên Soran. 2015
**3-** Di Sed Pirsan de Felsefe. Ali Gurdilî. Xebateke Çapnebûyî.
**4-** Antolojiya Feylesofan. Ali Gurdilî. Weşanên Soran. 2015
**5-** www.felsefevan.org

'Bi tenê heyîn, ji bo xwe heyîneke bivênevê ye. Çimkî, di navbera heyîn û tuneyiyê de, bi awayekî din çênabe. Yek ji wan, bi yekê din re nayê wesfandin. Heyînatî, qet nabe tuneyî. Ev tişt bêderfet û der aqil e. Weke vê yekê tiştê ku tune nin jî, nabin heyîn. Tişteke bivênevê jî, bi awayekî taybetî ne pêkan e. Lewra heke wiha be, wê demê dê hebûna xwe jî ji heyînekê cuda werbigire, dê li derveyê wî winda bibe û dê heyîna wî, bi tinebûnê were wesfandin. Belam, ev tişt jî ne pêkan e. Bi tenê heyîn heye û ev yek, bivênevê ye ku hemû tiştên din jê hene.
Ev heyîn jî, Xwedê ye. Di hemû heyînan de yên ku xwiya dike Xwedê ye û yên disalixîne jî ew e. Ji Xwedê pêve Xwedê tune û di gerdûnê de, ji bilî Xwedê, ti tişt tune.'
**(Şêx Bedredîn| 1358-1417)**

**<u>Însan Heyîneke Felsefîk e</u>**
**<u>Ferhat Dayan</u>**

Ez însan im û pêdiviya min bi avê heye, bi xwarinê heye û bi xewê heye, lê felsefe ji van pêdiviyan wêdetir û zêdetir e. Taybetmendiya berbiçav ya însên; fikirîn e. Malzaroka felsefeyê mejî ye, felsefe di vê malzarokê de digihêjê û ji fikirînê diwelide.

Ji loma felsefe ji pêdiviyê bêtir perçeyek jî însên e, însan bi xwe ye bi gotineke din; însan heyîneyeke felsefîk e. Îja heke em dê qala pêdiviyekê bikin divê em felsefeyê jî wek organên (çav, guh, dest) din yên mirovî bigirine dest. Ji bo em xwe û cîhanê bibinîn pêdiviya me bi çav heye.

Ji bo em xwe û cîhanê bibihîzin pêdiviya me bi guh heye û ji bo em ji xwe û ji cîhanê fêm bikin pêdiviya me bi mejî-fikirîn-pirskirin yanî bi felsefeyê heye û heke em ji xwe û ji cîhana xwe tiştekî fêmnekin, em çiqasî lê binerin jî, bibihîzin jî, dest bidên jî em ti zewq û tehmê jê nastînin ji loma felsefe bo însanî amûrek jêneger e.

**Ferhat Dayan**
15.02.2016

## Dibistana Stoa / Stoaparêzî
## (Felsefeya Sereke ya Împaratoriya Romayê)

*Mirin û bela, ji ber ku li derveyê îradeya me ne, em nikarin wan kontrol bikin û têne serê hemû mirovan, lewma jî divê em bi giramî pêşwaziyê li wan bikin.*

Damezranerê vê dibistanê Zenonê Qibrîsî *(B.Z.334-263)* ye. **(1)** Felsefeya Stoaparêz wekî tevgereke felsefî bi hizr û ramanên xwe, bi qasî 500-600 salan berdewam kiriye. Di vê dewrê de felsefeya rojavayê ligel felsefeya stoaparêz, ji rewşa felsefeya yewnanî xwe xilas kiriye û bûye felsefeyeke navneteweyî. Bêguman ev geşedan, rasterast encameke seferên Skenderê Duloquç bû û bi saya seferên wî, çanda yewnanî li temamiya cîhanê belav bûye: Stoaparêzên ewil axlebî xelkê sûrî bûne, yên ku piştre hatine jî bi pirranî romayî bûne. Tê dîtin ku ji pileyên civakî yên pirtexlîd, gelek kes beşdarê vê ekolê bûne û heta yek ji wan kole *(Epiktetos)* û yekî din jî Împaratorê Romayê *(Marcus Aurelius)* bû. Wer xwiya ye ku Stoaparêzî ji imparatoran re gelek balkêş xwiya kiriye. Li gor pisporekî felsefeyê, hema hema hemû împarator û kralan, bi awayekî eşkere gotine ku ‘em stoaparêz’ in.

Min li jor jî destnîşan kir ku damezranerê vê felsefeyê Zenonê Qibrîsî ye û bi navê Zenonê Eleayî jî feylesofek î din jî heye. Di felsefeya Stoayê de ramana bingehîn, raseriya aqil e û wiha bawer dikin ku tu tişt weke aqil, ne hêzdar e. Bêguman heke em hinekê vê prensîpa wan ya sereke şirove bikin, em ê bêtir têbigihêjine felsefeya wan û hinek encaman bi dest bixin:

**1-** Hemû rasteqiniya ku aqil dide û a ku heye, ev cîhan e. Ango, cîhana xwezayî ye. Li ‘jor’tir jî, tiştek tune û xweza jî, bi prensîpên aqlî tê birêvebirin. Em jî, perçeyekê xwezayê ne. Ji gotina peyva ‘Xwedê’ mebest rihê aqlî ye, ku me û hemû xwezayê dadigire. Heke em bikaribin têbigihêjine vê yekê, wê demê em ê bizanibin ku Xwedê ji dinyayê ne cihê ye û ne li derveyê dinyayê ye; li vê

dinyayê ye û di her tiştî de ye û xwe berdeya dilê her tiştî. Lewre, ew aqlê dinyayê ye.
Dema ku em xwe bi xwezayê re bikin yek û dema ku bimrin, ji ber ku war û qadeka ku ji xwezayê bilintir e tune, ne pêkan e em bikaribin herin 'warekî' din jî. Em bi helandin û ji hev ketinê jî, carekê din vedigerin xwezayê. Di vê xalê de meriv dikare bibêje ku Stoparêzî herî zêde, bi vê ramana xwe navdar bûye û hatine nasîn. Bêguman, bandûra vê etîkê jî gelek zêde hatiye dîtin. Xweza ji aliyê prensîpên aqlî ve tê birêvebirin, her tişt wekî xwe ye û sebebê vê yekê jî heye. Em nikarin wê biguherinin yan daxwaza guherandina wê bikin. Ji ber vê yekê jî divê em qebûl bikin ku mirin heye û rastiya mirinê jî, biperijînin. Heke hestên me mirinê qebûl nekin, ew xelet in.

Di vê xalê de divê were gotin ku Stoaparêzan gotine ku hestên me, darazên *(hukm)* me ne û girêdayî, têgihiştinê ne. Yanî gotine ew çewt yan rast bin jî, ew cureyên 'zanîniyê, zanayiyê' ne. Mesela çikûsî *(xesîsî, çavbirçîtî)* xwe dispêre ramana 'pere ji her tiştî qîmettir e û ji bo qezenca pereyan, çi lazim be divê meriv bike' û darazeke *(qeneet)* çewt e. Heke em hemû hestên xwe li bêjinga *(moxil, serad)* aqil bidin, wê demê hestên me berê xwe bidin darazên rast û dê wan bibêjin, wê demê jî em ê bikaribin tiştan bi reseniya wan *(ew çawa bin wisa)* bibînin û ligel wan bin û bi wan re bibin yek.

*'Her aligirê stoa, stoaparêz e.*
*Lêbelê, di filehtiyê de fileh li kû ye?'*
***(Ralph Waldo Emerson)***

Mirovên ku baweriya xwe bi felsefeya Stoayê anîne, ligel aliyên erênî aliyên neyînî yên jiyanê jî herdem pejirandine û xwe jê nedane paş. Lêbelê dibe ku wan jî gelek êş azarê dîtibin û ji bo demên wiha jî, bawer kirine ku meriv xwe bikûje baştir e. Wate, baweriya xwe bi xwekûştinê jî anîne, asayî dîtine û pirraniya wan

jî, xwe kûştine. Hema hema pirraniya feylesofên sereke yên stoaparêz, xwe kûştine.

Gelek ramanên hêja û girîng yên stoaparêzan ku hemû jî bi latînî ne, di metnên stoaparêzên ji nifşa duyem de hatine dîtin. Di nav wan feylesofan de Seneca *(B.Z.2-P.Z.65)* **(2)** û Marcus Aurelius *(M.S.121-180)* **(3)** feylesofên herî naskirî ne. Lewma jî, lêkolînerên ku dixwazin dibistana stoayê binasin, divê ew berê xwe bidin metnên wan. Derheqê etîka stoa de jî meriv dikare bibêje ku etîka wan, ji layê kesên biyanî ve jî gelek hatiye ecibandin. Helbet, sepandina vê etîkê wisa ne hêsan e ku herkes bikaribe jiyana xwe li gor vê etîkê bijî. Di vê xalê de divê were gotin ku bandûra etîka stoa ya ku di dewra Seneca, Epiktetos û Marcus Aureliusî de hatiye nivîsandin, bandûreke pirr mezin li etîka filehtiyê kiriye. Îro jî dema ku behsa 'stoa' û 'stoaparêzî'yê dibe, dilxweşî û şanaziyek tê hîskirin, çimku stoparêziyê li hemberî êş û tengasiyên jiyanê îmajeke baş ya 'bêhfirehî, sebir û tehemulê' afirandiye. Stoaparêzî, bêguman ne tenê felsefeyeke ehlaqê bû, meriv dikare bibêje ku di mijarên mantiq û zanînînasiyê *(felsefeya zaniniyê)* de jî, xebatên baş kirine. Di rastiya xwe de tiştên ku wan fêrî mirovan kiriye, têgihiştineke tevahî ya jiyanê ye.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
**06.04.2016**

***Jêrnivîs***

***1-*** *Zenonê Qibrîsî (B.Z. 334-263) damezranerê dibistana (xwendegeh, ekol) stoaparêziyê (ing: stoicism, fr: stoicisme, tr: stoacılık) ye. Zenonê Qibrîsî di berhema xwe ya bi navê 'Dewletê' de, raseriya hiqûqê û gerdûnitiya saziyên siyasî parastiye. Ji bilî çend jêgirtinên bela wela, ew berhem mixabin heta roja me nemaye. Li gor bîr û baweriya Zenon, ehlaq xwe dispêre çar hêmanan, ku ew jî:*

***1-*** *Hilbijartina rast*

***2-*** *Tehemûlkirina bisebr*

***3-*** *Tevgerîna bi pîvan*

***4-*** *Parvekirina bi edalet in.*

*Xwendegeha Stoayê, bi qasî 500-600 salan berdewam kiriye. Xwendegeh wekî ya kevin, navîn û dawî, hatiye dabeşkirin. Lê meriv dikare ramanên hevpar yên wan xwendegahan wiha rêz bike: Stoparêzan, bersiva pirsa 'Ya ku bi rastî jî heye, çi ye gelo?' wiha bersivandine: 'Ev şexs in, wesfên van şexsa ne.' Hemû şexs wekî vezelana di yek 'bêhneka germ' de hatine dîtin. Şexs, axlebî wekhev in. Ev wekhevî jî, 'sempatiya tevahî' pêk tîne. Wateyeka din ya 'Sempatiya Tevahî' jî, vekeheviya şexsa ye. Ferqa di navbera şexsan de, ferqa dereceyekî ya di 'bêhna/nefesa germ de' ye. Valahî tune, nexwe atom jî tune nin. Dem, war, atom, hereket, cins û çeşn, bi awayekî nesnel tune nin. Bi tenê, di ziman de hene. (Lekton) Mesela ava golekî, bi rastî jî heye. Lê hereketa di golê de, ku xwedegiravî heye, bi tenê di zimên de heye. Valahî jî, di gotinê de heye. Nexwe, atom jî tune nin. Heke wiha be, epîkurparêzan jî çewt fam kirine. Çimku, şexs, ne lodeka atoma ne. Vezelîna herî bilind, nefesa germ e, Xwedê ye. Ji vê yekê re jî, gotine <logos>. Li gorî stoaparêzên diyalektîk; rih ji zayîna xwe ve, wekî kaxezeke spî ye. Zanayiya resen jî, piştî derbasbûna rih ya ji pêhêsiya kiryarî (fiêlî) ber bi tesewuran û ji tesewuran derbasbûna pêşniyaran tê bidestxistin. Zanayiya resenî, ew zanayî ye ku mirovî qane dike. Li gor baweriya stoaparêzan, erka mamoste (dersdaran) ew e ku qeneeteka misoger bidine şagirdên xwe, neku wan îsbat bikin. Armanca etîkê sikûneta rih e, gihêjtina serbestiya hindûrîn e û ne hewce ye ku meriv, bi nirxên sosyal re mijûl bibe. Lêbelê jiber ku mirov di civakekê de dijîn, divê ew wezîfeyên xwe jî bi cih bînin. Mirovên zana ji ber ku xwediyê 'rihê gerdûnî-nefesa germ' in, ew ne hewcedarê ti kesî ne û ji guherînên sosyal jî ketumet nabin. Jiber ku 'logos-rihê gerdûnê-sempatiya tevahî' li cem hemû mirovan heye, hemû mirov xwediyê mafên wekhev in û edaleta tekane ya rasteqîn jî, 'dewleta dinyayê' ye.*

*Taybetmendiyên vê xwendegehê:*

***1-*** *Felsefeya herî girîng, ya dewra hellenîstîk e.*

***2-*** *Mîna epukurparêziyê, ew jî felsefeyeka ehlaqê ye.*

***3-*** *Di perwerdehiyê de, di dewsa <îsbatê> de, rêbaza <qaneyê> bikar anîne.*

***4-*** *Avakarê xwendegehê, Zenonê Qibrîsî ye.*

***5-*** *Ramana wan ya bingehîn, serbestiya hindûrîn ya mirova ye.*
***6-*** *Jiyanek a ku amizgerê xwezayê ye pejirandine.*
***7-*** *Serweriya aqil parastine.*
***8-*** *Mengîweriya hemwetîtiya dinyayê, parastine û vê yekê, ji xwe re kirine armanc. Jiber ku Zenonî dersên xwe li galeriya (pêşangeha) bi navê Stoayê daye, ev nav ango Stoaparêzî li wan hatiye danîn.*
***2- Seneca (B.Z.2-P.Z.65):*** *Feylesof û siyasetvan.Yek ji wan stoparêzên dawî ye û mamostetiya Neron kiriye. Demekê (P.Z.54-62) di rêveberiya Împaratoriya Romayê de jî, wezîfedariyê kiriye.*
***3- Marcus Aurelius (M.S.121-180):*** *Împaratorê Romayê, di navbera salên P.Z.161-180an de li ser text maye û di dewra wî de Împaratoriya Romayê, di dewra xwe herî baş de bûye. Aligirê felsefeya stoparêz û împaratorek î serkeftî bû.*

***Jêderên Giştî***


***1-*** *www.felsefevan.org*
***2-*** *Dîroka Felsefeya Serdema Pêşîn. Ahmet Arslan. Weş. Z. Bilgî*
***3-*** *Destpêka Felsefeyê. Ali İhsan Candoğan. Weş. Dem*
***4-*** *Dîroka Felsefeyê. Nils Gilje, G. Skirbekk. Weş. Kesît. Sala 2011.*
***5-*** *Kurteçîroka Felsefeya Rojavayê. Prof. Bryan Magee*
***6-*** *Dîroka Felsefeyê. Prof. Macit Gokberk. Weş. Pirt. Remzi. 1985.*
***7-*** *Ferhenga Felsefeyê. Ali Gurdilî.*
***8-*** *Destpêka Felsefeyê. Weşanên Soran. 2015. Almanya.*

**Chima Pêdiviya Kurdan Jî Bi Felsefeyê Heye?**
**Shahînê Bekirê Soreklî**

Di nav Kurdan de gellek mijar û pirs hene ku pêdiviya wan bi bersîvên nû û durist heye. Felsefe merbendan dide shkandin û deriyên mezin ji hishan re vedike da ku bêyî tirs li bersîvan bigerin. Felsefe xwe bi kûraniya hebûnê û jiyana me ve peywendîgir dike û dihêle em toreyên civakî û ramanên bi rêyên din xwe di nav hishên me de bi cîh kirinî bidin aliyekî û xwe têxînin nav pêlên li dû bizavên xwegîhandina rastiya ji merbendan azad.

Kurd jî beshekî ji cîhana xwe ne, lê di heman demê de beshekî ji cîhana mezin ya mirovan in. Felsefe dikare zimanê wan pêsh ve bixe, tabûyên *(mijarên qedexe)* ji pash perdeyan hatinî veshartin derxe ser sehneyê, azadiya ramanê û ragîhandinê berfirehtir bike, li dermanê ji bo chareserkirina nexweshiyên hishmendî û civatî bigere û chanda kurdî rengîntir bike.

Felsefe dikare kesên meraqdar û wêrek bi firran xîne û sûda firrîna wan bigihîne civatê.

**Shahînê Bekirê Soreklî**
28.02.2016

## DIBISTANA EPÎKUROSPARÊZ / EPÎKUROSPARÊZÎ

**(Dibistana humanîstên yekemîn ku xwediyê ramanên zanistî û serbest bûn)**

*Felsefeya Epîkuros felsefeyeke materyalîst e, daye du kêf û xweşiyê û ne felsefeyeke dînî (olî) ye.*

Di nav felsefeyên Serdema Helenîstîk de, girîngî û bandûra du ferasetên felsefî gelek mezin e, ku ew jî epîkurosparêzî û stoaparêzî ne. Epîkurosparêzî ew felsefe ye ku bi pirranî ji aliyê Epikuros **(1)** *(B.Z.341-270)* ve hatiye afirandin. Armanca Epikurosî ya sereke ew bû ku dixwest mirovan ji tirsa jiyîn û mirinê rizgar bike. Felsefeya Epikurosî di serdemekê ku pirraniya mirovan ne xwediyê jiyaneke ewledar bûn de, mirovan fêrî giringiya jiyana takekesî *(şexsî)* kiriye û ji mirovan re wiha hatiye gotin ku divê ew di jiyana xwe ya şexsî de li bextewariyê bigerin. Bêguman ev destûr nedişibiya wan ramanên ku nav û navdarî, heta yên ku şeref û şanaziyê pêşniyarê xelkê dikirin, wate ramaneke nû û cihêreng bû. Lewre felsefeya Epikurosî dixwaze ku hemû hêlên hebûnatiyê hembez bike.

'*Mirin, ji bo me ne tu tişt e.*'

***(EPIKUROS)***

Epikuros beriya her tiştî, teoriya Demokrîtos ya atoman qebûl kiriye û wiha bawerî pêaniye ku hemû tiştên ku di gerdûna madî de hene, ji atom û valahiyê pêk hatine. Ne pêkan e ku atom ji tunehiyê pêkhatibin û winda bibin. Lewre jî, xira nabin û bengî ne. Lêbelê meriv nikare pêşbiniya livdariya wan bike û lewre jî, pêkanînên wan jî ne mayende ne. Ji ber vê yekê jî hemû nesneyên fizikî ku di navbera valahiya atoman de cih digrin, imirkurt in, yanî mueqet in. Çîroka nesneyan, rasthatin û hevrebûna atoman û di dawiyê de jî, belavbûna wan e. Hemû guherîna li gerdûnê, bi vî hawî pêk tê û em bi xwe ew nesne ne ku bi vî hawî têne meydanê. Bi hejmareke pirr zêde atomên bêhempa têne cem hev û laş û aqilê mirovî pêk tînin, ku herî dawî dê ji bêgaviyê jî belav bibin. Belam divê meriv ji belavbûnê netirse, çimku heta ku em bijîn, ji bo me

mirin tune û dema ku mirin jî tê, ji xwe em tune nin. Ew bûyerên tirsdar û hêwilnak ku hinek dîn (ol) dibêjin piştî mirinê têne serê mirovan, di dema saxitiyê de ne hatine serê tu mirovekê. Epikuros dibêje ku 'mirin ji bo me ne tu tişt e û kesê ku têgihiştiye vê heqîqetê, xwe ji tirsa mirinê rizgar kiriye.'

Di meseleya hebûn yan jî tunebûna Xwedayan de jî, Epikurosî dibêje ew ji me pirr dûr in û zêde jî naxwazin têkilî jiyana mirovî bibin. Bi vî hawî jî, wan ji çerçoveya feraseta xwe dûr dike. Dîsa gotiye ku 'Xweda, têkilî kar û barên mirovan nabin, lewma jî divê em ji wan netirsin, tiştekî nexwazin û hêvî nekin.'

Di vê xalê de, meriv dikare bibêje ku Epikuros çawa ku ew tunebin li wan mêze kiriye. Madem ku tunebûn çarenûsa me ya bêgav e, wê demê divê em jiyana xwe têr û tije bijîn û daxwazên xwe bi cih bînin. Ev yek jî, bi jiyana kamûyê, bi jiyana gelemperî nabe û lewma jî, divê meriv berê xwe bide komên taybet yên ku bi raman û kirinên xwe, nêzîkî meriv in. Bi vê yekê divê em ji bo tenduristiya bedena xwe jî, heta ji destê me bê, divê em xweş û geş bijîn û li pey xweşiyê herin. Epikurosparêzan bi vê armancê hinek kom û komikan ava kirine û ev kom û komik, ji jin û kolêyan re jî vekirî bûne. Yanî beşdarbûna van koman, ji hemû mirovan re serbest bûye û ji ber vê yekê jî, gelek kesan kerba xwe ji wan anîne û dijminatiya wan kirine. **(2)**

Lewre jî dema ku filehtî derketiye holê, epikurosparêz ji aliyê oldarên fileh ve hatiye lanetkirin, lewre bêmirinî û hebûna Xwedayekî dilsoz î xwedîrehm, red dikirin û bala mirovan didane ser nîmetên dinyewî. **(3)** Bêguman îro dema ku behsa epikurosparêziyê dibe, di cih de humanistiya zanistî û azad ya sedsala 20an tê bîra me. Çimku epikurosparêzî raveya yekemîn ya wê ramana humanîst e, ku di dema me ya îro de bi pirranî tê pejirandin. E vê felsefeyê B.Z. di sedsala 1ê de, di helbesteke (De Rerum Natura, Li Ser Xwezayê) gelek dirêj ya Lucretiusî (B.Z.95-52) de, xwe gihandiye rewşa xwe ya herî rewnaq û naskirî. Bi nivîsandina vê helbestê armanca wî ew bû ku epikurosparêziyê derbasî çanda romayî bike û bide naskirin. Ev helbest, bi latînî

hatiye nivîsandin û yek ji wan şaheserên edebiyatê ye. Tê dîtin ku feylesofê helbestvan, baweriya xwe bi felsefeyê tîne û wiha bawer dike ku dê bi saya felsefeyê ji waswas û dînitiya xwe xilas bibe, lewre carinan dîn jî bûye. Mixabin di dawiyê de jî, xwe kûştiye. Feraseta epikurosparêziyê bi sedê salan mîna xwe maye û bo demên dahatûyê jî, bêyî ku biguhere hatiye weguhastin. Sebebê vê yekê ê sereke ew e ku pirraniya vê ferasetê, ji aliyê yek feylesofekî *(Epikuros)* ve hatiye nivîsandin. Di Serdema Navîn de jî, epikurosparêzî bi dijminatiya Hz. Îsa hatiye sûcdarkirin û piştre jî, hatiye jibîrkirin. Lêbelê di sedsala 16 û 17an de, ji nû ve hatiye venasîn û di destpêka zanistiya nûjen û tevgera mirovheziyê *(humanîzm)* de, xwediyê bandûreke mezin e.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
03.04.2016

**1-** *Di sedsala 18an de David Hume wiha gotiye: Bersivên pirsên Epikuros (B.Z.341-270), hêjî nehatine dayîn. Xwedê dixwaze ku rê li ber xirabiyan bigre û ji bo vê yekê ma hêza wî tune? Heke wiha be û neke, ew di eczê de ye. Na, hêza wî heye û naxwaze, wê demê jî nêtxirab e. Heke hem dixwaze ku rê li ber xirabiyan bigre û xwediyê wê hêzê be, nexwe çavkaniya xirabiyan çi ye û ji kû tên? Pirsên bi vî rengî, ji aliyê Voltaire jî hatine kirin. Belkî jî hêjî bersivên pirsên Epikuros nehatibin dayîn yan jî dîtin?*

**2-** *Bakkayî (bi yewnanî: Βάκχαι, Bakchai) yan jî Dionysos, Xwedayê xwezayê ku xwediyê hêza afirandina wecdê (rewşa ku beden xwe ji rasteqiniya dinyewî rizgar dike û dikeve reşa jixweçûyin û coşiyê) ye û bi 'orgy' ê re pêwendîdar e. Epikurosparêz bi 'orgydariyê' (têkiliya zayendî ya komî ku ji 2 mirovan zêdetir kes başdar dibin) hatibin sûcdarkirin jî, tu carî tiştekî wiha qebûl nekirine.*

**3-** *Memento Mori: Ev peyv, di wateya 'sembola mirinê' de ye û wekî pirraniya ferasetan, feraseta epikurosparêz jî vê sembolê mîna sembola mirinê bikar anîye. Bi vê yekê xwestine ku vê peyamê bidin xelkê: 'heta hûn sax bin, li gor dilê xwe bi keyf û xweşî bijîn.'*

**Jêderên Giştî**

**1-** www.felsefevan.org
2- Dîroka Felsefeya Serdema Pêşîn. Ahmet Arslan. Weş. Z. Bilgî
**3-** Destpêka Felsefeyê. Ali İhsan Candoğan. Weş. Dem
**4-** Dîroka Felsefeyê. Nils Gilje, G. Skirbekk. Weş. Kesît. Sala 2011.
**5-** Kurteçîroka Felsefeya Rojavayê. Prof. Bryan Magee
**6-** Dîroka Felsefeyê. Prof. Macit Gokberk. Weş. Pirt. Remzi. 1985.
**7-** http://www.anlamak.com/varligin-yapisi-de-rerum-natura-lucretius-carus.html

‘Em ketine nav diranên çerxa zayîna bêdawî û mirinê. Jiyana me ya rasteqîn li stêrka ye. Lê me, xwe bi erdê ve girêdaye. Encax bi destşûştinê, bi pakbûnê û bi jiyaneke çîlekêş, em dikarin xwe rizgar bikin û bi vê çerxê, bi coşî xwe bigihînin xwedê.’

**(Orpheus)**

## Felsefe, Vajbawerî û Dilwasiyê Tazî Dike

**Nûrhat Heftaro**

Dema ku mirov di nava rûpelên çanda mirovahiyê de lêkolîn bike, wê bibîne ku mirov ji bo watedayîna jiyana xwe gavên mezin yên ramandinê avêtine. Ji vedîtina agir û bikaranîna amûran hêdî mejî ketiye dewra ramandinê. Ji bo vê yekê divê em hêz û karîna mirov baş têbigihîjin. Li rex vê rastiyê divê tu caran ji xweza û gerdûnê neyê birandin. Ji lewre ravekirin û naskirina mekanîzmeya mejiyê mirov, wê ji bo mijarê bi kêr bê. A rast mirov hevkombûna hemû zekayên gerdûnê ye. Ji kûarkeke tarûmar bigire, heya Makro Kozmosê jiyan xwedî hişmendî ye.

Jixwe ezmûna du kunan a quantumê vê rastiyê diçespîne. Elektrona ku xwedî pakêtên taybet yên enerjiyê *(şiyanê)* ne, dîsa jî li gor rehenda *(dimension)* xwe, xwedî çalakiyeke jiyanê ya pir xurt e. Ev mejiyê hanê di gewda mirov de digihîje lûtkeyê. Hêdî mirov van pisportiyan berhev dike û di kesayeta wî/ê de teqîneke ramanî -ya ku dê piştre bandoreke mezin li gerdûnê bike- çêdibe.

Heta mirov dikare ji vê pêngava dîrokî re bibêje dema bi wate ya kaosê. Weke tê zanîn ti nirx, ango heyber û heyîn ji ber xwe çênebûye. Di berdewamiya pêvejoyê de bi afirîneriya xwezayî pêşketin çêbûne. Zihnê mirov, hizir û ramana wî di encama hilberîna civakî de hatiye parzinandin. Her berhem di encamekê de hatiye afirandin. Bi van çend gotinan em dikarin bibêjin mirovahiyê dest bi rêwîtiya xwe ya têgihîştin û serwextbûnê kir.

Ji pirsa ku dibêje ez kî me? Û çima ez hatime? Û ev çi ne? Hêdî zengila vî şerî lêdide. Lewma mirov dikare bibêje fikirandin erkekî xwezayî ya civaka mirov e, kengî em li wateya jiyan û gerdûnê geriyan, fikirandin bû mala mirov. Jixwe ramandin hêzekî metafizîk e, ango çalakiyeke derûnî ye. Wexta ku mirov bi rûdanekê difikire, her tim lêvegerandin, qulibandin, encam jê derxistin û hevrûkirinê, bi kar tîne. Ev rêbaz te digihîne encameke ango awêneyeke jiyanê yê ku pêdivî û pêwîstiyên te yên jiyanê pêk tîne ye. Ji ber ku êdî doz û arîşeyên civakî gihandin lûtkeyê, hewce bi rêbazeke ramanî hebû. Li vê derê felsefe destpêkirina

xwe radigihîne. Hem ji aliyê diyardeyên ku pê tên hîskirin, û hem jî mijarên ku hêza pêhesandinê derbas dike û dikeve rewşa metafizîkê, felsefe bersivê dide. Ji ber vê mirov dikare bibêje di lêgerîn û têgihîştina kûrahiya jiyanê de rista felsefeyê bêlî ye. Dema ku mirov hewl dide li hebûna xwe ya dem-cih serwext bibe, dest bi çalakiya fikirandin û lêpirsînê dike. Her bi xwe û derdora xwe difikire, ew qasî jî hêza famkirin û peresînê jî pêşdikeve. Bi gotineke din têkiliyên civakî-zihnî sedema peresîn û pêşketina mejî ye.

Bi gotineke din felsefe heqîqet bi xwe ye. Di tevahî serdemên civakî de felsefe bi rengên cuda û têvel derketiye pêş, eger em dibêjin felsefe û heqîqet du hemwate ne; wê çaxê kengî kozmosê xwe di mirov de têgihîşt û xwe nas kir, felsefeyê dest bi rêwîtiya xwe kir. Êdî şanoya jiyanê li ser dike rastiyê di bin sernavê FELSEFE û rahêneriya MIROV de dest pê dike. Felsefe tu desthiltdarî, kirêtî û bêmafiyê napejirîne, bi qasî felsefe pêş dikeve û xwe di rehên mejî de dipeytîne ew qasî azadî jî dibe rasteqîn û heqîqeta teqez!

Tê hizirîn ku li hember felsefeyê şaristaniya navendî hewldanên qirkirin û tunekirinê pêk anîne. Gîordano Brûno, Hallacî Mansûr, Galîleo Galîleî û bi hezaran evîndar û nûnerên heqîqetê *(felsefeyê)* bi destê van fêlbaz û nûkerên hemcinsê xwe, hatine kuştin lê ew her dem di me de zindî ne. Di serdema modernîteya kapîtalîst de Stephen Hawking mirina felsefeyê radigihîne! Bêyî ku bizanibe rê li ber krîz û aloziyên civakê yên pir mezin vedike.

Eger îro li rojhilata navîn û li tevahî dunyayê alozî, kuştin û mirin hebe, sebeb jiyana bêfelsefe ye.. Ji ber di wê kêliya kambax de mirov bê heqîqet dimîne! Êdî xweda çep û rast lêdixe. Di vê sedsalê de herî zêde pêdiviya me bi felsefeyê heye! Eger mirov dixwazin ji van aloziya derkevin divê ji nû ve li felsefeyê bigerin ji

ber felsefe winda nebûye lê lawaz bûye. Heta mirov dikare li ser pêdiviya me bi felsefeyê hinek xalan jî diyar bike;

***1-*** *Ji ber mirov berhema dawî ya gerdûnê ye ango yê li derveyî xwe serwext dibe mirov e, ji lew re divê hêza exlaqî û manedenê (felsefe) li ba mirov li pêş be da ku mirov mirovbûna xwe winda neke.*

***2-*** *Bêtar û krîzên civakî encax bi felsefeyê bên çareserkirin.*

***3-*** *Felsefe, vajbawerî û dilwasiyê (ewhaman) tazî dike û li hember wan pirs û gumanê pêşdixe. Netenê xurafeyan belam li hember zanistê jî pirsyaran dike, û zanistê ji tiralî û dogmabûna ramanî felat dike.*

***4-*** *Zanist xwedî armancên taybet yên xwe ne. Lêbelê divê neyê jibîrkirin ku ev zanist berhemên civakê ne. Belam gengaz e ku armancên van zanistan û ya civakê li hev nekin. Ji ber vê yekê erka felsefeyê ya bingehîn ew e, armanca van zanistan bike armanceke civakî. Da ku ev zanist li ser civakê nebin bela!! û mînaka; hîroşîma jî berbiçav e!? Divê felsefe li vê derê şoreşeke exlaqî pêk bîne û zanist têxe xizmet civakê.*

***5-*** *Civaka bê felsefe civakê herî zêde bê parastin hatiye hiştin. Helbet çarenûsa civakeke wisa jî belavbûn û tunebûn e.*

***6-*** *Hêza ku mejiyê civakî palvedanî pêşketinê dike dîsa felsefe bi xwe ye.*

**Nûrhat Heftaro**
25.02.2016

## SEPTÎSÎZM
## (DI DÎROKA FELSEFEYÊ DE DIBISTANA GUMANBER)

Di dîroka felsefeyê de nêrîna felsefî ya septîsîzmê *(gumanberî),* xwediyê ciyekî girîng e, lewre di seranserê dîroka felsefeyê de nêrîn û ramanên qalibgirtî hilweşandiye û wiha kiriye ku di felsefe, zanist û di nêrîna dînî de, gelek feraset werin guherîn. Heke pêwîst be, meriv dikare vê ferasetê wekî dijberê feraseta dogmatîzmê jî binavîne. Pêşengê herî sereke ê ekola gumanberiyê Pyrrhon û Tîmon in û bi xwedîlêderketina Karneadesî **(1)** jî berdewam kiriye. Septîsîzm, ew felsefe ye ku ji gumana xwe ji gumanê *(şikê)* dike û wiha diparêze ku zanayiya *(zanînî, bilgi)* rast tune. Dîsa li gor vê felsefeyê, meriv nikare bi cewhera *(hilika)* nesneyan bizanibe û ya ku dikare were zanîn jî, xwiyakirina wan ya ji derve ye. Ji ber vê yekê jî, derheqê tu tiştî de em nikarin xwe bigihînin qeneet yan jî biryarekî.

Dîsa li gor baweriya septîkan, meriv nikare baweriya xwe bi zanayiyên ku ji sehek û aqil tên bîne, çimku tu delîlên rastiya wan zanayiyan tune. Herweha tiştên ku em wan rast dipejirînin jî, ew ne rast in; lêbelê dişibine rastiyan. Lewma jî, em nikarin derheqê tu tiştî de biryareke teqez bidin û xwe bigihînin darazekî. Çimku li hemberî her darazaka me, delîlekî wê darazê ya nakok/dijber ji heye û dibe ku ew delîl di heman hêzê de be. Ji ber vê yekê jî di lîteratura felsefeyê de, di dewsa gotina ‘ev wiha ye.’ de, divê gotina ‘dibe ku wiha be.’ were bikaranîn. Li gor bîr û baweriya feylesofên gumanber, divê meriv ji gumana xwe jî gumanê bike û gumana xwe jî, qebûl neke. Ev ramana ku baweriya xwe bi zanayiya rast nayne, piştre bûye sebebê feraseta nihîlîzmê *(hîçperestî)*.

Di felsefeya yewnan de, peyva ‘Septîk’ xwediyê wateyeke kevneşopî ye û gellek kevîn e. Lewre Ksenophanes gotibû ku îmkana me heye em herdem xwe bigîhînin zanayiyên zêdetir,

lebelê em ê tu carî nizanibin bê ka me xwe gihandiye heqîqeta dawî yanê na. Sokrates jî gotibû ez zanim ku bi tiştekî nizanim. Lêbelê dîsa jî Sokrates baweriya xwe bi zanayiyê aniye û Ksenophanes jî wiha bawer kiriye ku meriv bi rêya zanayiyan, dikare nezaniya xwe kêm bike. Baweriya herduyan jî bi lêgerîn û fêrbûnê hebû û digotin meriv dikare fêr bibe.

Di dîroka felsefeyê de feylesofê yekemîn ê ku gumanberiyê ji bo xwe mîna rê û rêbazekî û mîna awirek felsefî dîtiye, Pyrrhon (B.Z.365-270) e û Dibistana Septîsîzmê ava kiriye. Ji ber gumanberiya Pyrrhon ya pirole *(pirr, zêde)* carinan ji hinek felsefeyên gumanber re, Pyrrhonîzm jî hatiye gotin. Pyrrhon di artêşa Skenderê Duqûloç **(2)** de esker bûye û ligel wî, çûye gelek deveran û Hindîstanê. Wer xwiya ye ku eskeriya wî û geşt û gerên wî yên dema eskeriyê, bandûreke mezin lê kirine û têgihiştiye cihêrengî û pirrengiya ramanên mirovan. Lewre bawerî û zanayiyên mirovan, li gor cih û warên cihê, dihatin guhertin û Pyrrhon jî baş têgihiştibû vê yekê. Ji ber vê yekê jî, her bawerî jî li gor hinek delîlan dihatin şirovekirin, yan jî Pyrrhon wiha bawer kiriye. Li gor bîr û baweriya Pyrrhonî tişt *(nesne, bireser)* çawa bin, divê meriv wan wiha bibîne û divê bê zanîn ku xwiyakirin xapînok e û lewma jî, meriv nikare bibêje ku şiroveyek ji yan dib rastir yan bihêztir e. Lêbelê ya girîng ew e ku meriv zêde meraq neke û xwe bi herikana jiyanê ve berde. Piştre jî şagirtekî Pyrrhon ê bi navê Tîmonê Phleusi (B.Z.320-230), bi hinek delîlên zêhnî piştgiriya mamosteyê xwe kiriye.

Tîmon wiha bawer kiriye ku meriv tu carî nikare xwe bigihîne bingehekî misoger ya dawindar. Piştî mirina Tîmon, Akademiya Platon ku ji dused salan zêdetir di destê Septîkan de bû, kete destê Arkesilaos û Arkesilaos (B.Z.315-240) bû serekê Akademîaya Platonî. Du rêbazên perwerdehiya Arkesilaosî hebûne: Ya pêşîn raxistina holê ya delîlan a ji bo herdu hêlên pirsgirêkekê bûye û a din jî, nîqaşa li ser angaşta şagirtan.

Piştî Arkesilaosî jî, Karneasdesî (B.Z.214-129) hatiye ser kar û ji bo ku li meydanan ders bide xelkê bajêr, çûye Romayê. Di dersa xwe ya pêşîn de, cih daye nêrînên Platon û Arîstotales yên li ser ehlaqê û vê yekê jî, bandûreke mezin li xelkê kiriye. Di dersa xwe ya duyem de jî, temamiya dersa xwe ya yekem pûçkiriye. Lewre jî, di dîroka felsefeyê de rol û bandûra Septîsîzmê, ji roja ewilîn ve her mezin bûye. Sebebê vê yekê jî ew e ku feylesofên septîk qîma xwe bi bersivên hazir û rûkalî *(banegehî)* ne anîne û ji wan bersivan, gumanê kirine.

Septîkekî din ê navdar jî, feylesofê îskoçî David Hume (1711-1776) ye, ku bi çend sed salan piştî feylesofên septîk hatiye dinyayê. David Humeyî jî, gumanberiya xwe wiha aniye zimên: Ji bo ku em bikaribin bijîn, em bêgav in ku hinek biryaran bigrin û hinek tiştan hilbijêrin; ev yek jî bivênevê derheqê hinek bûyeran de dibe sebebê nirxandin û darizandinan. Lêbelê di destê me de ji ber ku delîlên misoger *(naguher)* tune nin, em nikarin hemû delîlan *(dijberî, dibetî)* heman dem û hêzê de binirxînin. Ji ber vê çendê jî, divê em gumanên xwe kêm bikin, da ku em bikaribin bijîn.
Dixwazim vê nivîsa xwe, bi gotina Sekstos Empeirikosê septîk **(3)** biqedînim, ku gotiye dema meriv gumanê dike, desta ewil ji darizandinê û piştre jî, ji diltengiyê xilas dibe.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
28.03.2016

***Jênivîs***
***1- Karneades (B.Z.214-129)***
*Karneades, nîqaşkarekî jîr û jêhatî bûye. Serekê akademiya Platon û aligirekî jêhatî ê Dibistana Septîk bû, piştî demekê jî hate ciyê Arkesilaos. Bi taybetî jî rexneyên tûj li felsefeya Epikurosparêz û Stoaparêz kir.*
***2- Hêz, bandûrê li ramanan dike.***

*Di pêşveçûn û berfirehbûna felsefeya rojavayê de, bandûra Skenderê Duqûloç (Aleksandros III. Alexander the Great, B.Z.356–B.Z.323) gelek mezin e. Dewletên bajarî yên yewnan wê demê serbixwetiya xwe winda kirine, lêbelê Zimanê Yewnanî jî bûye zimanekî gerdûnî.*

***3- Sekstos Empeirikos (P.Z.sala 200an)***

*Em zanayiyên rast yên derbarê jiyan û berhemên Pyrrhon ku damezranerê Septîsîzmê ye, ji xebatên Sekstos Empeirikos fêr dibin. Bêguman Sekstos ne feylesofekî xweser e, lêbelê nêrîn û ramanên feylesofan gelekî baş nivîsandiye (Pyrroneioi Hypotyposeis) û bandûrê li xelkê kiriye. Piştre, di Sedsala 4an de, ji aliyê Ezîz Gregorûsî ve bi tawana ku nexweşiya gumanberiyeke pîs belav kiriye, hatiye tawanbarkirin.*

***Septîsîzm:*** *(ing: scepticisme), (fr: scepticisme), (tr: kuşkuculuk)*

***Çavkanî:*** *Dîroka Felsefeyê. Ali Gurdilî. Xebateke Çapnebûyî.*

‘Heta ku mirovek îdeayê fêr nebe û îdeayê ji tiştên din cuda neke û nikaribe ji yekê din re qise bike û mîna lehengekê ku di şer de ye; xwe ji hemû astengiyan rizgar neke û delîlên xwe, ne li gor tiştên xwiyakirî; belam li gorî yên ku hene ramanên ronahiyê dernexe holê û bi rêyaka eqlî, ji hemû dijwariyan derbas nebe; ew ti caran nagihêje başiyê.’

**(Platon| B.Z.427–347)**

## **Pêdiviya Me Bi Dirûstî, Heqîqet û Rastgotinê Heye Çorê Arda**

E. M. Cioren dibêje ku 'Gumanbarî' helwesteke pirr hêja ye, lê dibêje ne encameke paradoksî ye, divê şikbarî tiştekî zikmakî-fitrî be. Weke em dizanin ku Descartes jî li ser şikbariyê rawestiya ye û têgeha sereke jî ji bo wî şikbarî ye. Ji ber vê yekê jî, ji bo têgihiştina baweriyê, hebûnê-tunebûnê, ramanên û rexneyên baş şikdarî pêwîst e, loma jî pêdiviya me bi felsefê re heye û şikberî jî pêşketin e. Sokrates, di pareznameya xwe de li –Heqîqetê- digeriya ji ber vê sedemê jî jiyana wî di xeterê de bû, jixwe ava serlehengiyê pê dane vexwarin û bû lehengekî navdar. Lê wî da dû zanistiyê, zanyariyê û tekûzbûna ruhî. Talî zanistî, zanyarî û ruh di nav hevdu de strand, bi vî awayî hevîrê heqîqeta xwe derxiste hole. Ango ji bo ku em heqîqetê bibînin an jî nêzî wê bibin, divê zanistî, zanyarî û ruh di bermîlekê de bikelin, dema ku ew têgihan di hişî de keliyan, wê çaxê ew ê rehet di rêya heqîqetê de bimeşe, loma jî bo heqîqetê pêdiviya me bi felsefê heye.

Michel Foucault, di pirtûka xwe ya  di 'Gotina Rastiyê' de li dû şopa 'parrhesiastes' ketibû, ango li dû heqîqetê, rastiyê, xeteriyê, retorîkê, ramyariyê, peywirê û rastbêjiyê ketibû, ji ber ku di hundirê heqîqetê rastbêjî pêwîst e. Heqîqet, rastgotiniyê, rastiyê û dirûstbûnê di xwe de dihebîne, loma jî yekê dirûst, rastbêj, di heman demê de jiyana wan dikeve xetereyê, loma jî rastgotin û dirûstayî û heqîqet bare wê giran e û herkes nikare têkeve bin bare giran yanî serêşî ye, loma jî pêdiviya me bi serêşiyê heye.

Yeke baş felsefeyê di aşê sere xwe de bihêre, bihûne, biseyîne û berî hertiştî felsefê bihundîrîne ewcax gelek tişt ew ê bixwe serrast bibe, wekî em dizanin ku tekûzî tuneye, tenê tekûziyek heye ew jî xweza ye, xweza jî Xweda bi xwe ye. Îja ji ber van sedaman pêdiviya me bi felsefeyê re heye.

Ji bo ku:
Em xwe bigihînin heqîqetê,
Em xwe bigihînin rastiyê,
Em xwe bigihînin rastbêjiyê,
Em xwe bigihînin dirustiyê,
Em xwe bigihînin ramanên baş,
Em xwe bigihînin dahûrandinên baş,
Em xwe bigihînin asteke baş ya rexneyî û nirxên baş.
Ango ji bo rexne, nirxandin, dahûrandin û tehlîlên baş, pêdiviya me bi felsefê heye.

**Çorê Arda**
27.02.2016

‘Gelî mirovên ku min mehkûmê mirine kirin! Ez dixwazim ji we re behsa siberojê bikim. Lewra, wê di nêzîk de ez ê bimirim. Dema demjmêra mirina mirovan tê, ji wan re hêza gotina siberojê tê bexşkirin. Ji we merkujan re, ez dixwazim vê yekê bibêjim: Piştî mirina min, cezayekê girantir li benda we ye. Heke hûn bawer dikin ku bi riya kuştinê, hûn ê rê li gotina xirabiyên xwe bigrin, hûn gelekî dixapin. Ev tevgera we, rêbazeke bêşeref e. Riya herî hêsan û ader ne xirabnîşandana mirova ye, xwerastkirin e.’

**(Axaftina Dawî ya Sokrates)**

## **Campanella û Welatê Rojê**
## **MahmutOzçelik**

Yekem pirtûka utopîk ji hêla Thomas More ve hatibû nivîsîn û gelek deng vedabû. Piştî More ji pirtûkên herî balkêş yên utopîk jê yek jî ‘Welatê Rojê’ ye ku piştî derçûna pirtûka More bi qasî sed salî şûnde ji hêla Thoma Campanella ve bi zimanê latînî hatiye nivîsîn. Belkî mijara herî seyr û balkêş ew e ku Campanella naxwaze mirov zêde bixebitin û xwe biwestînin. Daxwaza wî ew e ku mirov rojê tenê çar saetan bixebitin û demên din jî bi xwendinê, bi zanistê û bi nîqaşkirina mijaran, bi meşê, bi sporê re derbas bikin û pê kêfxweş bibin. Li gorî Campanella hem feqîrî hem jî dewlemendî mirovan ji riya rast dûr dixîne û dibe sedem ku mirov bibin xwedî gelek xisletên neyînî: Dizî, konetî, derewînî, bêedebî, fenokî, ji hezkirinê bêparî, cahilî, pozbilindî hwd. Ji ber van xisletên neyinî ye ku Campanella dixwaze di modela dewlata ku ew disêwirîne de dewlemendî û feqîrî tunebe. Lê divê em vê jî jibîr nekin, îhtîmalek mezin e ku Campanella di bin bandora pirtûka Thomas Moreyî ya bi navê ‘Utopîa’ de maye. Ji ber ku gotar pir dirêj nebe ez ê qala xalên wan yên hevbeş nekim û li benda rûberîhevkirina xwendevanan bihêlim.
Ev welatê Campanella behs dike giravek e ku li başûrê çixêza ekvatorê cih digire û navê wê Girava Taprobana ye. Niştecihên wê ji ber zordariya li welatê Hindistanê li wan dibû, cihê xwe terikandine, hatine û li vir bi cih bûne. Û hemû karên xwe li gor tevger û guherîna tav, heyv û stêrkên din eyar dikin. Welatê wan li ser girekî, li gor tevgerên li asîman wekî xelekan/çemberan bi hev ve girêdayî û bi tevahî ji heft xelekan pêkhatiye. Her xelekekê navê xwe ji gerestêrkekê girtiye û dora wê jî bi dîwarên stûr hatiye lêkirin. Li ser gir li rasteyek ku wekî navenda welatê wan e perestgehek mezin heye. Ev welat bi dîwarên xelekî, bi stûn û kemer û qubeyên xwe, bi perestgehên xwe, bi qonaxên xwe yên xweşik mirovan metelmayîn dihêle. Her tiştên wan hevpar e.

Hetanî jinên wan jî hevpar e. Ji ber ku li gor fikra wan kana her xerabiyê ji mulkiyeta taybet der dibe.
Berî werbûna ber bi nav pirtûkê ka em binihêrin Campanella kî ye.
**Campanella kî ye?**
Navê wî yê rastîn Gîovannî Domenîco Campanella ye. Di sala 1568an de li başûrê Îtalyayê tê dunyayê. Malbata wî bi karê solkeriyê re mijul dibû û wekî malbatek xizan dihat nasîn. Di xortaniya xwe de dikeve nav Terîqeta Domînîken û kesayetiya wî li wir şêwe digire. Ev terîqet li ser mezheba katolîkî ye û di sala 1216an de hatiye damezrandin.
Di bin bandora ramanwerê îtalî Bernardîo Telesîoyî de dimîne. Telesîo ramanwerekî li dij ramanên Arîstotelesî derdiket bû û xwezayê wekî heyînek zindî didît, sedema her tiştê di xwezayê de pêk dihat wekî têkiliya di navbera germahî û sermahiyê de didît. Campanella jî ev raman pejirandibû û rêgeza Telesîo diparast: ‘Zanayî ne bi aqil, bi sehekan tê bi destxistin.’
Dîsa li gorî Campanella ‘xweza ew pirtûk e ku derheqê <pirzaniya sermedî> de hatiye nivîsîn.’ Tewsîyeya Campanella ji mirovan re ew bû ku digot ji dêvla pirtûkan de hewl bidin ku hûn xwezayê fêhm bikin. Campanella bi stêrnasiyê re jî serê xwe êşandiye, derheqê cîsimên asîmanî de bûye xwedî agahiyan. Tevî stêrnasiyê bi sêhra xwezayî û xwedayî re jî bilî dibe û wisa difikire ku ev herdu cureyên sêhrê baweriya heqîqî ye û ji sêhra şeytanî û xapînokî cihêtir e. Lê mixabin ji ber fikrên xwe yên felsefî û ramanên xwe yên li dijî dêr û desthilatiya wê demê, wekî mirovekî talûke yê divê tim di bin çavdêriyê de were girtin tê dîtin, bi jirêderketinê tê tawanbarkirin, rastî îşkeceyên giran tê, di dadgeha engîzîsyonê de tê darizandin û nêzikî nîvê emrê xwe -27 salan- di zindanan de derbas dike. Di dema zindanê de di sala 1602an de bi zimanê îtalî pirtûka xwe ya giranbuha Welatê Rojê dinivîse. Wergera wê ya latînî bi qasî sêsed salî bê navber tê xwendin. Herî dawî ji Îtalyayê direve, xwe dispêre bajarê Parîsê û mixabin di sala1639an de di 71 saliya xwe de li wir dimire.

**Welatê Rojê:**
Pirtûka Welatê Rojê wekî sohbetek di navbera du mirovan de derbas dibe: Mirovê yek deryavanek cenevîzî-di Serdema Navîn û Nû de bajêrek Îtalyayê- ye, bi meraqa welatên nû û kevneşopiyên wan binase, dikeve rêwîtiyek, di dema rêwîtiya xwe de xwe li giravekê dibîne, şêniyên giravê wî dibin Welatê Rojê, ew li wir şahidiyê li her tiştên wan dike û matmayî dimîne: Rêveberî, perwerdehî, tenduristî, çandinî û hwd. Piştî gera xwe ya dirêj vedigere welatê xwe û bi keşîşek peywîrdarê nexweşxaneyekê ye re dikeve sohbetê, hemû tiştên di dema rêwîtiya xwe de dîtiye û jiyaye, bi kelecanek mezin ji Hospîtalarus re vedibêje. Campanella navê herdu mirovên bi hev re sohbetê dikin nedaye, ji ber vê yekê karekterên di pirtûkê de du mirovên bênav in lê em ji peywîrên wan dizanin ku yek deryavan e û têra xwe li ser okyanus û behran geriya ye û yê din jî serrehîb e û bi meraq li hêviya agahiyên tê vegotin e.

**Rêveberî:** Hikûmdarê wan yê herî payeberz wekî Metafizîk an jî wekî Roj tê binavkirin, ev hikûmdar di heman demê de rehîb e. Rehîbê ji hemû karê dîn û dunyayê berpirsiyar û derheqê her mijarê de biryara herî dawî dide ye. Tu kes berî sî û pênc saliya xwe nikare bibe xwedî vê erka payeberz. Dema bû xwedî vê hikûmdariyê jî hetanî mirinê berdewam dike. Ev hikûmdar divê mirovekî pirzan yê pirhêlî be. Ji asîman û rûzemînê hetanî bi behran û okyanûsan, ji rêgezên xwedê bi hetanî pêxemberan û pirtûkên wan, ji matematîkê hetanî hunerên cur bi cur ji hemû zanistan divê fêhm bike. Ev jî tê wê maneyê ku rêveberê Welatê Rojê ji mirovên pirzanan *(bîlgeyan)* pêk tê. Sê alîkarê wî hene: Hêz, Zanatî û Hezkirin. Ev her sê alîkarên hikûmdar qet bi tu awayî nayê guhertin. Hêz ji şer, hunera leşkerî û ji aştiyê berpirsiyar e. Zanatî ji beşên hemû huneran, ji perwedehiyê û zanistan berpirsiyar e. Hezkirin ji zêdebûn û çêbûna nifûsê berpirsiyar e. Ji bo jin û mêr nîjadek bêqisûr çêbikin dixebite û piştî welidînê jî berpirsiyariya perwerdehiyek baş ya hemû zarokan pêk tîne. Ji

çand û dermalekirina hemû civakê jî 'Hezkirin' berpirsiyar e. Dîsa meclîsek gelemper heye ku her kesê salê wî ji bîstî derbas kiriye, dikare tevlî bibe û derheqê pirsgirêk û pêwîstiyên welêt de fikrên xwe bibêje. Li gorî Campanella jiyanek bextewar ancax bi hebûna van çar hêmayan pêkan e. Desthilatdariyek komunîst serwer e. Taybetiya vê serweriyê ew e ku her tişt hevpar e û kesên dewletê birêve dibe, divê xwedî agahiyên herî berz û bala bin. Zagonên wan pir hindik û sade ne û her kes bi hêsanî têdigihêjin. Li ser lewheyek hatiye nivîsîn û bi deriyê perestgehê ve aliqandî ye. Girtîgeh û celadên vî welatî tune ne. Ji ber ku her kes ji bo sûdeweriya gelemper yanê ji bo civakê bi dilxwazî û bi dilpakî dixebite, mirovên xerabfikir li vî welatî nayê dîtin, ger tekûtûk hebe jî gel cezayê wî didinê.

**Cografya:** Welatê Rojê di nav Okyanusa Hindê de cih digire û wekî Girava Taprobana tê nasîn. Ev girav li başûrê xêza ekvatorê ye. Dibe ku welatê ku îroj jê re Srî Lanka tê gotin be.

**Çandinî û sewalvanî:** Çandinî karê hevpar ê welatiyan e. Jin û mêr hemû ji bo xebata zevî û baxçeyan peywîrdar in. Erdê sûdewer bi qasî bihostekê jî vala nahêlin. Cotkirin, toxim avêtin, kulbekirin *(tevirkirina)* axê, çinîna zeviyan hemû karê jin û mêran yê hevpar e. Ji bo xêr û bêra axê tu carî zibil *(gubre)* bi kar naînin. Karê xwe yê çandiniyê li gorî pirtûka cotkariyê ku navê wê Georgîca *(Hunera)* Cotkariyê ye pêk tînin. Sewalvaniyê jî bi heman şêweyî dikin, li gor pirtûka şivaniyê ku navê wê Bucolîca *(Helbestên Şivaniyê)* ye pêk tînin. Her cure sewalan xwedî dikin. Ji hespan hetanî gayan, ji miyan hetanî beranan û sewalên koxikan yên wekî qaz mirîşk, werdek û hwd. Li kêleka bajêr cihê şîr berhevkirinê û çêkirina rûn, penêr û mast heye.

**Jiyana civakî**: Hemû welatî di xaniyên hevpar de rûdinin. Her şeş salan carê niştecihên welêt ji çemberek koçî çemberek din dikin û li wir mecbûrî rûniştinê dibin. Jin piştî nozdeh saliya xwe, mêr jî

piştî bîst û yek saliya xwe dikare têkiliya cinsî bitehmije. Lê hinek xortên ku pir bê sebir bin, ji bo wan destûra bihevşabûnê ya bi jinên jê zarok çênabin re, bi jinên ducanî re tê dayîn. Ji ber ku jiyanek malbatî di vî welatî de tune ye, kesên ku dilên wan hevşabûnê bixwazin bi destûra 'zanayê tipê' li cih û dema ku ew terxan dikin de, vê xwesteka xwe bi cih tînin. Jinên bedew, bejn dirêj ancax bi mêrên qirase yên dixwazin hevşabûnê pêk bînin re tên cem hevdu. Dîsa jinên qelew bi mêrên zêîf re, jinên zeîf jî bi mêrên qelew re tînin cem hevdu da ku nîjadeke/nesleke qenc û bi tendurist bi dest bixin. Ev karê hevşabûnê sê rojan carê pêk tê. Saeta hevşabûnê jî ji hêla astrolog û hekîman ve tê destnîşankirin. Ger jinek piştî hevşabûnê ducanî nemîne, îcar bi mirovekî din re hevşabûnê pêk tîne. Ger dîsa jî çêbûna zarokê nebe ew jinik êdî di hêla hevşabûnê de azad e û bi vê yekê jî rûmet û qedirbilindiya xwe ya di nava civakê de winda dike, di perestgehan de, di sifreyên hevpar de jê re cih namîne. (r.63). Di vî welatî de nexweşiyên ji sedema têkiliya cinsî pêk tê qet nayê dîtin, çimkî tim û tim bedenên xwe bi şerabê dişon û bi rûnên bêhndar nerm dikin. Jina ku jê re zarok çêdibe derbasî 'malên/xaniyên giştî' yên ji bo wan hatiye amadekirin dibin, bi xurekên sûdewer tên dermalekirin. Dergûş bi qasî du salan bi şîrê dayikê tê xwedîkirn. Piştî vê demê zarok keçik be teslîmî mamosteya jin, ger kurik be teslîmî mamosteyê mêr dibe û bi zarokên din re fêrî her tiştê ku di jiyanê de jê re pêwîst e dibe: Lîstik, fêrbûna elfabeyê, çêkirina wêneyan, meş, gulaşgirtin, fêrbûna zimanên din. Piştî şeş/heft saliya xwe jî fêrî zanistên xwezayî dibe. Welatiyê Welatê Rojê jiyana xwe li gorî astrolojiyê eyar dikin. Çimkî li gorî wan her stêrkek hêzek esasî ye ku bandorê li jiyana mirovan dike. Hemû karên rojane ji bo jin û mêran hevpar e lê karên wekî cotkirina zeviyan, çinîna genim, berhevkirina mehsûlan ku quweta bedenî dixwaze ji hêla mêran ve tê kirin, jin jî bi karên hêsantir re mijûl dibin. Amadekirina xwarinê û sifreyê, dotina pez, çêkirina penêr, teşîrêsî, dirûtina cilûbergan û hwd. Xwarin di sifreyên hevpar de tê xwarin. Di dema xwarinê de xortekî ji pirtûkekê bi dengê bilind

çend rûpelan dixwîne. Lîsteya xwarinan ya rojane, ji berê de ji hêla rayedarên berpirsê dermalebûn û tenduristiyê ye ve tê kifşkirin. Xwarina nexweş û kalan jî li gor wan tê amadekirin.
Di vî welatî de quretî û pozbilidî wekî şerma herî mezin tê dîtin, ji ber vê yekê her kes ji van xuyên xerab dûr disekinin. Ev jî rê li ber xizmetkirina civakê vedike û kes ji xizmeta civakê xwe nade alî. Dema xizmetkirin wekî dilpakiya herî mezin were dîtin wê çaxê pêwîstî bi koletiyê re jî namîne. Ji xwe taybetiya vî welatî jê yek jî nebûna koletiyê ye. Ji ber ku her kar û xebat û pîşe bi hevparî û hevbeşî pêk tê, pêwîstî bi xebata zêde û dirêj re jî namîne. Her mirov rojê çar saetan dixebite. Wextên xwe yên din bi lîstikan, bi xwendinê, bi nivîsînê, bi nîqaşê, bi hunerê, bi meş û werzîşê re derbas dikin. Lîstikên bi rûnişkandî tên lîstin qedexe ne. Ji ber ku tenduristiya mirovan ji holê radike. Girîngîdayîna zêr û zîvan tune ye, wan wekî têkberên xeml û şoretê yên ji rêzê dibînin. Bi boyaxê xwe xemilandina jinan sûcê herî mezin e û dibe ku jina ew sûc kiribe bi îdamkirinê re rû bi rû bimîne. Bazirganî tenê ji bo mirovên ji welatên din tên û tiştinan dikirin heye, di nav welat de pêwîstî bi ticaretê re tune ye, ev rewş dike ku dirav jî bê qîmet be. Diravan tenê ji bo peywîrdarên xwe yên li devreyî welat dixebitin bi kar tînin. ‘Di welatê wan de dewlemend û feqîran hemûyan bi hev re jiyanek hevpar sazkirine. Hemû dewlemendin çimkî xwediyê her tiştîne, hemû feqîrin çimkî xwedî tu tiştî nîn in.’ (r.70). Di welatê Rojê de kes zarokê xwe nas nake, ji ber ku piştî du salan dewlet wan digire û di perwerdehiyek li gor berjewendiyê dewlet û civakê ye de dişêwîne. Dê û bav zarokan mezin nake, hesta xwedîtiya li mal û milk, zarok û hevjînê/a tune ye, her tişt hevpar e, hetanî jin jî di nav de. Lê em di vebêjiya deryavanê cenevîzî de dibînin ku Campanella bi tu awayî hevpariya jinê ya nav nivînan qebûl nake: … li Welatê Rojê min dît ku jin hem di xizmetê de, hem di nav nivînan de hevpar e (...) Ancax ez difikirim ku di vê mijarê de xelet in. (…) Dêra me guncan dîtiye ku jin aîdî kesekî be ku ne ji bo qenciyek mezin bike, belbî ji bo xerabiyek mezin asteng bike. (r.71). Çêbûna zarokan tenê ji bo berdewama

nîjadî ye, ne ku xwestekek takekesî ye. Li gor welatiyên Welatê Rojê perwerdehiya zarokan ji bo dahatûya dewletê pir girînge û ji ber vê yekê hêj di du saliya xwe de zarok ji dêya xwe tê girtin û teslîmî desthilatdarên dewletê dikin.

**Ol/dîn**: Baweriya wan nêzî ola xiristiyaniyê ye lê ji wan re tu pêxember û wehî nehatiye. Rojê wekî şewqvedêra Xwedê dibînin, jê re rêzê digirin û bi saya wê baweriyê bi Xwedê tînin. Wekî teswîra zindî ya Xwedê be li Rojê dinihêrin, lê perestiniya xwe tenê bi Xwedê tînîn. Roj ji bo wan rûyê Xwedê yê dixuye ye. Ji xwe navê hikûmdarê wan jî Metafizîk/Roj e. Roj di heman demê de rehîbê herî mezin e. Her sê alîkarên wî jî -Hêz, Zanatî û Hezkirin- rehîb in. Peywîra wan pakkirina wijdana mirovan e. Ev rehîbên payeberz ji gel hînî gunehên wan dibin, wan gunehan ji hikûmdar Roj re aşkere dikin. Bi vî awayî rehîbên welat hîn dibin ku gunehên herî zêde xisarê didin welat kîjanin û li gorî vê rewşê jî çareseriyên pewîst pêk tînin. Li vî welatî yên dimirin tên şewitandin. Li gorî baweriya wan ew mirî dê veguhere agir ku elementa maqûl û pir bi hêz ya ji Rojê hatiye û dê dîsa vegere Rojê. Li gorî baweriya wan ruh nemir e. Di navenda bajêr de perestgeheke wan heye, di şiklê çemberî de hatiye avakirin û bi stûnan hatiye dorpêçkirin. Di bin arîkan de heft çirayên zêrîn bi şev û roj ronahiyê belav dike. Welatiyên Welatê Rojê pir zana nin. Hema hema ji her tiştî fêhm dikin û agahiyên wan ji her tiştî heye. Ji ber vê rewşê mirov dikare bibêje ev welat, welatê ji mirovên zanayan pêkhatî ye.

**Jiyana Leşkerî:** Ji bo xwe ji nişkav de di şer de nebînin, her roj xebatên têkilî leşkeriyê dikin. Di biçûkatiyê de fêrî leşkeriyê dibin. Divê her kes avjeniyê bizanibin. Nêçîrvanî ji bo amadehiya leşkeriyê pêwîst tê dîtin. Di hêla teknîka leşkerî de li pêş in. Mencenîqên wan, topên wan yên li ser erebeyên du maranî, bivir û tevr, tîr û kevan, rim û rot, şûr û xencer, gurzên hesinî, tiving û devançeyên wan, hesp û siwariyên wan her tişt ji bo têkbirina

dijmin amade ne. Di qada şer de kesên ji ber dijmin bireve cezayê wan mirin e. Kesên guh nedin fermanan di çalên kûr de dibe xwarina ajalên dirinde.

**Huner, zanist û exlaq:** Her zarok di yek saliya xwe de dest bi perwerdehiyê dike. Jin û mêr bê cudayî di hemû şaxên hunerê de bi hevdu re perwerdehiyê dibîne. Di sê saliya xwe de her zarok hînî ziman dibe û alfabeya li dîwaran nexşkiriye dixwîne. Hetanî heft saliya xwe werzîşên bedenî dikin ku bi tenduristî mezin bibin. Di heft saliya xwe de her zarok dihere atolyeya hunerê da ku di kîjan şaxa hunerê de xwedî qabiliyetê ye bê dîtin. Li gorî vê qabiliyetê dê ji xwe re şaxek hunerê hilbijêre û perwerdehiya xwe berdewam bike: Wekî solkarî, hesinkarî, dartraşî, wênesazî û hwd. Hunera herî sereke wêne ye. Piştî heft saliya xwe jê hinek zarok li ser zanistên xwezayî tên perwerdekirin. Her kes wêneyên baş xêz dikin. Li ser dîwarên ku dişibe çemberan/xelekan wêneyên her cure cismî tê xêzkirin û di binê wêneyê de jî bi çend peyvan taybetiya wê tê vegotin. Ji cismên geomêtrîk hetanî kevir û daran, ji nebatan hetanî cureyên ajalan, -teyr û tilûr û mar û marîjok jî di nav de- ji çiyan hetanî robar û behran wêneyên her tiştî li ser dîwarên li welêt tê xêzkirin, bi çend peyvan bikêrhatina wan ya ji bo mirovan tê pênasekirin û bi vî hawî her kes di her babetê de dibe xwedî agahiyan.
Stêrnasî zanista herî girîng û pêşketî ye. Çimkî ji bo wan pirsa gelo dinya çawa avabû? Gelo dê dawiya wê bê an na? Ger dawiya wê bê wê kînga bê? Ji bo van meraqên xwe nexşeya stêran çêkirine û her karên xwe li gor tevgerên cismên li asîman bi rê ve dibin. Hetanî ev karê stêrnasiyê wisa pirole kirine ku hevşabûn û anîna dinyayê ya zarokan jî li gor xuyabûn an tevgerên hin stêr û hin cîsman eyar dikin.

**Çavkanî:** Campanella, Güneş Ülkesi (Welatê Rojê), Weşanên Alfa, çapa yekem 2014, Wergêra ji latînî bo tirkî: Çiğdem Dürüşken

# LI SER HEBÛNPARÊZIYÊ

Hebûnparêzî *(existansiyalizm)* çi ye gelo? Terîfkirina hebûnparêziyê ji hêla felsefî ve bi aweyeke termînolojîk nehatiye kirin. Her feylesofek li gor xwe ji bo terîfkirina hebûnparêziyê çend wesf û peyvan gotibin jî, hemfikir nebûne. Ji bo hebûnparêziyê Simone Weil dibeje tengavî, Emmanuel Mounier dibêje bêhêvîtî, Banfi dibêje reşbînî, Wahl dibêje serhildan, Marcel dibêje azadî, Lukacs dibêje îdealîzm, Benda dibêje bêaqilî, Foulquie dibêje tewşikî û hwd.(**1**) Dema ku meriv behsa hebûnparêziyê bike herçiqasî Soren Kierkegeaard û Martîn Heidegger ku wekî bavê hebûnaparêziyê têne hesibandin; dîsa jî Jean- Paul Sartre tê bîra me.

Sartre derheqê hebûnparêziyê de dibêje ku her cîsmek xwediyê **cewher** *(essence)* û **hebûnekê** *(exist)* ye. Cewher xwediyê koma wesfê xwe ye. Hebûn jî li gerdunê bi wesfê çalakiya xwe heye. Û didomîne, dibêje ku 'Hebûn pêşiya cewherê de têt.' Ev hevok tê çi wateyê gelo? Sartre di sala 1946an de li ser navê **hebûna însanetiye (*Lexistentialisme est un humanisme*)** konferansek pêk tîne, konferans di pirtuka 'Hebûn û Nebûn'ê de tê nivisandin. (**2**) Di konferansê de hem daxuyaniya hebûnparêziyê dide û hem jî bersiva rexnêyên giran, ku lê kirine dide. Niha em ê vê hevokê vekin û tehlîla wê bikin.

Hebûn di pêşiya cewherê de têt. Sartre di pêşiya gotina vê hevokê de, ji xwe re dibêje ku 'ez xwedênenas *(ateist)* im'. (**3**) Û didomîne: pêşî em hene, piştre cewhera me têt. piştî hebûnê bi çalakiyên xweser û kiryarên xwe *(suje)* em wesfên xwe bi dest dixin, ango li xwe bardikin. Pêşî însan heye, dema ku însan çêdibe; cewhera xwe bi çalakiyên xwe diafirîne. Sartre ji bo vê yekê minakeke dide: 'em li kaxizek bifikirin. Tê zanîn ku afirêndereke ango çapgereke vê kaxizê heye. Û ev çapger dizane ku wê ji bo çî vê kaxizê biafirîne.

Pêşiya afirênê de wesfê kaxizê diyar dike. Wek mezinahî, reng, nivîs hwd. piştî van wesfa hêj nû diafirîne ango çap dike. Yanê

pêşî cewhera kaxizê diafirîne pişt re hebûna kaxizê derdixe hole. Ev mînak ji bo însan jî heman e. Lê belê Sartre li dijî vê dertê û dibêje ku pêşî însan tê, jiyanê asta yekem yanî hebûna xwe diyarde dike, piştre cewher li xwe dixemlîne yanî wesfê xwe li xwe bar dike. Bi çalakiyên xwe yê kiryar, bîrewer, herdem xwe disêwirîne. Ku em li tunebûna Xwedê bifikrin em ê hebûnparêziyê, zelaltir fahm bikin. Yanî tunebûna Xwedê, bêhtir hevgirî ye.

Sartre dibêje dema kû însan wesfê xwe bidest dixe di pêvajoya rêvedana xwe, kiryarên xwe, çalakiyên xwe biryarên xwe de dikeve nav tengezariyeke. Însaniyetî tengezariyek e. dema ku meriv di jiyana xwe de biryara hilbijartineke bide, ew meriv berpirsyarê hemû însanetiyê ye. Piraniya însanan tenê ji bo xwe difikirin û xweperest *(egoist)* in. Însan di jiyana xwe de her dem di nav çalakiyê deye û ev tengezarî nayê wateya sekinînê, ango bêçalakbûnê. Însan bi hebûna xwe, têkiliya wî bi hemû însanetiyê û xwezayiyê re heye ji ber ku jiyan tevayî ye. Dema ku fermandarêke dilpak di nav pêvçûnê de biryarêk bide, ew fermandar dizane ku biryara wî gelek giring û jîngarî ye. Ji ber vê yekê, li ser milê fermandar bareke pirr giran heye û ev bar wî difetisîne û wî dixe nav tengezariyê.

Li gor min Sartre di bin bandora Descartes û John Lock de maye. Tê xuya ku senteza her du feylesofan kiriye. Descartes dibêje: ‘Cogito, Ergo Sum’ *(Difikirim, nexwe ez heme)* (**4**). John Lock jî dibêje: ‘mejiyê însan wek levhayêke vala ye.’ Em dikarin bêjin kesayetî lewhayek vala be, fikir jî nivîsa wê lewhayê ye.

Heya vê derê me bi kurtasî behsa hebûnparêzya Sartre kir. Jê û pêve, ez dixwazim hebûnparêziya Sarte li gor nêrîna xwe çend xala bînim ziman: Sartre dibêje ez Xwedênenas im û ji bo ku meriv behsa hebûnnasiyê bike û ku meriv Xwedê ji holê rake ev saw behtir hevgirtî dibe. Bi rastî teza Sartre ku dibêje hebûn di pêşiya cewherê tê li gor mantiqê rast e. Gelo ji bo meriv vêya miqabil be, pêwiste ku meriv xwedênenas be? Ango ku meriv xwedênas be, gelo ma ne pêkane ku meriv vê tezê bi pêşve bixe?

Li ser hevoka Sartre em dikarin li ser hebûn û çalakiyên cîsiman nîqaşê bikin. Di serî de em dikarin cîsima *(tişt)* bikin du beşan: Ên zindî û ên ne zindî. Di encama berawirdkirina van herdû beşan dixweyî ku cudayÎya wan li gel îradeyê, ango eqleke çalak û tevger e. Dema ku Sartre jî qala hebûnê dike, ev hebûnnasî ne tenê ji bo cîsimên zindî ye, hem ji bo cîsimên ne zindî ne jî. Lê em ê çawa pêşberiya çalak û tevgeriya cismên ne zindî bikin?

Her cismek li nav xwezaya gerdûnê de bi qebare û girseya xwe ve cîh digire. Xweza li gor qanûnekê *(matematîk, fizîk, kimya)* xwe dimeşîne. Ev qanûn teqez in û xweza ji vê çerçoveyê qet dernayê . Di vê çarçoveyê de tiştên di nav xwezayê de herdem çalakiyekê de ne û guhirandinêkê de ne. Çawa ku Heraklîtosî jî dibêje 'Tû nikarî di çemekê de xwe du caran bişûyî.'

Gelo ku îrada cismên ne zîndî tunebe, wê çawa biryar bidin ku wesif li xwe bikin? Ji bo vê pirsê pêwist e em herin 14.7 mîlyar sal berê yanê destpêkirina gerdûnê ku jê re dibêjin **Big-bang** *(teqîna mezin).* Berî Bîg-Bangê gerdûn tunebû û her tişt yek atomek bû. Dema kû ew atom teqîna mezin kir gerdûn jê peyda bû. Bi demê re gerdûnê sîstemekê ji xwe re avakir û ji teqîna mezin ve, vê sîstemê dişopîne. Ji wê demê heya vê gavê gelek stêrk, gerwêrk, tav, dinya hwd ava bûne û winda bûne. Lê belê tunebûn lê peyda nabe.

Cîsmê di nav sîstema kaînatê de, sabît in. Ne lê zêde dibin, ne jî kêm. Ji bo mînakek dema ku stêrkek biteqe, diguhire çala/qula reş *(black hole)* û ew qul enerjiyeke dihewîne. Yanê stêrk, diguhere enerjiyê. ji bo ku sîstema kaînatê xwe bidomîne, pêwiste ev guherandin pêk bên. Loma em dikarin bêjin gerdûn ango kaînat ji bo berdewamkirina sîstema xwe herdem di nav çalakiyekê de ye. Û tiştên di nav gerdûnê de jî li gor sîstemê pêwiste di nav çalakiyekê de bin, biguherin û wesfên cuda li xwe bikin. di encamê de em dikarin bibêjin sîstema gerdûnê îradeyek bi xwe ye. Îradeya wê jî, qanûn in. Tiştên ne zindî jî, li gel îradeya gerdûnê îradeyeke bikar tînin.

Gelo cudayiya îradeya zindî û ne zindî çi ye? Bi kurtasî em dikarin bibêjin azadbûn e. Yanê tiştên ne zindî îrada wî bixwe ye lê belê ne azad e. Û ev îrada wê jî li gor qanûnên fennî di nav çalakiyekê de ye. *(niha em nakevin berawirdkirina îradeya însan, lawir û nebatan ji ber ku ew nikaşekek din e)*. Însan xwedî îradeyeke azad e. Bi serê xwe û bi îrada xwe ya azad, bi fikr û çalakiyên xwe di jiyana xwe de rêvedana xwe û biryarên xwe, xweser dide û wesfan li xwe dixemilîne. Ev îradeya azad ne wek tiştên ne zindî di bin zordariya qanûneke de ne. Guherandin û çalakiya însan di destê însan de ye. Ji ber ku îradeya azad gelek çiqildar e.

Kesayetî, hestiyar, sosyal, dozîn, biryar, hişmend hwd di xwe de dihewîne. Ji bo mînakek em dikarin peresînê *(evolution, evrim)* bidin. Li gor peresînê dîroka însanên baqil ku em ji wan re dibêjin Homo Sapiens berê hizrê 200.000 sal bû. Ji wê demê heya îro li ser anotomîya însên gelek guherandin pêk hatine. Însan di xwezayê de, bi tekoşîna xwe hilbijartina xwe bi dest xist û modernîteya xwe avakir. Û vê pêvajoyê jî bi eql û îradeya xwe ya azad pêkanî.

Ji ber vê yekê, em dikarin bibêjin pêşî hebûna me tê û piştre cewher tê. Ev îdîa/saw li gor mentiqê pêkan e. Sartre jî dibêje ji bo meriv vê mentiqê qebul bike, lazime ku meriv xwedênenas be. Bi rastî ev problemeke baweriyê ye. Ji bo ku meriv vê sawê qebûl bike ne hewceye ku meriv xwedênenas be. Yanê em dikarin bêjin însan ne kaxizek e ku cewhera însan di pêşiyê de hatibe diyarkirin û însan li gor vê cewherê hebûna xwe berdewam bike. Berovajî, însan bi hebûna xwe herdem li pey cewhera xwe ye.

Meriveke xwedênas jî dikare bêje Xwedê ne çapgere ku beriya hebûna me de me nivisî be û avêtibe gerdûnê, weke roboteke ku em li gor wê nivîsê çalakî û biryarên xwe bidin. Bi rastî ev mijareke qederê ye. Ku meriv qederê weke 'pêşnivîsek' qebul bike wê demê ne pêkane ku meriv behsa îradeya azad bike. Û wê demê jî em dikarin bêjin cewher pêş hebûnê de têt. Ji ber vê yekê pewiste meriv navlêka qederê ji aliyê qanûnê ve pêk bîne.

**Jan JAN**

04.04.2016

**1-** Jean Paul Sartre. L'existansiyalist est un humanisme. Çev: Asım Bezirci, Varoluşçuluk, Say yayınları, 2013, s.7

**2-** L'Être et le Nêant; 1943

**3-** Jean Paul Sartre. L'existansiyalist est un humanisme. Çev.: Asım Bezirci, Varoluşçuluk, Say yayınları, 2013, s.37

**4-** https://en.wikipedia.org/wiki/Cogito_ergo_sum

'Aqil, çavkaniya hemû livbaziya ye. Aqilên sivik, li hawirdor belav dibin û yên giran jî diçin navendê. Ev yek jî, dibe sebebê vegerê. Ev yek lewnek e û him ji bo mirovan û him jî, ji bo heywanan baş e. Ji ber ku mirov xwediyê desta ye, ew raser e.'

**(Anaksagoras)**

## <u>Felsefeya Dibistana Stoayê û Bandûra wê ya li ser Ramana Îslamê</u>

**Prof. Dr. Ibrahim Çapak**

Di dîroka felsefeyê de, dibistana *(xwendegeha)* Stoayê yek ji wan dibistanên girîng e, ku bandûreke mezin li ser gelek raman û ekolan kiriye û wan xistiyê bin bandûra xwe. Dibistana Stoa'yê B.Z. di sala 300an de li Atînayê hatiye damezrandin û feylesofê Zenon damezranerê vê dibistanê ye. Ev dibistan, di cîhana îslamê dê bi navê 'Rivakiyye' ê tê naskirin û zanîn.

Dibistana Stoa'yê, wekî sê dewran hatiye dabeşandin: Dibistana ewilî , ku bi navê '*Dibistana Stoaya Kevin'* tê naskirin, ji aliyê Zenonê Qibrisî *(B.Z.336-264)* ve hatiye damezrandin û ku Kleantres *(B.Z.331-232)* û Khrysippos *(B.Z.280-210)* jî navên girîng yên vê dibistanê ne. *'Dibistana Stoayê ya Navîn'* jî bi pêşengiya Diogenes *(B.Z.412-323)* hatiye damezrandin û feylesofên Panetius *(B.Z.185-112),* Poseidoioss *(B.Z.135-51)* jî wekî endamê vê dibistanê têne nirxandin. *'Dibistana Stoa'yê ya Dawî'* yan jî '*Stoa'ya Împaratoriyê'* jî, bi pêşengiya Seneca *(B.Z.4-P.Z.65),* Epîktetos *(P.Z.50-130)* û Marcus Aurelius *(P.Z.121-180)* ve Piştî Zayînê di sedala I û II an de hatiye damezrandin.

Ev sê tevgerên felsefî yên Stoics, li herêma Behraspî û li navçeyên cihêreng û di demên cuda de derketine holê. Herçuqasî xwediyê hinek ramanên cihê bin jî, ramanên wan axlebî li ser esasê ehlaq, edalet û erdemê ne. Ev tevgera ramanî ku Beriya Mîladê di dawiya sedsala IV. an de dest pê kiriye, li Romayê jî ji xwe re hinek aligiran peyda kiriye. Dibistana Stoa'yê, bi rêya ramanên Seneca û Marcus Aureliusî, heta dawiya PZ. sedsala II. an jî bandûra xwe berdewam kiriye. Ji bilî vê yekê meriv dikare bibêje ku bandûreke mezin li teolojiya filehtiyê, Shakspeare, Spinoza û Butler jî kiriye. Bandûra Ehlaqa Stoa'yê di Serdema Navîn, Dewra Ronesans û di serdemên nûjen de jî berdewam kiriye, li dibistanan hatiye

xwendandin û feylesofên mîna Montaigne, Descartes û Pascal jî ji ramanên stoics, sûdeke mezin wergirtine.

Dibistana Stoa'yê jî ku yek ji wan tevgerên mezin ya dewra Helenîstîk e, mîna hevdemê xwe dibistana Epîkur'ê hewl daye ku nêrîneka jiyanê a ku dê bikaribe mirovan bigihêjînê bextewariyê raxe holê. Zenonê damezranerê vê dibistanê dibêje ku, bextewarî girêdayî helwesta me ye û ne girêdayî bandûra faktorên der û qederê ye. Ramanên bi vî hawî yên Zenon, di ramana îslamê de bi ramana îradeya cuz'î xwe daye der. Wekî tê zanîn Zenon girîngiyeke mezin daye ramanên Sokrates û gotiye ku bextewarî ne girêdayî tişteke dunyewî ye, yan jî ne dewlemedî û tenduristî ye. Herweha dîsa gotiye ku bi tenê erdemîtî yan jî bêerdemîtî, baş yan jî xirab e. Li gor bîr û baweriya Zenon erdemîtî, weke rewşeke zêhnî ya aram herdem baş e û bêerdmîtî jî rewşeke zêhnî ya bêaram e û ziyandar e.

Li gor bîr û baweriya Stoaparêzan erdem, di jiyana şexsan de tekane tiştê ku baş e. Bi gotineke din erdem, baş'a herî bilind e û wezîfeya ku em jiber xwe ve pêk tînin e. Wekî din hemû tiştên mayî yên wekî tenduristî, serwet, navdarî, kêf, şahînî û hwd. jiber ku dibin armanca daxwazên me, xirab in. Ev ramana wan, li cem gelek feylesofên îslamê jî hatiye dîtin. Mesela Nesîredînê Tusî di berhema xwe ya 'Ehlaqî Nasrî' de li ser van mijaran rawestiya ye û li ser fazîlet û rezilîtiyê rawestiya ye. Dîsa Yahya ibn Adi jî di kitêba xwe ya 'Tehzibu'l Ahlak- Perwerdehiya Ehlaqê' de, li ser wesfên mirovê kamil rawestiyaye û wesfên ku divabe mirove kamil xwediyê wan be, bi berfirehî destnîşan kiriye.

Zenon cara yekemîn felsefeyê wekî mantiq, fizîk û ehlaqê kiriye sê beş û ehlaqê jî, wekî mijara herî girîng yan jî navenda felsefeyê dîtiye. Herweha wusa bawer kiriye ku ji bo têgihiştineke çak ya ehlaqê, pêdivî bi fizîkê heye û hewl daye ku ehlaq û fizîkê jî, bi mantiqê şirove bike. Di van mijaran de û bi taybetî jî derbarê

‘zanîna tiştên îlahî û mirovî’ de û di mijara dabeşandina felsefeyê ya wekî mantiq, ehlaq û fizîkê de, dibistana Stoayê li felsefeyê zêde kiriye û ji wir jî, xwe berdaye kûrahiya ramana îslamê. Ango ev raman, lêzêdekirineke dibistana Stoayê ye. Lewre Îbn’î Ruşd di berhema xwe ya ‘Faṣlu 'l-Maḳāl’ ê de, dibêje ku ‘felsefe, bi rêya fikirîna li ser zindiyên ku hatine afirandin xwe gihandina afirander e.’ û ramanên bi vî hawî raber dike.

Mîna Zenonê Qibrîsî, ramana îslamê jî girîngiyeke mezin daye mantiq, fizîk û ehlaqê. Mesela Îmamê Xezalî gotiye ku ‘mirovên ku bi mantiqê nizanibin, meriv ji ilmê wan bawer nake.’ û girîngiya mantiqê bi awayekî eşkere raber kiriye. Feylesofên îslamê di danasîna erdemê de, di bin bandûra ramanên Sokrates û dibistana Stoa’yê yên ku derheqê ehlaqê de ne mane, lêbelê di mijarên ku ola îslamê wan qedexe kiriye de ji ramanên dibistana Stoa’yê cihê bûne. Mesela Zenon û şagirdê wî Kleanthes, xwekuştinê heq *(rewa)* dibînin, lêbelê feylesofên îslamê xwekuştinê rewa nabînin û wekî guneheke diwesfînin. Ji bo dibistana Stoa’yê mijareke din a girîng jî, diyalektîk e. Bi taybetî jî li ser diyalektîk û retorîkê rawestiyan e. Retorîkê mîna huner û zanîna axaftina spehî *(xweş)* û diyalektîkê jî, mîna bi rêya pirs û bersivan zanîna nîqaşa *(guftegoya)* rast nasandine.

Bi taybetî jî raman û xebatên Khrysipposî yên derheqê diyalektîkê de, di dîroka felsefeyê de gelekî balkêş hatine dîtin. Ji ber vê yekê jî Diogenes Laertios gotina wî ya ku gotibû ‘heke di nav xwedayan de diyalektîk hebûya, dê bişibiya ya Khrysipposî’ vediguhezîne me. Ev yek jî destnîşan dike ku feylesofên Stoa’yê derheqê diyalektîk yan jî ‘cedel’ê *(nîqaş, minaqeşe)* de, gelekî serkeftî bûne. Piştî ramanên Arîstotales yên derheqê diyalektîkê de, ku Arîstotales di dîroka felsefeyê de wekî ‘Mamosteyê pêşîn-Muallimu’l-evvel’ tê naskirin, Stoaparêzan jî ramanên girîng raber kirine. Vê yekê jî wuha kiriye ku di dema şerha *(şirovekirin yan jî ravekirin)* berhemên Arîstotalesî yên derheqê mantiqê de,

ramanwerên misilman bêtir lê haydar bin û xebatên xwe bi hûrbijarî bikin. Herweha meriv dikare bibêje ku xebatên Stoaparêzan yên derheqê mantiq û diyalektîkê de pêk anîne, bala feylesofên mîna Farabî û Îbn'î Sîna jî dane ser xwe û feylesofên navborî jî, li ser heman mijaran ramanên girîng raber kirine.

Di dewra dawî ya Stoa'yê de, rola îradeyê ya li ser şexsan bilind hatiye nirxandin. Li gor bîr û baweriya Stoaparêzan jiyan, şerek bêeman e ku di navbera du dijminan de dertê û wusa jî diqede, ango ew şer e ku di navbera azadî û bengîniyê de diqewime. Ji bo ku meriv bikaribe di vî şerî de bi ser bikeve, divê meriv rê li bengîniyan *(daxwaz, xwestek, ihtîras)* bigre û wan jar bike yan jî divê wan ji holê rake. Ji ber vê yekê jî, divê meriv bi ferqa di navbera wan û meylên siruştî de hene bizanibe. Li gor Zenonî, her meyla *(dilxwaziya)* me jî navajoyek *(dozîn)* e. Heçku, li cem mirovan hêza aqil heye û ev yek jî, rêya xwezayê ya herî herî xwedîbandûr e, ku dixwaze bi vê yekê bigihêje armancê.

Dema meriv çav li feylesofên Stoaparêz digerîne, meriv dibîne ku di nav wan de mirovên kole û hikumdar jî hebûn. Epiktetos kole bûye û Marcus Aurelius jî, hikumdar. Lê herdu mirovan jî, heman felsefeyê pejirandine. Dîsa feylesofên Stoaparêz wuha bawer dikirin ku hemû mirov, birayên hev in û hemwelatiyê dinyayê ne. Di ramanên dibistana Stoa de aliyê olî, bi awayekî eşkere di ramanên Marcus Aurelius te xwe dide der. Seneca û Aurelius, baweriya xwe bi zindebariya rih tînin. Ango li gor baweriya wan, rih tu carî namire. Lê Epiktetosî, baweriya xwe bi nemirina rih nayne. Di nav feylesofên îslamê de jî, li ser vejina nû ya cismanî yan ruhanî nîqaş hatine kirin, lê li ser zindebariya rih ne ketine nîqaşan. Çimku ji ber baweriya xwe ya olî, wuha bawer kirine ku rih nemir e. Ji bilî meseleyên ehlaqî, Stoaparêz girîngiyeke mezin dane mantiq û fizîkê jî û zanista fizîkê, şibandine dareke ku li avahiya kozmosê vedikole.

Stoparêzan zanista fizîkê şibandina dareke, ehlaqê şibandine zeviyeke berhemdar û mantiqê jî, ji bo ku fizîk û ehlaqê diparêze, şibandine kelehekî yan sûrekî. Felsefeyê jî şibandine heyîneke zindî, mantiqê jî şibandine hestî û rehikên wê hêyîna zindî û fizîkê jî, şibandina rihê wê heyînê. Di felsefeya dibistana Stoa'yê de, mantiq cihekî girîng werdigre.

Diogenes Laertios *(P.Z. sedsala 3an)* derheqê mantiqê de wuha gotiye: 'Li gor baweriya Stoaparêzan, perwerdehiya mantiqê bivênevê ye. Lewra mantiq erdemek e û hemû erdemên mayî jî, di hundirê xwe de diguncîne. Kesên ku bi mantiqê nizanibin, dê ji bêgaviyê çewtiyan bikin. Belam mantiq, rê nîşanî mirovên zana dide, da ku bikaribin rastiyê jî çewtiyê cuda bikin. Mantiqzan, di her demê de zana ne, çimku mijarên ehlaqî û fizîkî encax bi saya mantiqê dikarin baş werin têgihiştin. Rastiya hevokan û sererastkirinên zagonan yên derheqê tevgerên mirovan de, encax bi saya mantiqê dikarin werin têgihiştin.'

Ramanên feylesofên mîna Farabî, Îbn'î Sîna û Xezalî, di vê mijarê de gelekî dişibine ramanên Stoaparêzan. Çawa ku me berê jî raber kir Xezalî bi xwe jî gotiye ku 'meriv, ji ilmê kesên ku bi mantiqê nizanin bawer nake.' Farabî û Îbn'î Sîna jî ne wekî haletekî, lêbelê wekî zanistekî mantiqê wesfandine. Stoaparêz, derheqê mantiqê de mîna Arîstotales nafikirin. Arîstotales mantiqê ji bo felsefeyê wekî haletekî *(alavekî)* dibîne. Lêbelê Stoaparêz dibêjin ku mantiq ne haletek e, ew perçeyekî felsefeyê ye. Ango li gor baweriya wan mantiq ne haletekî ramanê yan jî teknîk û hunereke ramanî ye, beravajiya wê, navê tevlîbûn û hevkariyê ye.

Stoaparêz mantiqê, wekî diyalektîk û retorîkê kirine du beş. Sebebê vê dabeşandinê ew e ku di ramanên wan yên felsefî de, raman û ziman ligel hev in û wiha têne nirxandin. Xebatên Zenon yên li ser ziman, bandûreke mezin li nifşên din kiriye û wiha kiriye ku ew jî, heman xebatan bidomînin. Bi vî hawî felsefeya

ziman û teoriya ziman ya ku Stoaparêzan ew ava kirine, bandûreke mezin li dewrên din û li dewra Romayiyan kirine. Ev bandûr di perwerdehiya zimanên kevin *(berê)* de, hêjî girîngiya xwe berdewam dike. Stoaparêzan girîngiyeke mezin dane pirsgirêka têkiliya ziman û ramanê û bêjenasiyê *(etîmolojiyê).* Û vê yekê jî wuha kiriye ku bi berfirehî li ser mijara gramerê rawestin. Ji ber vê çendê jî tê gotin ku Stoaparêz damezranerê zanista gramerê ya kevneşopî ne. Ji bilî vê yekê Stoparêz bi armanca têgihiştina hevoksazî û formên taybet yên hevokan bi helbest, zanîna pîvanê, muzîk û felsefeya ziman re jî mijûl bûne. Di felsefeya îslamê de jî, nîqaşa têkiliya mantiq û gramerê çêbûye. Li ser vê mijarê meriv dikare behsa nîqaşa ku di navbera Ebu Bişr al-Matta *(870-940)* û şagirdê wî ku gramerzanekî navdar e Ebu Saîd' el-Sirafi *(893-979)* pêk hatibû, bike û wekî xebateke mînak raber bike. Wekî tê zanîn Ebu Bişr al-Matta, wekî mamosteyê Farabî tê zanîn û naskirin. Derheqê vê mijarê de dîsa meriv dikare behsa xebata Farabî ya li ser pênc tevahiyan *(beş tümel)* bike. Farabî di vê xebata xwe de Porpyriosî şopandiye, lêbelê Stoaparêz bi tenê li ser cins, cure û celebê rawestiya ne. Farabî jî mîna Stoaparêzan mînakên 'ewtîna kûçikan' û 'hirîna hespan' raber kiriye û ev yek jî, nîşanî me dide ku Farabî ji Stoaparêzan ketumet bûye û di bin bandûra wan de maye. Derheqê pênaseyê de jî Stoaparêz û Farabî, li ser 'hadd' û 'resm'ê rawestiya ne. Bi qasî ku em dizanin li cem Arîstotalesî cudahiya 'hadd û resmê' tune. Kesên ku yekem car wan cuda kirine, Stoaparêz in. Xwiya ye ku Farabî jî di bin bandûra wan de maye û wan bi heman şeklî cuda kiriye. Ji bilî vê yekê derheqê cudakirina tasavvur û tasdîkê jî, tevlîheviyek xwiya dike. Çimku hinek dibêjin ku yekem car Arîstotales wan cuda kiriye, hinek dibêjin na, Stoaparêzan wan cuda kirine û hinek jî dibêjin ku Farabî. Lêbelê, heke em bibêjin ku yekem car Arîstotales wan cuda kiriye, bêguman dê ev yek ne rast be. Dema ku em li çavkaniyan mêze dikin em dibînin ku Osman Emin di berhema xwe ya bi navê 'Felsefetu'r-Revakiyye' û Ali Sami en-Neşşar jî di berhema xwe ya bi navê 'Menahic' de, nivîsandine ku ev cudakirin, yekem car ji

aliyê Stoaparêzan ve hatiye kirin. Farabî, bi tenê dibêje ku 'ilm, tasavvur û tasdîk e.' û wan nasandiye.

Di vê helwesta xwe de, bêguman meriv dikare bibêje ku Farabî di bin bandûra Stoaparêzan de maye. Lewma jî kesê ku yekem car vê cudakirinê kiriye ne Farabî ye, lê kesê ku di cîhana îslamî de vê cudakariyê kiriye, bêguman Farabî ye. Derheqê teoriya zanayiyê de jî ramanên feylesofên Stoaparêz û feylesofên îslamê, gelekî dişibine hevdu. Stoaparêz baweriya xwe bi zanayiyên ku çavkaniya wan sehek in tînin û hinek ji wan jî, wuha difikirin ku meriv, bi zanayiyên xwe têne dinyayê. Ango, zanayî ji zayînê ve li cem mirovan hene. Ev baweriya wan, bi navên 'mahsusat û muşahedat'ê û baweriya zanayiya ku ji zayîna meriv tê jî, bi navê 'evveliyat' ê hatiye vegotin. Di dawiyê de ez dibêjim, ku zanist kirûyek *(olgu)* e û wekî ku Kindî jî gotiye, 'ji kê were bila were, divê em wê bikin sertac û deynin ser serê xwe.' Di meşa mirovahiyê de keda mamosteyê yekem *(Arîstotales)* gelek mezin e û mijarên ku wî kêm hiştine, şopgerên wî hewl dane ku wan temam bikin. Li vir em dibînin ku hinek mijarên ku Arîstotales wan temam nekiriye, Stoaparêzan wan temam kirine. Û hinek mijarên ku Stoaparêzan wan kêm hiştine jî, ramanwerên misilman wan temam kirine. Mesela Arîstotales di berhema xwe ya Organon'ê de, behsa pêşniyar û kiyasên bişert nekiriye, lêbelê piştre Stoaparêz li ser vê meseleyê rawestiya ne. Feylesofên mîna Farabî jî, vê meseleyê belav kirine û çêtir dane zanîn. Dîsa derheqê ehlaqê de jî Stoaparêzan hinek nêrînên ku dişibine nêrînên Arîstotales *(Arîstotales wan di berhema xwe ya Etîka Nikomakhos de vegotiye)* raber kirine. Heman nêrînan, em di berhemên ramanwerên îslamê de jî dibînin. Mesela derheqê vê mijarê de berhema Îbn Miskeveyhî ya 'Tehzibu'l-ahlak' û berhema Nasiriddin Tusî ya 'Ahlaki Nasiri' mînakên eşkere ne. Dîsa eşkere ye ku cudakirinên Stoaparêzan yên tasavvur, tasdîk, hads û resm'ê, bi heman hawî li cem ramanwerên îslamê jî tê dîtin.

Derheqê mijarên jêderka ziman, têkiliya ziman û mantiqê û têkiliya ziman û gramerê de jî, ramanên wan dişibine hev.

**Prof. Dr. Ibrahim Çapak**

**Çavkanî:** Kovara Sabah Ulkesi. Hejmar 44. 2015

**Werger: Ali Gurdilî**

felsefevan@hotmail.com

**19.10.2015**

‘Bextewarî, tişteke hûndirî ne. Bextewarî jî ya rih e, bextreşî jî. Rih, rawestgeha bextewarî û bextreşiyê ye. Ne hemû kêfan, lê divê mirov yên li gorî ehlaqê delal in hilbijêrin. Mirov, ji bo ku bikaribin fêhmkoriya xwe biveşêrin, xwe kirine peykerekê çarenûsiyê. Lewra çarenûsî, pirr kêm bi hizirdariyê re şer dike.’
**(Demokrîtos)**

## Bextewariya Mirovî û Bajarê Xwedîerdem di Ramanên Farabî de Georgios Steris

Ebu Nasr Muhammed el-Farabi (870-950), yek ji wan feylesofên herî girîng ê Serdema Navîn e. Derheqê jiyana wî de, zanîniyên me gellek kêm in û pirraniya zanîniyên me jî, ji desta duyemîn hatine veguhastin û hevnegirtî ne. Wusa xwiya dike ku Farabî, mirovekî nefbiçûk bûye û jiyaneke sade jiyaye û ne daye dû navdariyê. Berhemên wî jî, berhemên gellek bitevsîlat û giranbiha ne. Bi rastî jî ew feylesofekî rastîn û gewre ye ku mîna hevdemên xwe, ne tenê şirovekarê feylesofên dewra yewnan ya klasîk bûye. Berhemên wî, di demekê kurt de hatine nasîn û zû belav bûne. Li gor bîr û baweriya Îbnî Sîna ku yek ji wan feylesofên Sedsala 11a ye, ji bo fêrbûna felsefeyê û bi taybetî jî ji bo têgihiştina felsefeya Arîstotalesî, divabû berhemên Farabî baş bihatana xwendin.

Di Serdema Navîn de, lêzedekirina Farabî ya herî zêde di warê nûkirina felsefeya siyasetê de pêk hatiye, ku ji dema pêşwext ya filehtiyê ve herdem bêxêr bûye û qels maye. Berhema herî girîng ya Farabî, bêguman 'Bajarê Xwedîerdem' e *(El-Medinetü'l-Fazıla)* ku bi îxtîmaleke mezin beriya mirina xwe di sala 950an de, temam kiriye. Wuha tê fikirîn ku Farabî ramanên xwe yên ku di berhema xwe ya navdar de aniye zimên, di sala 949an de li Misrê berfireh kiriye û piştre jî, li Şamê temam kiriye. Ev berhema wî, meriv dikare bibêje ku ji bo berhemên wî yên din jî bûye mîna lokomotîfekî û ku berhemên wî yên berê jî, di nava xwe de diguncîne. Berhema wî ya 'Bajarê Xwedîerdem', seranser metneke felsefî ye û felsefeya wî, bi temamî vedibêje. Tiştê ku em li vir dibêjin lêzedekirina wî ya felsefî ye, wate ne dubarekirina argumanên felsefî yên berê ne.

Di vê berhema xwe de Farabî, bi awayekî piratîk felsefe dike û ramanên xwe yên li ser siyasetê analîz dike. Di destpêka kitêbê de Farabî hewl dide ku form, avahî û fonksiyonên dinyayê ku mirov

bi xwe jî perçeyeke wê ne û dixwazin ku têde xwe bigihînin bextewarî û bêhempatiyê, şirove bike. Balkêş e, Farabî di tu dera berhema xwe de balê nakşîne yan nade ser azadiyê û ji azadiya mirovî tu carî gumanê nake. Di berhemê de tê gotin ku meriv ne bi rêya veguhastina serboriyên bav û bapirên xwe, lêbelê bi keda xwe digihêjin bêhempatiyê. Bêhempatiya mirovî jî, encax bi rêya avakirina bajarê xwedîerdem û bi rêya civakeke siyasî ya ku bi awayekî bêgav rê li berdewamiya bajêr vedike dikare pêk were. Ji bo bextewarî û ewledariya mirovan, pêdivî bi gellek tiştên ku ew bi xwe nikarin çêkin yan jî hilberînin heye. Lewre heke mirov bi mirovên din re hevkariyê nekin û nekevin hewldana pevxebatekê *(civakitî)* nikarin xwe bigihînin armancên xwe.

Farabî li gor mezinahiya xwe, behsa sê formên civakên îdeal *(medîne)* dike; civaka mezin, navînî û biçûk. Civaka herî mezin *(têrxelk),* yekîtiya hemû niştecîyên cîhanê ye, ya navînî tekabûlê miletan *(ummet)* dike û ya biçûk jî, bajar e. Civakên ku li vir nehatine nasandin gund, tax, cirantî û mal *(xanî)* in. Gund û tax, bi saya bajêr hene. Farabî têkiliya bajêr û gundan, bi xizmeta ku tê raberkirin şirove kiriye. Ligel vê yekê tax, perçeyekê bajêr e û bi bajêr re di nav têkiliyê de ye. Cirantî jî, perçeyeke taxê ye û mal jî, perçeyeke cirantiyê ye. Ligel vê yekê bajêr perçeyeke axa ku milet xwediyê wê ye, ye û milet jî, perçeyeke tevahiya mirovahiyê ye. Farabî, li ser vê mijarê wekî feylesofên yewnan yên dewra klasîk *(Platon, Arîstotales)* nafikire, lewre e wan bajarê îdeal, bi sînorên 'polîsê' bi sînor kirine.

Çavdêriya Farabî ya tecrubeya dîrokî wate Împaratoriya Îskenderê Duqiloç, Împaratoriya Romayê, Împaratoriya Pers-Sasanî û Halifetiya Ereb, wî ber bi formên ji 'polîs' mestir ve daf daye. Farabî gerdûnîtiyê, ango ji bo ku bikaribe bextewariyê derbixe asta herî bilind, civakekê 'panhumanîst' pêşnûma kiriye û di vê mijarê de jî, meriv dikare bibêje ku feylesofê yekemîn e. Li gor baweriya Farabî, meriv encax bi rêya bajêr yan jî 'efdal hayra' dikare

bigihêje başiyê, neku li kom yan jî civakekê din. Bajarê îdeal, ew bajar e ku ji bo bextewariya xwe, meriv tevde ligel hev dixebitin. Neteweyê herî baş jî, ew netewe ye ku ji bo bextewariya hemû bajaran kar dike ye. Hasilê, meriv dikare bibêje dewleta îdeal ya Farabî, di wê demê de ne pêdiviyeke rasyonel bûye, lêbelê mîna dewleteke îdeal ya gerdûnî hatiye pêşnûmakirin, ku hemû netewe ji bo wê dewleta gerdûnî di pevxebatekê de ne. Farabî ji bo ku teoriya xwe tequz bike, bajarê îdeal dişibîne laşê mirovî. Livokên laşê mirovî jî, heryek xwediyê wesf û nirxekê cihê ne û bi awayekî hiyerarşîk hatiye afirandin. Meriv dikare heman hiyerarşiyê, li bajêr jî peyda bike. Meriv ji zayîna xwe ve, ji hev cuda ne, cihêreng in û di civakê de jî heryek ji bo wezîfeyeke cihê hatiye wezîfedarkirin. Helbet, ji hêla îmkan û derfetan ve jî cihê ne, wate ne wekehev in.

Çawa ku dil, xal û navenda herî girîng ya laşê mirovî be, bajar jî ew malik û serek e ku hemû erdeman di xwe de dicivîne. Wate, kesê ku di nav bajêr de, bandêra bajêr û xweşhaliyê diparêze, serekê bajêr e. Herweha, dîsa berpirsiyar û wezîfeya wî ye ku mirovan li gor behremendiya wan wezîfedar bike û ji tevlihevî û nearamiya bajêr jî, dîsa ew berpirsiyar e. Herkes, li gor pile *(tebeqeya civakî)* û behremendiya xwe karekî pêk tîne û herkes nikare bibe serekê bajêr. Ji bo bidestxistina vê saziyê *(serokatiya bajêr)* du şertên serke hene: ya yekemîn divê meriv xwediyê xuyeke baş be û ya din jî divê perwerdehiya ku pêdivî pê heye girtibe. Bi saya vê perwerdehiyê, serekê civakê dikare wesfên xwe û îradeya xwe xurtir bike, lêbelê ji bo vê yekê jî divê ku ew miroveke guncan be bo vê wezîfeyê.

Pirraniya mirovan meyldarê xizmetkirinê ne, ne rêveberiyê. Zanînî *(zanayî, zanyarî)* ji bo bidestxistina serokatiya bajêr, şerteke jêneger e. Ji bilî vê yekê, divê serekê bajêr behremend û xetîbeke baş be jî û ji bo pêdiviyên şer jî, divê xwediyê binyateka zexim û berxwedar be. Farabî, di cîhana xewn û xeyalan de najî, lewre ew bi xwe jî

dibêje ku pirr zor e ku meriv bikaribe mirovên ku xwediyê wesfên serekê bajêr in peyda bike. Ji ber vê çendê jî, dibêje kesên ku kêm zêde xwediyê wan wesfên sereke ne, ew jî dikarin bibin serekê bajêr yan jî lîjneyek hevpar jî dikare di şûna serekê bajêr de, karê serekê bajêr pêk bîne. Ligel bajêrên xwedîerdem û nêzîkî wan, bajarên nelirê jî hene; bajarên dijber û berçewt. Ev bajêr, bajarên nezan in, li dijî fermanên Xwedê radibin *(fasik in),* hatine guhêrtin û şaşwaz in. Bajarê nezan, ew bajêr e ku şêniyên wî bajarî nenasê bextewariyê ne. Bajarê ku dejenere bûye *(fasik)* berê mîna bajarê xwedîerdem bûye, lê piştre bûye dijberê bajarê xwedîerdem.

Farabî têkiliya felsefe û olê jî, di çerçoveya dewletê de dinirxîne. Kesên ku alikariya mentiqê û nîşandana delîlan hemû tiştan fam dikin, ew feylesof in. Xêra têgihiştina wan jî, digihêje der û dora wan û ji xwe feylesof jî, rastiyê vediguhezînin xelkê xwe. Li milê din, mirovên din jî bi rêya mimesîsê *(teqlîdê)* zanîniyên ku pêdiviya wan pê heye, bi dest dixin. Her du rêbaz jî, formên zanistî ne, lêbelê zanyariya feylesofan bêşik ji yên din rasertir e. Li gor vê rewşê bajar û neteweyên ku ji olên cuda ne, ji ber ku li dû armanceke hevpar dimeşin, dikarin bi awayekî serbixwe hebin. Hemû bajarên ku hene, bi rêya bidestxistina zanîniyên ku bi rê û rêbazên mantiqî û nîşandana delîlan têne avakirin. Lewre jî ji arguman û fikrên cihê yên ku xwe dispêrin deranên çewt re, cih tune. Her ramana cihêreng, divabû encama ravekirineke çewt bûya. Lêbelê, li cem kesên ku zanistê bi rêya sembolan bi dest dixin, rewş cihê ye. Di vê rewşê de dibe ku hinek ramanên cihêreng û dubendî, derbikevin holê.

Farabî di rêveberiya gel de bikaranîna olê *(dîn),* bi awayekî pirr dijwar rexne dike û vê yekê, bi eşkerayî jî dibêje. Berhema Farabî ya Bajarê Xwedîerdem *(El-Medinetü'l-Fazıla)* yek ji wan berhemên girîng a dîroka çanda serdema navîn e û di warê felsefeya siyasetê de jî, berhemeke hêja û sembolîk e. Meriv dikare bibêje ku piştî berhema Augustinusî (354-430) ya Dewleta Xwedê, berhema

Farabî ya Bajarê Xwedîerdem jî girîngtirîn berhem e. Herçuqasî di kitêba Farabî de mijarên metafizîk, felsefeya xwezayê û psîkolojiyê jî cih bigrin jî, Farabî wan zanîniyan ji bo bingehkirina felsefeya xwe ya siyasetê ya paratîkî û ehlaqê vedibêje. Ji bo vê yekê jî, çerçoveyeke mantiqî ava dike. Li gor baweriya Farabî bajêr, perçeyekê gerdûnê/dinyayê ye û beşdarê fonksiyon û avahiya wê ye. Beriya Farabî jî, hinekan li ser vê mijarê kar kiribûn, xwe ceribandibûn; lêbelê ev rahişmendiya wî, bûye rênîşanderê dîroka ramanî. Berhema wî ya Bajarê Xwedîerdem, demekê dirêj bandûrê li ramana siyasî ya ereb û cihû kiriye. Wekî gelek berhemên feylesofên ereb yên serdema navîn, kitêba Farabî ya Bajarê Xwedîerdem jî li latînî nehatiye wergerandin. Ligel vê yekê jî gelek ramanên Farabî yên felsefî û siyasî, bi rêya wergerên kitêbên Îbnî Ruşd û Îbn Meymun, li Ewropayê xweş belav bûne. Di berhema Farabî de du xalên girîng hene, ku di dema me de jî girîngiya wan berdewam dike, ku ew jî ev in: Ya yekemîn, di çerçoveya dewletê de têkiliya dîn û siyasetê û ya din jî, destnîşankirina pêdiviya avakarina dewleteke cîhanî ye. Li cem Farabî felsefe, ji bo ku meriv çêtir pê têdigihêje rastiyê yan jî rasteqîniyê, ji ol watedartir e. Ol, ji bo têgihiştina gel bi awayekî sade vegotina yek heqîqetekî û rahişmendiyek bi vî rengî ye.

Di encamê de, heta ku bi awayekî çewt rasteqîniyan venebêjin, hemû ol watedar, girîng û rêzbar in. Bêguman, heke ew ji rastiya *(rasteqîniya)* mantiq û felsefeyê dûr bikevin û rasteqîniyê bi awayekî çewt dahûrînin, dê talûkedar bin. Ev angaştên Farabî, herçuqasî ji aliyê teologan ve bi hemd hatibe dîtin û bi senkretîzma olî hatibe tawanbarkirin jî, ji bo dema xwe berhemeke feydedar e û ji bo dema me jî berhemeke aktuel e, ku girîngiya xwe hêjî wenda nekiriye û bûye sebeb *(çavkaniya)* xweşdîtinê. Farabî, di civakekê piretnîsîte de jiyaye û ew bi xwe ne ereb bû. Bêguman wî baş dizanibû ku ol ji aliyê siyasetmedar û serekên olî ve, ji bo berhêlîkirina gel bi awayekî çewt dihate ravekirin. Li gor baweriya wî; gelên ku ji dewra dewletên polîsê yên antîk yewnanê derbas

bûne û xwe gihandine împaratoriyên mezin yên cîhanê, heta ku xwe ji rikberî û çavnebariya olan xilas nekin, ne pêkan e ku ligel hev aşt bin û bi aramî bijîn.

**Georgios Steris**

(Dersdarê Beşa Felsefeyê ya Zaningeha Atînayê, National and Kapodistrian University of Athens) Çavkanî: Kovara 'Sabah Ülkesi', Hejmar 43. 2015

**Werger: Ali Gurdilî**

felsefevan@hotmail.com

**02.01.2016**

## **Felsefe Fikirîna Pirhêlî Ye**

Di jiyana mirovan de du hêl hene ku divê werin têrkirin. Jê yek hêla mirovî ya fizîkî ye ku ancax bi xwarin û vexwarinê dikare li ser piyan bimîne. Ya din jî hêla wî ya hişî/ruhî/derûnî ye ku ew jî ancax dikare bi veçirîna razên derheqê xweza, dinya û gerdûnê de xwe li ser piyan bigire. Bi ya min ji ber birçîbûna mirovî ya di hêla hişî û ruhî de, em neçar in ku alîkariyê ji felsefeyê werbigirin. Çimkî tenê felsefe dikare 'valahiya zanînê' ya di ruhê mirovî de piçek dagire.
Ji ber ku mirov wekî 'heyîyek alavçêker' hatiye binavkirin, bi alavên ku çêkiriye jiyana xwe ya rojane hêsantir kiriye, lê li hemberî mezinî û berfirehiya dinya û gerdûnê ji ber tunebûna zanayî û agahiyên têr û tije bi sed hezar salan bêçare maye. Bi şaşwaziyek bi tirs û xofê dagirtî li bûyer û dîmenên heyî nihêriye. Derfet û alavên di dest de têrnekiriye ku dinya û gerdûnê bi tevî hemû heyiyên tê de bi sedem û encamên xwe ve binase. Vê kêmderfetî û lawaziya di hêla zanayiyan de ew handanî çavdêrîkirin û ezmûnan kiriye û her ku çûye zanayiyên xwe zêdetir kiriye. Lê meraqa ku mirov diguvaşt, tu carî nehiştiye ku mirov bi ya bi dest xistî qîma xwe bîne.

Mirovî bi alîkariya felsefeyê di her dem û dewranê de xwestiye xwe bigihîne 'raza heqîqetê.' Kûr fikiriye, xwestiye 'sedema hebûnê' bizanibe, 'armanca jiyanê' fêhm bike. Mirovî bi gelek pirs û bersivan xwestiye wateyek bide jiyanê. Ji bo jiyanek hêj bextewartir, li rê û rêbazan geriyaye. Têkiliyên mirov û civakê yên bi desthilatiyên heyî re, di jêpirsînê re derbas kiriye. Lê felsefeyê bi qasî ku alîkariya mirovan kiriye ewqas jî di hiş û mejiyê mirovan de 'gumanên nû' afirandiye. Da ku mirov bi ya bi destxistî qîma xwe neîne û ji bo ya hêj sûdewertir û feydedartir bixebite. Ji ber van hemû hêlên felsefeyê ku me tim û tim ber bi nûjeniyê ve dehf dide, her dem pêwîstiya me bi wê hebûye. Çimkî felsefe di heman demê de 'fikirîna pirhêlî' ye. Ev fikirîna pirhêlî dike ku mirov xwe

ji gelş û gelemşeyên heyî bêyî xisarek mezin bibîne, xelas bike û riyên çareseriyê yên cur bi cur biafirîne. Bi saya felsefeyê dê mirov riya 'fikirîna azad' jî bi dest bixe. Bi saya 'fikirîna azad û pirhêlî' mirov dê hem civaka tê de dijî ber bi pêşveçûnê ve beralî bike, hem jî 'riya hezkirinê, xweşdîtinê û toleransê' bi mirovî bide nîşandan ku pêwîstiya civaka kurd bi van hestên mirovî heye.

Ji bo em xwe, civaka xwe, dîroka xwe, serkeftin û binkeftinên xwe di 'parzûnê aqil û zanînê' re derbas bikin, ji bo nifşên li dû me di siberojeke bi ewlehî de bi serbilindî bijîn, divê em bikevin nava kûrahiya zanînên felsefîk. Ta ji Zerdeştiyê Medî û Yewnana Antîk hetanî felsefevanên Serdema Nêz; fîlozofên ku derheqê dewlet û civak, ol û exlaq, kesayet û siyasetê de zanayî û ezmûnên xwe pêşkêşî me kirine, divê em fêrî zanînên wan bibin, ji wan dersan werbigirin da ku em wekî neteweyeka saf ya ku di her qadê de tê xapandin, her dewleta ku dixwaze neteweya me li gor berjewendiyên xwe bi kar bîne, bidin sekinandin. Ji bo em ji lîstikên li hemberî gelê me tê kirin re bibêjin 'êdî bes e' divê em felsefeyê bixwînin, binivîsin û pirtûkên felsefevanên biyanî jî wergerînin zimanê xwe.

Pêwîstiya me bi qasî nan û avê bi felsefeyê heye. Gelo rêveberek me yê ku hay ji felsefeya Platon û nêrînên wî yên derheqê 'rêvebirina dewlet û civakê' de tunebe, dê karibe xizmeta rêveberiyek baş pêk bîne? Gelo siyasetmedarên me yên li hemberî zordest û zulimkaran daw û doza mafê me yê neteweyî dikin, ger hay ji felsefeya Machiavelliyî ya pragmatîst tunebe, dê karibe li hemberî dek û dolabên wan yên xwedî ezmûnên hezar salî, bi ser bikevin û ji me re siberojeke wekî tîrêjên rojê ronî ava bikin? An kesê ku haya wî ji felsefeya Nietzscheyî tune be, dê çawa xwe ji astengiyên çêker yên li hemberî 'azadiya mirovî' hatiye danîn xelas bike? Dîsa kesê ku ji felsefeya Nietzscheyî bê hay be, 'ol û exlaqa' ku di vê serdema modern de di destê desthilatdarên mejîtêcir de bûye bêolîtî û bêexlaqî dê çawa nas bike, dê wê bêolîtî û bêexlaqiyê çawa rexne bike û ber bi mirovek kamilbûyî yê azad ve rê bikudîne?

Wekî encam; ji bo qabiliyeta me ya ‘şîrovekirina bûyeran’ bi pêş keve, ji bo em di her qad û babetê de bi ‘rexneya zanistî/avakar’ li bûyeran binihêrin divê em fêrî felsefeyê bin.

**Mahmut Ozçelîk**
25.02.2016

‘Giyan, mîna çav e. Dema wan bireserên ku bi rastî û ronahiyê dibiriqin dibîne, têdigihêje wan û wan fam dike. Lewra, wê demê bi aqil hatiye ronahîkirin. Belam, di şevereşa ku bûyîn û alozî têde desthilatdar e, bi tenê xwediyê baweriyekî ye. Li wê derê dinihêre û disekine. Carina dibe xwediyê wê baweriyê, carina jî dibe xwediyê baweriyeke din. Tu dibê qey, ne xwediyê aqil e.’
**(Platon| B.Z. 427-347)**

# **ZAYÎNA RAMANA AQLÎ**

*(Fîlozofên rojavayî yên beriya Sokrates, derheqê dinyayê de dozîneyên (teoriyên) gelek mezin afirandin. Herçuqasî gelek çewtî di wan dozîneyan de hebin jî, hinekên wan gelekî kûr in û bandûra wan heta roja me ya îroyîn jî berdewam kiriye.)*

Fîlozofên pêşîn di heman demê de, bi du awayan xwe ji awira rabirdûyê cihê kirin. Di desta yekem de beyî ku serî li ol, wehî, desthilatî yan kevneşopê bidin, bi riya aqilê xwe xwestin ku dinyayê fam bikin. Ev yek, bi serê xwe tenê rûdaneke nû bû û ji bo pêşveçûna mirovî jî, gaveka gelekî girîng bû. Fîlozofên pêşîn bi vê yekê, rê û rêbazên fikirîna aqlî jî fêrî mirovan kirin. Herweha, ew ne li bendê bûn ku şagirdên wan jî herdem fikrên wan biperjirînin û wekê wan bifikirin. Rêzê, ji fikrên cihêreng *(cuda)* re girtin û vê yekê fêrî şagirdên xwe jî kirin. Çimku, ew mamosteyên pêşîn bûn û nedixwestin ku ramanan wisa hazir û di nava qalibên naguhêr de, vebiguhezînin şagirdên xwe. Mamosteyên pêşîn, dixwestin ku şagirdên wan jî fikrên xwe bi serbestî bînin zimên, li dijî fikrên ku napejirînin rabin û bikevin guftegoyan.

Herdu pêşveçûnên ku di jiyana zêhna mirovî de hatin dîtin, bêguman girêdayî hev in û xwediyê wesfên şoreşgerî ne. Sebebê rûdana wan ya di heman demê de, ev yek e. Herdu pêşveçûnên ku wê demê hatine dîtin, bingeha tiştê ku em îro jêre dibêjin <*fikirîna zêhnî*> pêk tînin. Dema ku derketine holê, di zêhn û zanyariya mirovî de bûne sebebê berfirehbûneke gelekî mezin û nedîtî.

Fîlozofên ku xwediyê taybetmedî û terzê navborî bûn, *B.Z.* di sedsala 6an de li *Yewnana Kevnare* hatine dîtin. Di nav wan fîlzofan de, ***Thales*** wekî fîlozofê pêşîn tê dîtin. Thales, li bajarê Mîletosê hatiye dinyayê, ku Mîletos dikeve aliyê keviyên rojavayê ya Asyaya Biçûk û di nav sînorên Tirkiyeya îroyîn de ye. Thales û şopgerên wî, ji ber navê bajêr bi navê **<*Xwendegeha Mîletê*>** hatine

zanîn û nasîn. Roja zayîn û mirina Thalesî bi awayekî misoger neyê zanîn jî, em dizanin ku ji ber pêşbîniya xwe ya girtina rojê, di navbera salên *B.Z.585 û B.Z.580an* de, gelekî navdar bû û baş hatiye nasîn. Hêla herikana çemê <*Kizilirmakê*> guherandiye û wiha kiriye ku Kroîsosê qralê Lydîayê, bikaribe ji çem derbas bibe. Ango, yek ji wan endezyarên pêşîn bû jî.

**Tişt, ji çî çêbûne?**

Thalesî, herî zêde li ser pirsa ***<Dinya, ji çî çêbûye?>*** rawestiyaye. Li gor baweriya wî, divabû ku hemû tişt ji yek tiştekê der biçûna. Ev nêrîn, nêrîneke gelek nefambar û metelhişt *(şaşker)* e. Çimku, em îro bi rastiya wê dizanin. Hemû nesneyên madî, dikarin weke vejenê werin dîtin *(sepandin)*. Thalesî nikaribû bi vê yekê bizanibe, çimku wê demê zanista fizîkê ku riya vê yekê vekiriye, tunebû.

*(Dost û nasên Thalesî, ji ber xizaniya wî pirî caran tinazên xwe pê kirine. Ew jî radibe ji bo saleka din hemû presên zeytûnan kirê dike û di wextê zeytûna de jî, wan bi bihayekî baş dide bi kirê. Nexwe fîlozof neku nikarin pereyan qezenc bikin, ji ber ku bala wan li ser tiştên cihê ye; ew bala xwe nadin tiştên wiha.)*

Thales wiha fikiriye ku hemû tişt, bi awayên cihêreng ji avê çêbûne. Wî dîtibû ku av di pergaleka gelek sar de, dibû kevir *(cemed)* û di pergaleka pirr germ de jî, dibû hewa *(dûkel)*. Her wextê ku baran dibariya, ji axê giya *(dirext)* hêşîn dibûn. Nexwe dirext jî, lewnekê cihêreng ê avê bûn. Pêdiviya her cure zindiyan, bi berdewamî û bi awayekî jêneger, bi avê hebû. *(Em îro dizanin ku pirraniya laşê me, ji avê pêk hatiye.)* Ji ber vê yekê jî Thales wiha fikiriye ku ser rûyê erdê, di nava avê de dilive. Nexwe, ser rûyê erdê ji avê der çûye û ji avê pêk hatiye.

Fîlozofê ***Anaksîmandros (B.Z.610-546)***, li ***Mîletosê*** hatiye dinyayê û şagirdekî Thales e. Anaksîmandros jî, hinek zanayiyên din li ser teoriya Thales zêde kiriye. Li gor baweriya

Anaksîmandros jî, heke ser rûyê erdê bi saya avê hebe, nexwe divê av jî bi saya tiştekê din hebe û ev rewş, heta hetayê wiha berdewam dike. Di vê rewşê de, bi awayekî mantiqî mirov dikare heta hetayê jî here rabirdûyê. Kesê ku cara yekemîn nexşeya dinyaya me çêkiriye û gotiye ku dinya, xwe naspêre ti tiştan û wiha xwe bi xwe li hewayê ye, ***Anaksîmandrosî*** ye. Ligel vê vedîtina girîng jî, mirovan demekê dirêj wisa bawer kirine ku dinya ripîrast e.

Anaksîmandros vê pirsgirêkê, bi ramaneka metelhişt çareser kir. Dinyaya me, bi tiştekê ve ne girêdayî bû. Ser rûyê erdê, nesneyeka hişk e û di valahiyê de daliqandiye. Anaksîmanros wiha fikiriye ku em li ser zemîneke rast in û ji ber vê yekê jî, gotiye ku dinya *(ser rûyê erdê)* mîna diskeke pehn e. Û wiha pêde çûye: *<Dinya, li hewayê bi tiştekê ve ne girêdayî ye û ji hemû tiştan, bi dûrahiyên wekhev dûr e û ji ber vê yekê jî, di ciyê xwe de wiha rawestî (sekinî) dimîne. Lewnê dinyayê, dişibe bîdonekê û dema ku em li ser rûyê aliyêkê bi rê ve diçin, rûyê din li aliyê din dimîne.>*

Ligel vê yekê, Anaksîmenesê şagirdê Anaksîmandros, baweriya xwe zêde bi teoriya mamosteyê xwe neaniye.
Li gor bîr û baweriya Anaksîmenes jî: Beroşeka devgirtî piştî ku ava wê baş dikele, devgirtek bi hêza dûkelê radibe hewayê. Ser rûyê erdê jî, mîna wê devgirtekê bi saya hêza rakirina hewayê, li hewayê dimîne. Di vê xalê de divê mirov bibêje ku bandûra felsefeya Anaksîmenes, ji ya Anaksîmandros zêdetir bûye û di nav gel û fîlozofan de jî, cihekî wî ê taybet hebûye. Lewma jî, ji layê nifşên nû ve wekî fîlozofekî serdestpêk hatiye dîtin û pejirandin.

Bûyerên bi vî rengî, di dîroka felsefeyê de herdem hatine dîtin. Çimku berê felsefeyê, wekî xeteka rast herdem ne li pêş e. Gavên xwe, carinan berepaş avêtiye û carinan jî berepêş avêtiye û bi vî awayî bi pêş ketiye.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com

**12.10.2014**

**jêder**

**1-** Destpêka Felsefeyê. Ali Gurdilî. Weşanên Soran. 2015
**2-** Profesor Bryan Magee. Kurteçîroka Felsefeyê. Weş. Dost.
**3-** Antolojiya Feylesofan. Ali Gurdilî. Weşanên Soran. 2015
**4-** www.felsefevan.org
**5-** Dîroka Felsefeyê. Ali Gurdilî. Xebateke Çapnebûyî.

‘Mirov divê ne ji bo armancên pratîk, lêbelê ji bo armancên teorîk li bersiva pirsên xwe bigerin. Ango zanayî, ji bo zanayiyê. Lê mixabin, ji ber ku di nav kurdan de xwendin kêm e, meyl û bala me jî ne li ser felsefeyê û ramana teorîk e. Kê dizane, belkî wextekê me ê vala tune ji bo felsefeyê?’

**(Ali Gurdilî)**

## Felsefe û Civak

Di bingehê çêbûna mirov de gelek xerîze hene, girîngtirîn xerîze jî ew e lêgerîna rastiyê ye, ya ku ne diweste û ti carî jî nasekine, mirov her tim birçiyê zanebûnê ye lewma li zanistan digere yek ji wan zanistan felsefe ye ku dibe bersiva gelek pirsên di mejiyê mirov de digerin wekî pirsên: Çawaniya çêbûna mirovan, Destpêka avabûna cîhanê her wuha bidawîbûna wê, Rastî û çewtiya hebûna firîşte û giyanan, Sedemên kêfxweşî û xemgîniya mirov û hwd.

Wekî em dizanin her yek ji me her û her tim di nav hewildanên bidestxistina bersivên wan pirsan e lewre jî gava bersivan nabîne xwe bi Efsaneyan dide qebûlkirin, lê ya rast zanista ku me bigihîne bersivên dirust û birçîbûnê têr bike felsefe ye.

***Rola felsefeyê ya mezin di jiyana mirov de û di gelek astan de heye:***

***- Asta takekesî (ferdî):***

***1-*** *Fêrbûna zanistan mejiyê zarok di hemî astên mezinbûna wan de ji dema xwendina seretayî derbasî ya zaningehî dibe, ramanên wan fireh û bi pêş dixe.*

***2-*** *Dihêle ferd bibe xwediyê çandeke zanistî û felsefî ku êdî dikare xwe îfade bike û analîzkirina buyerên li derdora wî diqewimin û rexnekirina wan.*

***- Asta civakî:***

***1-*** *Felsefe nirxên rêxistina civakî, ku di jiyana civakî de serdest in diyar dike.*

***2-*** *Hêza guhertina civakê di ferd de diçîne ji ber her guherînek li ser bingehê felsefeyê ava dibe.*

***- Asta mirovbûnê ango mirovbûna mirov:***

***1-*** *Vekirina çavên mirov li ser çanda felsefî û danûstandina bi wê re,hînkirina hişmendiya nirxên mafên mirov her wuha baweriya bi nirxên bilind, lixwekirin û parastina wan wekî (azadî, edalet û maf).*

***2-*** *Nasandin bi şerê çandî, psikolojî û îdeolojî yê di cîhanê de belavbûyî û pêşwazîkirina wî şerî bi awayekî erênî.*

*Di encamê de em dikarin bibêjin pêdiviya me herî pir bi felsefeyê heye ji ber mirovbûna mirov bêyî perwerdeyê ava nabe. Girîngiya perwerdekirinê ji girîngiya felsefeyê ye her wuha girîngiya felsefeyê jî ji girîngiya perwerdekirinê ye.*

**Najbeer AL Shekh**
19.02.2016

‘Ji ber ku ez dizanim ez bi tiştekî nizanim, ez ji mirovên din baqiltir im. Em çiqasî zana bin, dê em ê hewçend jî azad bijîn. Hêşînahî, kêmasiyên axê û zimanê şîrîn jî, kêmasiyên mirov vedişêre.’
**(Sokrates| B.Z.469-399)**

# <u>BERGSON Û FELSEFEYA FRANSÎ YA DEWRA DAWÎ</u>

## *Felsefeya Mîna Şaxê Edebiyatê*

*Di Sedsala 20an de li Fransayê felsefe; bala xwe zêde nedaye zanist, mantiq û dahûranan û weke perçeyekê çanda giştî, berfireh bûye.*

Henri Bergson, di navbera salên *(1859-1941)*an de, li Parîsê ji dayîk bûye. Bavê wî, cihûyekî polanî û diya wî jî, jinekê îngîlîz e. Zimanê wî ê dayîkê, fransî ye. Li zaningehê, mamostetiya felsefeyê kiriye. Lê li derveyê zaningehê jî, ji layê gelek însanan ve hatiye şopandin û gelekî bala însanan kişandiye. Di sala 1927an de, ***Xelata Nobelê*** sitandiye. <*Time and Free Will 1889 (Daneyên Rasterast Yên Şiûrê), Matter and Memory 1896 (Made û Hiş) û Creative Evolution 1907 (Tekamûla Afirandêr)*> berhemên wî yên navdar in.

Di kalîtiya xwe de, ketiye bin bandûra ol. Nêzîkê ku dê bimire, *Dêra Katolîk* endametiya wî qebûl kiriye. Tê gotin ku di vê yekê de, ramanên wî yên dawî roleka mezin leyîstîne. Heke wiha be, nexwe ev biryar bi awayekî taybet hatiye veşartin û bi derengî hatiye girtin. Çimku wê demê, Fransa ji aliyê Almanyayê ve hatibû vegirtin û Fransa, di bin zordestiya *Naziyan* de bû. Ji ber vê yekê jî, dibe ku Bergson nexwestibe dilê cihûyên ku di bin zilma Naziyan de bûn, ji xwe bihêle. Di dema Şerê Cîhanê ya Yekemîn de, li Amerîkayê wezîfeya dîplomatiyê kiriye. Dema ku di sala 1920an de rêxistina Neteweyên Yekbûyî ava dibe, di wê cemiyetê de dibe serekê Komîsyona *(Desteya)* Hevkariya Ramanî.

### Di Ramanên Henri Bergsonî de Feraset

Henri Bergson, girîngiyeke mezin daye ewrîm *(peresanê)* û wiha fikiriye, ku mirov li gor peresanê divê werin şirovekirin û zanîn. Erk û wezîfeya livokên organîzmayê yên sehekî ji roja ewilî ve, hişyarkirina berteka ye. Ev bertek jî, bi kêrî parastina jiyanê têtin. Ewilî livokên me yên sehekî, piştra jî sîstema tûreyê *(sînîrê)* ya navendî û dûvre jî zêhn, bi demê re berfireh bûne. Herweha, bûne alavên girîng û alîkariya parastina organîzmayê kirine.

Heta mirov dikare bibêje, ku alîkariya tevgerên mirovan jî dikin û li ser wan, xwedîbandûr in. Tiştên ku îro jî ew didine me, ne wêneyekê nesnel *(neterefgir)* ya tiştên ku li hawirdor in. Tiştên ku ew didine me, peyam in û tevgerên me, bi riya wan peyaman têne berhêlîkirin. Çimku têgihiştina me ya hawirdorî, naşibe fotografên hûrgilî. Beravajiya wê têgihiştina me herdem vebijêr, pragmatîst û kêrhatî ye. Em bi tenê, bala xwe didin tiştên ku ji bo me girîng in û derheqê hawirdora xwe de jî, li gor berjewendiyên xwe ramanan diafirînin *(pêktînin)*. Têgihiştina vê yekê, têgihiştina xwezaya rasteqîn ya zanayiya mirovî ye. Derheqê peresanê de jî; Bergson wiha bawer kiriye, ku hilbijartinên serberdayî yên pêvajoyên mekanîk; têra şirovekirina *(zelalkirina)* bûyerên ku diqewimin nakin. Herçuqasî ev yek bêtir werin wateya zêdebûna şikestin û xeteriyan jî; hêla peresanê di bin bandûrekê de, ber bi ferdîtî û tevlîhevîyekê ve ye. Bersgon, ji wê bandûrê *(hêze)* re dibêje ***<Hêza jiyanê–Elan vital>.*** Ji ber ku hemû tişt bi awayekî bêrawest diguherin, Bergsonî wiha bawer dike ku ***herikana demê*** bingeha hemû rasteqîniya ye.

Têgihiştin û vejiyîna vê herîkanê jî, bi saya sehek û têgahan pêk nayê. Berevajiya wê, em wê herikanê rasterast di dilê *(hundirê)* xwe de hîsdikin. Bergson navê vê têgihiştina rasterast, datîne feraset *(pêhesî)*. Herweha wisa bawer dike ku biryar û tevgerên me jî, ji hêla feaseta *(pêhesiya)* me ve têne berhelîkirin û destnîşankirin. Lewma jî, mirov xwediyê îradeyeke azad *(serbest)* in. Belam ev zanayiya rasterast *(yekser)* ya ku di derheqê xwezaya hundirîn ya nesneyan de ye; ji hêla çawaniyê ve, ji wê zanayiya ku em wê bi saya zêhna xwe bi dest dixin cuda ye.

**Rasteqînî, herikaneke bêrawest e.**

Ji bo pêkhatin û nîşandana tevgeran, pêdiviya me bi hinek malzemeyan *(kelûmelan)* heye û em, wan bi saya zêhna xwe bi dest dixin. Herwiha, em wisa dixwazin ku di pêş de bi wan bizanibin û bila ew di bin venêrana me de bin. Tiştê ku zêhna me bi vê yekê

dide me, cîhaneke perçebûyî ye. Ev yek, cîhana kar û barên rojane ye. Cîhana jiyana ekonomîk, aqlê selîm û di heman demê de, cîhana zanistî ye.

*'Heke em dema niha, mîna siberojê bibînin û wisa bifikirin, ew hê pêk nehatiye. Lê wextê ku em dema niha mîna ya ku heye bifikirin; ew jî, ji zû ve derbas bûye.'*
***(Henri Bergson)***

Em dikarin feydeya wê ya bêhempa a ku dide me, di serfiraziya *(serkewtina)* teknolojiya nûjen de bibînin. Belam teknolojî bi temamî, hilbera terzê *(şêweya)* têkiliya me ya bi cîhanê re ye. Û ji hêla sedem û rêbazên xwe ve, dişibe peyjazeka zindî ya ku nexşesazek wê bi xetên ziwa yên geometrîk xêz dike. Guman têde nîne, ku feydeyeka mezin ya teknolojiyê heye. Lewra, rê û derfetan dide pêkhatina daxwazên me. Rasteqînî, domdar *(sereqet)* e. Di dema rasteqîn de, kêlî tune nin. Dema rasteqîn, herdem di rewşa herikanê de ye û tu yekîneyên wê, yên ku bi pîvangên dirêjahiyê têne destnîşankirin jî tune nin. Heman rewş, ji bo wargehê *(mekanê)* jî derbasdar e. Di wargehên rasteqîn de, niqte *(xal)* û cihên celebîn, tune nin. Ew hemû jî, xapên aqil in.

**Heyîn û Dem**

Ji ber vê yekê jî, di heman demê de em li du *(2)* dinyayan *(cîhanan)* dijîn. Di cîhana hundirîn ya zanayiyên me yên rasterast *(yekser)* de, hemû tişt domdar in. Hemû tişt, diherikin. Herikanek domdar heye. Tiştê ku di cîhana me ya der de zêhma me dide me, nesneyên *(bireserên)* cihêreng in; ku ew jî li wargehên cihê, pozîsyonên *(derawên)* kifş *(eşkere)* vegirtine. Belam, dema der *(ango dema ku bi seetan tê pîvan yan hesabkirin)* ya ku avahiyeke demî ye; xwiya ye ku ji wê dema <*rasteqîn*> a ku em dizanin di cîhana me ya hundirîn de bi şêwazeke domdar diherike, cihê ye.
Bergson, wê dema rasteqîn ya ku herdem diherike û em wê herdem di hundirê xwe de hîs dikin, mîna ***zanavê jiyanê*** û ***zanavê***

***hêza jiyanê*** ya ku bi awayekî bêrawest pêvajoya peresanê berepêş dehf dide ***(êlan vital)*** dibîne. Beyî ku haya wan ji hevdu hebe, ***Bergson*** û ***Heidegger*** gihêjtine heman encamê. Lê di felsefeya ***Heidegger*** de heyîn û dem, weke zanavên hevdu hatine dîtin.

*'Herikana robarê herçuqas ji bêgaviyê li gor hêla herkê be jî, ji avroya robarê cihêreng e.'* ***(Henri Bergson)***

Henri Bergson di dema xwe de, ji aliyê hemdemên xwe ve; bi taybetî jî ji aliyê ***Bertnard Russelî*** ve hatiye rexnekirin.

***Rexneyên ku li Bergsonî hatibûn girtin jî ev bûn:*** <*Wî ramanên xwe bi awayekî helbestîkî û şibandinên zindî herçuqasî baş anibe zimên jî, ew ji hêla delîlên aqilane ve qels in.*> Dîsa hatiye gotin ku ramanên wî, ji bo dahûranên mantiqî ne guncan in û bi kêrî dahûranên mantiqî nayên.

Piştgir û aligirên wî jî gotine ku <*ramanên wî ji dahûrandinên mantiqî zêdetir, lênerînên (dahûranên) derûnî ne û ew, nivîskarekî afirandêr û xwedîwesf e.*> Ji herdu rewşan jî baş xwiya ye ku mirovên wê demê, gelekî bala xwe dane ramanên Bergsonî û meriv dikare bibêje ku ew wekî fîlozofekî girîng, hatiye dîtin.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
**05.10.2014**

**Jêder**

**1-** Antolojiya Feylesofan. Ali Gurdilî. Weşanên Soran. 2015.
**2-** Profesor Bryan Magee. Kurteçîroka Felsefeyê. Weş. Dost.
**3-** Destpêka Felsefeyê. Ali Gurdilî. Weşanên Soran. 2015.
**4-** www.felsefevan.org
**5-** Dîroka Felsefeyê. Ali Gurdilî. Xebateke Çapnebûyî.

## Hevpeyvîn bi Têmûrê Xelîl re

'Dilê germ, serê sar…' ji aliyê pêkanîna zimanê kurmancî da çîroka here biserketî ye. Ji alî ziman da mirov dikare bibêje çîrokeke bêqusûr e. Taswîrên wî pir biserketî, hevokên wî lihevhatî, kurdiya wî zelal û xweş e. Babeta çîroka wî gelek zor e. Lewra ew taswîrî deşt û çiya, çem û kaniya, ken û girî nake. Wî dest avêtîye psîkolojiyê. Ew bi wê çîrokê evîna şikestî, ruhciwantiyê vedike, ruh û hîs û pejnên xortekî evîndar dike. Di wî karî da Têmûrê Xelîl nivîskarekî gelek pêşketî ye. Em ji wî berhemên nû hêvî dikin.'

**Mazhar Kara - Hejmara 101ê ya Kovara 'Roja Nû'**

***Ali Gurdilî:*** *Kek Têmûrê Xelîl, li ser navê xwe û xwînerên malpera www.felsefevan.org ê ez gelekî spasiya te dikim, ku te daxwaza me ya vê hevpeyvînê qebûl kir û vê îmkanê da me. Spas.*

**Têmûrê Xelîl:** Ez jî sipas dikim, ku bersîva pirsên malpereke kurdî, malpereke bi naverokê dagirtî, malpereke welatparêz didim.

***Ali Gurdilî:*** *Di destpêkê de jiber avakirina malpera we ya http://riataza.com/ ê ku beriya demekê dest bi weşanê kir, ez we pîroz dikim û di karên we de serkeftinê dixwazim. Kek Têmûr ji kerema xwe re tu dikarî derheqê malperê de hinek agahdariyan bidî me? Yanî malpera we çi demê dest bi weşanê kir, naverok û armanca we ya sereke çi ye? Bi çend zimanan malper weşanê dike? Pirsa herî dawî jî, têkiliya malpera http://riataza.com/ ê bi rojnameya 'Rya teze' heye gelo yanê na?*

**Têmûrê Xelîl:** Sipas. Malpera me di meha gulana sala par da bi vêrsyona rûsî wek test dest bi karê xwe kir, piştî 2-3 mehan me dest bi vêrsyona kurdî jî kir. Naverok û armanca wê ew e, ku kevirekî dayne ser kevirê şênbûna zimanê me, dîroka me, welatê me. Navbenda malperê li bajarê Moskvayê ye, lê karê wê li tevaya

Kurdistanê, heta tevaya cihanê ye jî, bi şertê ku bûyerên li cihanê diqewimin, fikirên ku li cihanê têne gotin alî miletê me û welatê me bikin. Malpera me bi du zimanan weşanê dike: kurdî û rûsî. Em hewil didin nivîsên bi hemû zaravayên kurdî, ser hemû warên ku kurd lê dimînin biweşînin. Têkilîya me bi rojnameya 'Rya teze' ra tune, her tenê sîmvolek e bona ew navê pîroz herdem di guhê her kurdekî da bike zingîn û zindî bimîne.

***Ali Gurdilî:*** *Kek Têmûr, aliyekî te ê çîroknûsiyê jî heye, lê tu zêdetir bi xebatên xwe yên zanyarî yên li ser kurdî û Kurdistanê têyî naskirin. Te wext peyda nekir ku tu zêdetir bala xwe bidî wêjeyê yan ev hilbijartineke ji bêgaviyê bû? Û a niha xebateke wêjeyî di destê te de heye yan?*

**Têmûrê Xelîl:** Ez heta niha jî xwe nivîskar nahesibînim. Karê min yê sereke rojnamevanî ye, karê min daye ber xwe jî ew e, ku hemû pirtûkên kurdzan û rohilatzanan yên ku bi rûsî û ermenî derketine, wergerînim kurdî û bigihînime gelê xwe. Di wî alî da min 17 pirtûk wergerandine, ji wana 8 derketine.
Ma ne heyf e, ku kurdzanên Sovyeta berê bi salan bi profesyonalî, rojê bi kêmanî 8 siet derê karê xwe vekirine, ser pirsên dîrok, ziman, êtnografî û h.w.d kar kirine, ji bo xatirê karê xwe bi serketî pêk bînin gelek ji wan bi taybet zimanên erebî, farisî, tirkî fêr bûne, ku bikaribin arşîvên ser kurdan û Kurdistanê bi kar bînin û ew hemû kar negihîje gelê me? Karê din, ku min daye ber xwe ew e, ku hemû berhemên folklorî yên ku cem me bi kirîlî û latînîya kurdên Sovyet derketine, bikim latînîya Hawarê û bigihînime gelê me. Ez wî karî bi du keçên xwe ra dikim, heta niha ji wana 9 heb derketine, 12 jî wê derkevin.

***Ali Gurdilî:*** *Cenabê te yek ji wan endamên Koma 'Kurmancî' ya Înstîtûya Kurdî a Parîsê ye. Ji kerema xwe tu dikarî behsa xebatên koma we bikî? Ev çend sal in ku koma we dicive û we çi encaman bi dest xistin? Pirsa din jî, Înstîtuya Kurdî ya Parîsê, beriya demekê di tengasiya diravî de bû. Gelo ew mesele çareser bû yan hêjî didome? Dîsa li gor bîr û*

*baweriya te, saziyeke alîneger û xweser ya wekî Înstîtûya Parîsê, çima dikeve wan tengasiyan?*

**Têmûrê Xelîl:** Bersîva vê pirsê wê pir dirêj be. Bi kurtî bêjim: eger weke 15 kesên xwedî zanebûnên zêdeyî 15 zimanan, di salê da du caran, her carê 10 rojan, her rojê 12-14 sietan ser pirsgirêkên zimanê kurdî kar dikin, li ser gotineke kurdî heta sietekê jî minaqeşe dikin, tê wê maneyê ku karekî pîroz dikin. Berhemên civînên me di 56 hejmarên rojnameya ‘Kurmancî’ da xuya dibin, ku 40 hejmarên wê bi pirtûkeke zêdeyî 1200 rûpelî va çap bûye. Ser meseleya tengasiya diravî da tenê zanim, ku rewşa Înstîtuyê niha hinekî baştir bûye û hêvî heye ku wê hîn baştir be. Înstîtûya Kurdî ji bo miletê me ye û xwedîyê wê jî miletê me ye û xwedîlêderketî jî gerekê miletê me be. Lê kurd dema diçine şahîya bûk û zavê, 100 dolar didine hediya wan, lê 500 dolar jî wek şabaş didine defçî û zirneçîyan.

***Ali Gurdilî:*** *Em dizanin ku demekê, te li Ermenistanê endamêtiya Komeleya Xwendekarên Kurd kiriye. Piştre jî te li heman welatî, sêkrêtariya Şêwra Rewşenbîrên Kurd kiriye. Li gor bîr û baweriya te têkiliyên kurd û ermenan, niha di çi astê de ne? Meriv dikare bibêje ku têkiliyên wan baş in, xurt in yan herdu milet di hevkariyekê de ne? Di civaka wan de, gelo hina jî kes hene ku ji ber Jenosîda Ermenan kurdan sûcdar dikin?*

**Têmûrê Xelîl:** Bi bawerîya min, li cihanê ji ermenîyan pirtir dostên kurdan tunene. Me ev yek di hevaltîyê da jî, di cînartîyê da jî, di pêwendîyên rojane da jî, di berhemên nivîskarên ermenî yên ser kurdan da jî, di piştgirîkirina pêşketina çand û edebîyeta me da jî ser xwe texmîn kirîye. Wek ku Cegerxwînê mezin di hevpeyvîna bi min ra gotîye: ‘Em û ermenî birîndarê şûrekî ne’.
Di dema Sovyet da hîç ermenîyekî, hîç çapemenîyeke fermî hîç caran kurdan di gelkujîya ermenîyan da sûcdar ne kirîye.

Piştî Sovyetê çend ermenîyên nasyonalîst û çend êzdîyên nezan, herwiha çend sîyasetmedarên kurd yên Bakur gotin û nivîsîn, ku kurdan ermenî û êzdî qir kirine. Û ev gotin ne gotinên dewleta Ermenîstanê ne, yên çend kesan in. Ermenî heta ne dijî musulmanîyê ne jî. Ji 500 hezar azirîyên Ermenîstanê hemû terka Ermenîstanê kirin, lê kurdên musulman heta niha jî li Ermenîstanê dijîn. Yek ji wan–Nadoyê Xudo Maxmûdov gelek salan bûbû wezîr û cîgirê wezîrê dewletê. Pêwendîyên me û ermenîyan eger xirab bibin, ewê ji me be.

***Ali Gurdilî:*** *Wekî ku em dizanin, di xwenasîn û zanîna miletan de, rola zargotina miletan gelek girîng e; bi taybetî jî miletekê mîna miletê kurd ku hema hema, hemû êş û dîroka xwe bi devkî gotiye. Lewma jî gorbihuştê Qanatê Kurdo gotiye ku 'zargotina kurdî, kaniya edebiyata kurdî ye'. Ez jî hihekê din li ser vê ramanê zêde dikim û dibêjim ku edebiyata kurdî, kaniya felsefeya kurdî (kurdan) ye jî. Ez di wê baweriyê de me ku zargotina kurdî hêjî bi awayekî baş nehatiye berhevkirin, zelalkirin û şirovekirin, da ku ji bo gelek fikrên nû re bikaribe bibe bingeh. Ez baş dizanim ku xebatên te yên gelek hêja hene li ser zargotina kurdî, lewma dipirsim. Li ser vê mijarê fikrên te çi ne gelo?*

**Têmûrê Xelîl:** Zargotina me li Ermenîstanê ji alîyê Hecîyê Cindî, Emînê Evdal, Xelîlê Çaçan Muradov, Celîlê Celîl û Ordîxanê Celîl têra xwe hatîye berevkirin û çapkirin, hinek jî min berev kirine û amade kirine, lê wek pirtûk heta niha çap nebûne.
Pirsgirêk tenê ew e, ku ew bi herfên latînî yên kurdên Sovyet û herfên kirîlî hatine çapkirin û bona bigihîjine gelê me, gerekê bikine herfên latînî ya 'Hawar'ê. Ew kar min û herdu keçên min kirine, beşek ji wan çap bûne, beşeke mezin jî amade ne, lê çap nebûne. Piranîya wan jî di wan deman da hatine berevkirin, dema têlêvîzyon neketibû welatê me û nimûnên zargotina me her şev di odeyan da ji bo milet bi kurmancîyeke xweş dihate gotin û her nislek bi wan terbîye dibû û mezin dibû.

***Ali Gurdilî:*** *Bi destûra te, dixwazim li ser êzdiyan jî pirseke bikim. Di demên dawî de, bi qasî ku ez sehdikim di civaka êzdiyan de hejmara kesên ku ji xwe re dibêjin 'em ne kurd in, em êzdî ne.' her diçe zêdetir dibe. Helbet meriv dikare bi nêrîneke rûkalkî çend sedemên vê yekê bîne zimên, lê ez dibêjim ku mesele gelek kûrtir e newsa? Yanî ji ber çi wuha dibêjin gelo?*

**Têmûrê Xelîl:** Her deman, li her welatî xwedîyên milet dewlet e û ronakbîrên wê ne. Di dema Sovyet da dewleta me Sovyet û ronakbîrên me bûn. Dema Sovyet nema û ronakbîrên me jî ji Ermenîstanê derketin, ew cîyê valabûyî hinek nezan tije kirin, ku piranîya wan zanin jî ku êzdî kurd in, lê îro wisa tê hesabê wan. Lê zirara kesên wisa zêde tune. Kesên ku dibêjin em êzdî ne, heta em ne kurd in jî, çi dikin? Milet ra dibêjin bi zimanê xwe biaxivin, erf û edetê xwe biparêzin, sitiranên xwe bistirên, reqasên xwe bireqisin. Û ev hemû kurdî ne.
Em gerekê êzdîyan fêm bikin bo çi wisa dibêjin. Piştî fermana 74an êzdî birîndar in, şikestî ne, tirsîyane, heta berê xwe ji miletê xwe û welatê xwe jî guhastine, ji ber ku li welatê wan wana qir dikin û nayêne parastin.

***Ali Gurdilî:*** *Ji kerema xwe, tu dikarî bi kurtasî be jî hinekî behsa felsefeya xwe ya jiyanê bikî? Yanî, jiyan bo te çi ye? Tu xwe ji çi bextewar hîs dikî? Û têkiliya te ya bi felsefeyê re, di çi astî de ye?*
*Meseleyên felsefî, bala te dikşînin gelo?*

**Têmûrê Xelîl:** Felsefeya jîyana min pir sade ye: bi kurdî bijîm, bi kurdî biaxivim, bi kurdî binivîsim, bi kurdî bistirêm û bireqisim. Di karê xwe da jî felsefeyeke min a taybet heye: ez ji êrîşên bê bingeh yên ser nivîsên min yên kesên ku ne dost û hevalên min in, ber dilê min ne ezîz in, hîç naxeyîdim û aciz jî nabim, bersîva wan jî nadim. Di karê xwe yê berpirsîyarîya malperê da jî bona min ne giring e, kesên ji bo me nivîsan dinivîsin nivîskar in, doktor in, pale ne, kurê kîjan bavî ne û bejina wan çiqas kurt an dirêj e.

Bo malpera me kalîteya nivîsê û aktualbûna wê giring in. Bo nimûne, keç û xortekî kurd–Nura Shane û Shivan Keleş ji malpera me ra çend caran gotar û wergerên ser dereceya bilind û bi kurdîyeke xweş nivîsîn, emirê wan 20-25 salî ye, lê hinek nivîskar jî hene, ku heta 10 pirtûkên wan jî çap bûne, ser redaktorîkirin û korrektorîkirina nivîsên wan çend sietên min diçe û naverok û kalîteya nivîsan jî ne zêde baş in. Xuya ye wana bawer kirîye, ku ew nivîskar in.

***Ali Gurdilî:*** *Li gor bîr û baweriya te, rewşa zimanê kurdî niha çawa ye? Ji bo hemû perçeyan dipirsim. Gelo meriv dikare çi bike, yan divê çi werin kirin bo pêşketina zimanê kurdî?*

**Têmûrê Xelîl:** Gorî lêkolînên min, ez hatime ser wê bawerîyê, ku li Kurdistana Bakur ew kurd bi tirkî diaxivin, yên ku tirkî nizanin. Û ew kurd bi kurdî diaxivin, ku tirkîya wan gelek baş e. Rewşa zimanê kurdî xwesma li bakur berbat e. Ji bo wê hezar û yek bahaneyan tînin, ku hîç yek jî nayê qebûlkirin.
Mesele, dibêjin, tirk zor li me kirine, nehîştine em bi zimanê xwe bipeyivin, ku dibistanên kurdî tunebûn, lema, ku eger kurdî bipeyivin, paşê wê nikaribin karekî ji xwe ra bibînin, ji ber ku zimanê fermî tirkî ye. Ma eger di gundekî kurdan da kurd di mala xwe da bi kurdî biaxivîyana, qey ber derê her malekê polîsên tirkan sekinîbûn ne dihiştin? Ma qey mirov li dibistanan kurdî fêr dibe? Li dibistanan fêrî xwendin û nivîsara bi kurdî dikin, ne fêrî axavtina kurdî dikin. Biyanî dikarin kurdî fêr bibin, ne kurd.
Kurd gerekê kurdî bizanibin, gerekê ji xwîna dê ra derbazî nava bedena wan be. Ez meseleya xwe bêjim: ez li gundên kurdan mezin nebûme, li paytextê Ermenîstanê bûme û mezin bûme. Li paytext jî zêde kurd tunene. Dibistan jî bi ermenî û rûsî ne. Cînar û heval jî ermenî û rûs in. Min li dibstanê hîç deqeyekê jî kurdî ne xwendîye. Dê û bavê min jî ne gotine fêrî kurdî be, heta fêrî xwendin û nivîsara kurdî jî nekirine. Dê bavê min yek tişt tenê kirine: dema me bi ermenî an bi rûsî pirsek ji wan bikira, bersîva

me nedidan, digotin em fêm nakin tu çi dibêjî. Me jî mecbûr pirsa xwe bi kurdî dikir. Dema me bersîva pirsên wan jî bi ermenî an rûsî bida, dîsa digotin em fêm nakin tu çi dibêjî, me jî mecbûr bi kurdî digot. Hinek kurdên bakur jî dema tirkîyeke şikestî dipeyivin, xwe wek kesekî medenî dibînin.
Hema mirov dixweze ji wan ra bêje: xwelîserno, eger me medenîbûnê bifikirîya, meyê jî bi ermenî û rûsî bipeyivîya, di ser da jî ermenî jî, rûs jî ji tirkan medenîtir in. Tirkî axavtina kurdan nimzdîtina miletê xwe ye, nezanîya dîroka xwe ye, kêmanîya welatparêzîyê ye, jixweheznekirin e. Ma qey we li cihanê dîtîye yek jineke bi aqil û ciwan bibîne û bêje xwezî ev dayka min bûya! Dayka min a here ciwan û here bi aqil e li cihanê.

***Ali Gurdilî:*** *Tu Kurdistaneke çawa xeyal dikî kek Têmûr? Heke hêza te hebûya, dê te ji bo kurdan, dewleteke çawa ava bikira?*

**Têmûrê Xelîl:** Kurdistaneke bi zimanê kurdî, bi alaya kurdî, ku tê da hîç miletek nebe bira, lê bibe dost, heval, cînarê baş. Bira ji dê û bavekî, an jî bi kêmanî ji yek ji wan dibin. Kesên ku li ser axavtina kurdî ji milet ra bûne asteng, kesên ku dijî alaya kurdî bûne bela serê milet, kesên dewletnexwez gerekê di Kurdistana serbixwe da gorî qanûnê bersîvê bidin. Gerekê Kurdistaneke wisa be, ku piştî neslekê mirov bikaribe ji reng û rûyê mirov, ji kenê mirov, ji şabûn û xemgînîya mirov, heta ji rêveçûna mirov jî ferq bike ka kîjan kurd e, kîjan jî tirk e.

***Ali Gurdilî:*** *Kekê Têmûr, zor zor spas bo vê hevpeyvînê, mala te ava. Li ser navê xwe û xwînerên malperê, ez dubare spasiya te dikim û serkeftina cenabê te dixwazim.*

**Têmûrê Xelîl:** Ez jî gelek sipas dikim, bi hêvîya ku nimûneya jîyana kurdekî Sovyet bikaribe piçek be jî, alî pêşketina kurdîyê, kurdîtîyê, kurdbûnê û Kurdistanê bike.

**Hevpeyvîn: Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
**02.02.2016**

**Temûrê Xelîl kî ye?**

Têmûrê Xelîl yekemîn kes e, ku gelek salan di hemû çapemenî û radyoyên kurdî yên fermî yên Yekîtîya Sovyet da kar kirîye: di rojnameya ‘Rya teze’, radyoya kurdî ya Rewanê, radyoya kurdî ya Moskvayê. Herwiha 5 salan jî bûye cîgirê berpirsyarê rojnameya ‘Golos kûrda’ (Dengê kurdan), ku Navenda çanda kurdî li Moskvayê bi zimanê rûsî, lê ser kurd û Kurdistanê çap dikir.

Malbeta Têmûrê Xelîl belkî yekemîn malbet e, ku neferên wê bi tevayî weke 100 salan bi profêsyonalî karê rojnamegerîya kurdî xurt kirine. Ango, 100 salan di rojê da bi kêmanî 8 sietan ew kar kirine. Bavê Têmûr – Xelîlê Çaçan 24 salan serok û berpirsyarê radyoya kurdî ya Rewanê bûye (ji sala 1957an heta sala 1981ê), diya wî – Eznîva Reşîd 27 salan bêjera wê radyoyê bûye (ji sala 1955an heta sala 1982an), keça Têmûr – Mîdîya ji kurdên Sovyet yekem kes e, ku fakûltêya rojnamegerîyê ya Ûnîvêrsîteya Yekîtîya Sovyet ya sereke ya ser navê M. Lomonosov li Moskvayê temam kirîye û gotarên wê di gelek rojname û kovarên kurdî, ermenî û rûsî da da çap bûne, wek ‘Armanc’, ‘Novîy Kurdîstan’, ‘Roja Nû’, ‘Ankaxûtyûn’, ‘Sûdarûşka’ û yên din. Têmûr bi xwe jî zêdeyî 40 salan e di wî karî da ne û niha jî berpirsyarê vêrsyona kurdî ya malpera www.riataza.com e.

Eger em bidine ber çavan, ku ji hemû karên kurdên Sovyet ji hemûyan pirtir karê radyoya Rewanê gihîştîye gelê me, bêtir jî bi riya stiranên wê, em dikarin bêjin, ku hema bêje hemû sitiranên kurdên Sovyet bi saya serê Xelîlê Çaçan hatine qeydkirinê (me gelek caran îzbat kirîye, ku eger ne camêrî, welatparêzî û bêxofîya wî bûya, weyê îro dengê Şeroyê Biro, Şebabê Egît, Zadîna Şekir û yên din ne bihîsta), hemû sitiranaên kurdên dervayî Sovyet, wek Şivan Perwer, Gulistana Perwer, Mehmûd Qizil, Eyşe Şanê, Husênê Farê û yên din Têmûrê Xelîl peyda kirine û wek hediya

dane radyoyê (di dema Sovyet da qedexe bû pêwendîyan bi kurdên derva ra daynî, bi wan ra bikevî nava têkilîyan, lê ew ne ji bo Têmûr bû) û diya Têmûr jî ew bi radyoyê belayî Kurdistanê kirîye. Ewî bi kesên wisan bi nav û deng ra hevpeyvîn kirîye, wek Cegerxwîn, Qanatê Kurdo, Ebdurehman Qasimlo, Osman Sebrî, akadêmîk Nadirê Kerem Nadîrov û gelek kesên din yên bi nav û deng ra.

***Berhemên wî***

***1-*** *Dengê Xwînê, kurteçîrok, 2009, Weşanên Lîs, Amed*

***2-*** *Antolojîya 35 helbestvan û nivîskarê kurdên Sovyet, 2015, weşanên NA, Îzmîr.*

***Wergerên wî yên ku gihandine kurdî***

*Heta niha Têmûrê Xelîl ev pirtûk ji zimanê rûsî û ermenî wergerandine kurdî.*

***1.*** *'Kurdên Tirkiyê di dema nû û here nû da' (450 rûpel), ya profêsor M. Hasratyan, ji rûsî wergerandîye kurdî û sala 1994a li Bêlçîkayê, ji aliyê Înstîtûta Kurdî li Brûksêlê da hatîye çapkirin.*

***2.*** *'Pirsa kurdan', cildeya 1ê, profêsor M. Lazarev, 480 rûpel, sala 1999a di nav weşanên 'Roja Nû' da çap bû.*

***3.*** *'Împêrîyalîzm û pirsa kurdan', cildeya 2an ya profêsor M. Lazarev, 380 rûpel, ji rûsî wergerandîye kurdî û di weşanên 'Roja Nû' da çap bû.*

***4.*** *'Kurd di dema şerên Rûsîyayê bi Farizistanê û Tirkiyê ra', ya serhing A. Avêryanov, sala 1900î bi rûsî çap bûye (berî 103 salan), 580 rûpel. Eva pirtûka bi daxaza Înstîtûta Kurdî ya Parîsê hatîye wergerandin û ewê li zûtirekê çap bibe.*

***5.*** *'Kurdistana nû', 500 rûpel, bi daxaza Navbenda Lêkolînên Kurdî li Moskow û bi daxaza Înstîtûta Kurdî li Parîsê ji rûsî hatîye wergerandin û wê li zûtirekê çap bibe.*

***6.*** *'Tevgera kurda', ya profêsor Xalfîn, 200 rûpel, sala 1963a bi rûsî çap bûye. Hatîye wergerandinê û APECê çap bike.*

*__7.__ ‘Îdyomên kurdî, bi şirovekirina rûsî’, ya profêsor Maksîmê Xemo, 480 rûpel. Ev pirtûk Kitêbxaneya kurdî li Stokholmê wê çap bike. Di wê da şirovekirina îdyoman ji rûsî hatîye wergerandinê ser kurdî.*
*__8.__ ‘Kurdên Azirbêcanê’ ya A. Bûkşpan, 120 rûpel, sala 1932a li Bekuyê çap bûye. Ji rûsî hatîye wergerandin, Înstîtûta Kurdî li Parîsê wê çap bike.*
*__9. ‘__Dêrsim’ ya Andranîk, 180 rûpel, sal 1900, wergera ji ermenî, weşanên ‘Deng’, sal 2009.*
*__10.__ ‘Li Muksê folkor û jîyana rojane’, ya akadêmîk Îosîf Orbêlî, 104 rûpel, weşanên Nûbihar.*
*__11.__ ‘Bawermendîyên kurdên êzdî’, 220 rûpel, wergera ji ermenî, heta niha çap nebûye.*
*__12.__ ‘Kurdistan û pirsgirêka kurdan (1923-1945)’, a M. Lazarev, cildeya 3an, 310 rûpel, heta niha çap nebûye.*

***Berhemên din***
*Têmûrê Xelîl gelek pirtûk jî bi herdu keçên xwe - Mîdîayê û Dîdarê ra - tevayî ji tîpên kîrîlî û latîniya kurdên Ermenîstanê wergerandine ser tîpên kurdiya latînî ya niha:*
*__1-__ ‘Mesele û metelokên cimaeta kurda’, 800 rûpel ya ku Heciyê Cindî berev kiribûn.*
*__2-__ ‘Şaxêd Rostemê Zale kurdî’, 400 rûpel, ya ku Heciyê Cindî veçêkirîye.*
*__3-__ ‘Folklora Kurmanca’ ya sala 1936a, 640 rûpel, ji latîniya kurdên Ermenîstanê hatîye wergerandin ser kurdiya latînî ya niha. Amadekarên wê Emînê Evdal û Heciyê Cindî ne.*
*__4-__ Pênc cildên ‘Hikyatêd cimaeta kurdîyê’, 1300 rûpel, ku Heciyê Cindî berev kirine.*
*__5-__ ‘Folklora kurmancîyê’ ya sala 1957a, ku H.Cindî berev kirîye û amade kirîye.*
*__6-__ ‘Klamêd cmaeta kurdaye lîrîkîyê’, 250 rûpel, ku H. Cindî berev kirine û sala 1972a bi pirtûkeke cihê li Yêrêvanê çap bûye.*
*__7-__ ‘Heleqetîyên pizmamtîyê di nava kurda da’ ya Emînê Evdal, sal 1965, 300 rûpel, Yêrêvan.*
*__8-__ ‘Destan û sitiranên kurdan yên êpîkîyê’. Amadekirina têkstan,*

*pêşgotin û şirovekirin yên Hecîyê Cindî. Weşanxaneya Edebîyeta Rohilatê, Moskva 1962. 180 rûpel.*
***9-*** *Varyantên kurdî yên destana 'Koroxlî'. Jibernivîs, berhevkar, werger û pêşgotin yên Hecîyê Cindî. Yêrêvan, 1953, 120 rûpel.*

***Jêder***
***1-*** *https://ku.wikipedia.org/wiki/Têmûrê_Xelîl*
*2- http://www.pen-kurd.org/kurdi/Mehmudbikurdi.html*
***3-*** *https://www.facebook.com/muradov.hamlet*
***4-*** *http://riataza.com/kurdish/5258-ez-temure-xelil-kure-xelile-cacan-muradov-u-ezniva-reid.html*
***5-*** *http://riataza.com/kurdish/4960-hrant-dink-ji-pita-kurdan-cu.html*
***6-*** *http://riataza.com/kurdish/5183-xwedeyo-tu-me-ji-dewletnexwezan-biparezi.html*

## MIROV Û SIBEROJA FELSEFEYÊ

*'Vajbawerî, agir berdidine dinyayê.*
*Tiştê ku dê wî agirî bitemirîne, felsefe ye.'*
***(Voltaîre)***

Di desta yekem de, bêguman mirov dikare bibêje ku felsefe; lêgerînek bêdawî ya mirovî ye û heta hetayê jî, dê ev lêgerîna mirovî berdewam bike. Felsefe, bi rêya bikaranîna aqil û hişê mirovî dest pê kiriye û wisa xwiya dike ku, dê hebûna xwe ya bi vî hawî herdem berdewam jî bike. Felsefe, ne zanistek e û ti caran, nexwestiye ku xwe bigihîne encam *(zanyariyên)* misoger û naguher. Jixwe, di demên dawî de hatiye destnîşankirin ku zanayiyên zanistî jî, ne zanayiyên mayende û naguher in û dikarin werin guherin yan jî, dibe ku çewt jî hatibin zanîn. Di vê xalê de, em carekê din rastê hêzdarî û mafdariya felsefeyê dibin. Heke felsefeyê ji hemû tiştan gumanê nekiriba, bêguman nikaribû bibe maka hemû zanistên îroyîn. Ji xwe, tiştê ku felsefe û zanistê, ji hevdu cihê dike jî ev helwesta felsefeyê ya gumanber û rexnekar e. Lewma jî, em dikarin bibêjin ku heta mirov aqilê xwe bikar bînin, bi awayeke aqilane tevbigerin û bi şik nêzîkî mijarên têkildar bibin, dê felsefe jî ji holê ranebe û hebûna xwe bidomîne. Heta radeyekî, mirov dikare bibêje ku dê mijarên felsefeyê, berfirehtir jî bibin. Çimku fîlozof jî, di civakê de dijîn û jê ketumet dibin. Girêdayî vê yekê; pirs yan pirsgirêkên ku di civakê de têne dîtin, bala fîlozofan jî dikşînin û dibin babeta lêkolînên wan. Mesela piştî Şoreşa Sanayiyê, Şoreşa Fransî û Daxuyaniya Gerdûnî Ya Mafê Mirovan, têgeha demokrasiyê zêdetir derketiye pêş û vê yekê, gelekî bala fîlozofan kişandiye. Niha jî, di civakên hemdem de; ***<rewşa biyabûna mirovan>*** xwe daye der û di civakên wê de yê sanayiyê de, tenêtiya mirovan her diçe zêdetir dibe. Di vê xalê de, em dibînin ku ev pirsgirêk zêdetir dibe mijara fîlozofan û felsefeyê. Li gelek welatên Ewropayê, niha ***Navendên Felsefeyê*** têne vekirin. Li wan navendan *(fêrgeh)*, felsefeyê fêrî mirovan

dikin. Bi saya rêbaz û zanayiyên felsefeyê, mirov dev ji zanayiyên *(nêrînên)* xwe yên bawerhişk berdidin û dibine xwediyê awireke felsefî ya rexnekar û kêrhatî. Zagona bingehîn ya xwezayê, weke zanîna we ye ku ***guherîn*** bi xwe ye. Hemû tişt, diguherin û mîna xwe namînin. Di vê rewşa guherîna bilez û hêzdar de, bêguman têgihiştina bûyer û kirûyên xwezayî û civakî jî, gelekî zehmet e. Lê bi saya felsefeyê, mirov dikarin têbigihêjinê wê guherînê, dev ji ramanên xwe yên kevin berdin û li xwe werin. Di siberojê de, mîna ***Navendên Psîkolojiyê***; dibe ku ***Navendên Felsefeyê*** jî zêdetir bibin û xizmeta mirovan, ya têgihiştineke çaktir bikin.

**Ê baş e, tiştên ku felsefe fêrî mirovan dike çi ne?**

Bi saya felsefeyê, mirov fêrî fikirîna kûr ya nedîtbar dibin. Aqilê xwe, çêtir bikar tînin. Bi awayeke çavkorî, hemû tiştan qebûl nakin. Tiştek dema ku ji wan tê xwestin, bi şik nêzîkî wî tiştî dibin û lêdikolin. Bi saya felsefeyê, mirov çêtir têdigihêjine hêjahiya mirovan, civak û xwezayê. Hesta xweşdîtin û toleransê, çêtir dinasin û bi çavekî pîroz, li tu tiştan mêze nakin. Helwesta felsefeyê ya rexnekar û gumanber, rê li pîroziyên naguher digre û zanayiyê dike tiştekî guhêrbar û kêrhatî. Mirovên ku haya wan ji felsefeyê heye, girîngiyê didine ramanên mirovên din jî.

Çimku ew baş dizanin ku ramanên rast, ne tenê ramanên wan in û hewlesteke mirovî, nîşanî mirovên din jî didin.

Hasilê; di roja me ya îroyîn de, mirov dikare bibêje ku felsefe êdî ne tenê tiştekê utopîk e. Di pratîkê de jî, gelek tiştan fêrî mirovan dike. Mîna ehlaq, ol, siyaset û zanistê; felsefe jî rahişmendiyeke mirovî ye û di civakên hemdem de, dê bêtir bikeve xizmeta mirovan.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
02.10.2014

**Jêder**

**1-** Antolojiya Feylesofan. Ali Gurdilî.
**2-** Profesor Bryan Magee. Kurteçîroka Felsefeyê. Weş. Dost.
**3-** Destpêka Felsefeyê. Ali Gurdilî. Weşanên Soran. 2015
**4-** www.felsefevan.org
**5-** Dîroka Felsefeyê. Ali Gurdilî. Xebateke Çapnebûyî

‘Sê celeb bextiyarî hene. Ya pêşîn, jiyana ku tê de micêz û daxwazên me hene, ye. Ya duyemîn jiyana ku em tê de hemwelatiyeke azad û xwedîberpirsiyar in, e. Ya sêyemîn jî, jiyana ku em tê de dibin lêkolîner û fîlozof e. Şert û mercên bextiyariyê jî, bi hevrebûna van her sê celeban re çêdibe.’

**(Arîstoteles| B.Z. 384-322)**

**Komponêntên Felsefeyê**

Mirovê serkeftî fîlozof e, anku felsefevanê karê xwe ye. Felsefe, li ser her tiştî dikare bête kirin. Erka felsefevan ew e ku, matêrî û diyardeyên ku berbiçav in rave, analîz, girêdayî logîkê bike û ji me re nirxa wan bibêje. Dîsan jî çiqasî evan qorzîkên teknîkî weke aliyên serkeftî bêne dîtin, lê ev serkeftin bi xwe, mixabine, nexwedî armanc be, dimîne encama evê xebatê ew e ku dê weke yekalîn bihête dîtin.

Ji xwe û ji ber ku ji bere ve jî naskirî ye ku ji ê felsefevan tête xwestin ew e ku mamostetiya derûdora xwe bike û bi miletê xwe re diyalogê biajo, divabe nexwe evî mamosteyî evan qorzîkên teknîkî li gewdê ew kesên derûdora xwe, ku me niha qal kirî bike, mîna kirasekî, û ji wan bixwaze ku tek bi mejî ê xwe bifikirin.

Ji xwe ev e ye xala newekheviyê di nêvbera kesên ku felsefeyê dikine û yên ku felsefeyê dixwînin. Ji ber, heyanî ku em bi zimanê ku em pê difikirin û diaxivin, felsefeyê nekine û berdewam, vê felsefeyê nenivîsin û belav nekine, dê dîmenê vê kiryara me, bi zimanê felsefevanê miletên dîtir pêdiviyê bi wergereka şkestî bibe.

Felsefe, gotina dawîn e ji karê herî serkeftî re. Gelek mirovan kêfa wan tê gava ku li ser berhemeke xwe biaxivin, mîna gava ku yê helbestvan felsefeyê li ser helbesta xwe bike, ê mûzîkvan li ser mûzîka xwe, ê nivîskar derbarê nivîsên xwe, td. Ji xwe jî jê serrasttir, tendurusttir û serkeftîtir tuneye, ji her yekek ê van cûreyan ku qultek felsefeya wê bihête vexwarin, ji ber ku çi wilo, çi wekî din be, ev rex û alî hevûdû temam dikin, mîna endamê malekê, ku weke fikir dihête dîtin, wate mal. Jê giringtir hîna ew e, zimanê ku pê tête hûnandin, ku ev mal û ev hûnandin bibine hevserên hevûdû.

Komponêntên felsefeyê hayxwejêanîn û pêwisttirîn lênerîn, herweha pêdeçûn dixwazine. Felsefe nema A û B ye, lê belê A û Z e. Felsefeya kurdî bi wan zaraveyan diaxive, yên ku Zimanê Kurdî ji wan pêk tê. Berdewam wesan e, ku bi gramera felsefeyê alavêt kognîsyona kurdî jî saz dibe û ev bîrkarî *(matematîk)* dibe

nasnameya xwenasînê di ferhenga mêjiyê kurdî de. Em felsefeyê dixwînin, ji ber ku felsefe tê xwendin.

**Brahîm Şêxo**
24.02.2016

‘Di babeta hilberandina zanayiyê de rêya tekane, ezmûn e. Derheqê xwedê de jî, riya bidestxistina zanayiyan heke yek pirtûka pîroz be, ya din jî vekolandina xwezayê ye. Çimku xweza peyker, sî û dengvedana xwedê ye.’
**(Tommaso Campanella)**

## Hevpeyvîn Bi Tengezarê Marînî re

Tengezarê Marînî, nivîskar û helbestvanek î kurd e û di 04.09.1959an de li Tirbespiyê, li Başûrê Rojavayê Kurdistanê hatiye dinyayê. Pisporiya karmendiya mediya nû (communication, relation, Rethorik, Derûnasiya xîtaba ragehandinê û şiroveya zimanê wê) xwendiye. Karê sosiyolojiyê di ba Prof.Dr. Hartmut Griese, li zankoya Hannoverê û Duhokê kiriye. Pisporiya wergerandina derûnasî û nojdariyê xwendiye, kar kiriye û rahêner e, li nik EMZ=Navenda nojdariya regezan û bajarê Hannover. Di bîr û raya giştî de, bi helbestên xwe û nivîsên xwe yên li ser rexneya toreyî û wergerandina helbestvanên elmanînivîs tê naskirin. Me xwest em li ser navê Kovara Felsefevan û malpera www.felsefevan.org ê ligel kek Tengezar Marînî li ser jiyan, xebat, helbest û felsefeyê bipeyîvin, wî û xebatên wî bi xwînerên xwe zêdetir bidin naskirin.

**Ali Gurdilî:** Kekê Tengezar, di destpêkê de ji bo derfeta vê hevpeyvînê li ser navê xwe û xwînerên kovar û malperê, ez gelekî spasiya te dikim û dibêjim, malî ava. Ji kerema xwe, tu dikarî xwe bi xwînerên me bidî naskirin? Yanî tu li kû hatiyî dinyayê, zarokatî, perwerdehî, malbat û hwd?

**Tengezarê Marînî:** Wekî ku te di destpêkê de nivîsî, ez li Tirbespiyê, ku bajarokekî binxetê ji dayik bûme û min li wir dibistanên seretayî, navendî û Lîsa li wir xwend, di pey re 2 salan min literatûra erebî xwend, lê min bidawî neanî û hatim Elmaniya. Ji sala 1978- destpêka 1983 li Elmaniya mam, min di wê demê de salekê Journalismus xwend, lê ji ber gelek sedeman min xwend lê bi dawî neanî û di sala 1983an de vegeriyam welêt. Piştî xizmeta leşgeriyê, li Helebê, li akadîmiya Topan 3 salan xwend, piştre vegeriyam Tirbespiyê û min karê partîtiyê dikir, ez nabêjim siaysetê. Li wir, têkiliyên min bi xwedêjêrazî, Mamoste Rezo Osê, Zagros Haco çêbûbûn û wan jî ji sala 1983an ve kovara Stêr diweşand, ez tevî xebata nivîsînê bêtir bûm û wan ez gelekî han dam.

Fêrbûna tîpa kurdî ya yekem, ez li ser destê xwedê jê razî hunermend Mihemed Şêxo fêr bûm, di destpêka salên 1970ê de. Di malê de jî, birayê min Salar mamoste bû û wî gelek pirtûk dixwendin û rê dida min, ez pirtûkan bixwênim. Her ji destpêka xwendinê ve, meyla min li ser edebiyatê bû û zimanê kurdî bala min dikişand û bi taybetî, dema min didît, melayan mewlûd bi kurdî dixwend.

Helbet Cegerxwîn û nav û dengê wî û hatina wî bi ser Tirbespiyê de ez wekî hinek ji nifşên bi min re handam karê kurdîniyê. Min gelek caran Cegerxwîn li mala Amê xwe didît, Di 12 saliya xwe de, min bavê xwe winda kir û wexera wî hîn jî kuleke di dilê min de. Ez hîn zarok, min gelek berpirsiyarî avête ser milê xwe, di gel ku mezintir ji min hebûn. Min hemî kar dikir, lê her di wê demê de jî, min dikarîbû dema xwe baş birêk bixim. Goka lingan, Pingpong, xwendin, karê di xwaringehan de, pêlavboyaxkirin…

Di hemiyan de jî, min nedixwest kêmasî zor bin. Bi wateyeke din, ez zaroyekî şeqî bûm.

**Ali Gurdilî:** Çend sal in ku cenabê te li Almanya dijî? Bawer dikim tu serokê Komelaya Nivîskarên Rojavayê Kurdistanê ya Almanyayê jî newsa? Gelo tu dikarî hebekî behsa xebatên komeleyê û bi giştî xebatên nivîskaran bikî? Yanî çi pevxebatên we hene bo kurdî?

**Tengezarê Marînî:** Ew komele mixabin, wek gelek dezgehên kurdan zû sar dibin û vedimirin. Saziya nivîskaran, salekê tenê berdewam kir û me karîbû di wê salê de 2 hijmaran ji kovara Pêl biweşînin û çend şevên toreyî li dar bixin, lê mixabin nema êdî berdewam bû. Ez rêvebirê wê bûm, lê rêvebirê kovara pêl, mamoste Heyder Omer bû û di redakisiyonê de, Jan Dost, Keça Kurd, Helîm Yûsiv, Bahram Yûnis û ez bûn.

**Ali Gurdilî:** Wekî ku em dizanin, piştî terora Daîşê bi milyonan kurd berê xwe dane xerîbiyê û bûne koçber. Hejmareke wan jî, xwe gihandine Almanyayê. Gelo niha rewşa wan li wir çawa ye?

Kurdên ku li Almanyayê ne weke şexs û civak, gelo çi alîkariyê didine wan?

**Tengezarê Marînî:** Eve zêdeyî 18 salan e, ku ez bi karê wergerê û mafê mirovan de bibizav im, dikim û têkiliya min her dem bi koçber, derbeder û penaberan re ye û eve saleke, ez berpirsê kampeke koçberan im. Birastî, ew di rewşeke nebaş de dijîn, ji bilî, ku dûrî kes û xizmên xwe û welatê xwe bûne, ku ev bi xwe êşeke mezin e, lê ev guherînên berdewam, di yasayên penabertiyê de û nezanîna wan ji zimanî re, dihêle ku xwe wek mirov kêm bibînin. Struktûra avakirina hişê rojhilatî jî, ku eger karekî xerab bike, ew hest dikin, ku wê hemî bi agirê wî bisotin. Ya kambax jî, koçber, herdem dibin babeteke baş, bo hilbijartinê û siyasetê û her hêleke siyasî, dixwaze li ser êşên wan dengan bo xwe kom bike. Lê ji hêlek e din ve, eger yê koçber bikaribe xwe di gel civaka nû biguncîne, fêrî ziman bibe, derfet û dergeh jê re vedibin. Ji bo alîkariyê, ji xwe bi giştî, yên nû pêdivî alîkariya yên ji wan kevintirin.. di van demên dawî de, hem civata elmanî û hemî jî, yên penaberên kevin alîkarî kirin, her yek li gor hêz û derfetên xwe.. Di gel wê jî ji ber hijmar gelek bû, ji hêla organîzasiyonê ji destê hukumeta elman jî derket.

**Ali Gurdilî:** Qasî ku bala xwe didimê di helbest û wergerên cenabê te de, herdem lêgerîn û nîşandana felsefeyekê xwe dide der. Yanî, pirî caran tu helbestên hinek feylesofan ligel danasîna jiyana wan diweşînî, ku gelek balê dide ser xwe. Di vê yekê de, ez bawer im ku para hezkirina te ya felsefeyê gelek e newsa? Baş e, li gor baweriya cenabê te têkiliyeke çawa di navbera felsefe û helbestê de heye? Û çima helbest?

**Tengezarê Marînî:** Min ji biçûkaniya xwe de, hez ji felsefê dikir. Ez di xeta çeprewiyê de mezin bûm û Marx bo min, wek gelekan simbola pêşketinê û pêşverûbûnê bû. Di pey re, min Hegel, Kant, Engels, Fürbach, Şopenhawer bi erebî xwendin. Lê hezkirina min ji helbestê re jî, zû li ba min diyar bû.. di 12 saliya xwe de, di dibistanê de, pişbirka helbestên erebî hebû û min gelek ezber

dikirin. Yên kurdî jî. Min ji stranên Aram, Temo, Saîd Yûsiv çêj werdigirt û li ber awazên wan, carcaran min peyv diristin.

Di dema temenê min 14 salî bû, rojekê li bihyekê camêrekî (di pey re min zanîbû, ku ew Şêx Abdulqudûs e) helbestek xwend, min di cih de ezber kir û bawer dikir ku ev helbest bi farisî ye. Ew jî helbesta "Sebahulxeyrî Xanim", êdî piştî derbasî lîsa bûm û min helbestên kurdî xwendin û guhdar kirin, êdî min zanî ew ya melayê Cizîrî ye. Di dibistanê de jî. Dema pola 10. Me dixwend waneya felsefê hebû û min hez ji Suqratos kir û bi taybetî ew hevoka Herakleîtos jî hişt gelekî berê min bikeve Diyalektîkê "Mirov 2 caran di ava çemê herikbar de melevaniyê nake". Lê min hez ji Platon nedikir. Sedem jî ew bû, ku wî helbestvan ji komara xwe ya Utopî avêtibûn û min jî ta demeke başbawer dikir, ku helbestvan bi helbestên xwe dikarin jiyanê biguherin û mû ji nav mast derbixin. Eve bi xwe jî Utopiyeke bi şêweyekî din e.

**Ali Gurdilî:** Kurd, ji helbestan gelek hezdikin. Gelo meriv çawa dikare berê vê hezkirina wan, hinekî jî bide felsefeyê?

**Tengezarê Marînî:** Eger mirov bixwaze berê xwendevanên kurd bide felsefeyê, divê helbestên felsefî yên Cizîrî, Feqiyê Teyran, tesewifê, bi wan xweş bike û metodan bibîne, ku baş li wan guhdar bikin. Lê rastiyek din heye, divê hezkirina zimanê kurdî zor peyda bibe û kurdî bibe zimanê yekemîn yê nivîskarên kurd û bitaybetî yên bi kurdî dinivîsin. Hijmareke zor ji nivîskarên me, zimanê wan yê yekem, zimanê dagîrkeran e. Divêt rola wergerê zêdetir bibe û bêgumane, di wergerê de, pêdiviye para felsefe di wergerandinê de zor be, çiku felsefe, Roman û hizir ziman bi pêş ve dibin û dewlemend dikin. Em pêdivî bi hemîcure nivîsînê de û di hemî war û beşên zanistî, civaknasî, derûnî, yasayî û teknîkî ne.

**Ali Gurdilî:** Gelo tu bi tenê helbestan dinivîsînî yan kurteçîrok û roman jî hene di nav xebatên te de? Yan tu difikirî ku rojekê romaneke binivîsînî?

**Tengezarê Marînî:** Ez gotar, helbest û rexneya edebî dinivîsim, lê di warê wergerê de, ez zimanê nojdarî, yasayî, derûnnasî û terapiyê jî dinivîsim û min berhevok di van biwaran de wergerandine.

**Ali Gurdilî:** Di peyameke xwe de tu wiha dibêjî: 'Aștiya cîhanî bi pirsa kurd ve girêdayî ye û her kes jî dizane, bêy çareserkirina pirsa kurd aștî li herêmê nikare berqerar be. Di dawî de, bê Kurdistanek serbixwe û azad, em kurd dê herdem pêrgî van qetlîaman bibin.' Di vê gotin û ramana te de, gelo ciyê tevgerên kurdan yên li Rojavayê Kurdistanê çi ye, yan jî divê çi be? Bi qasî ku em dizanin, beroka PYD, YPG zêde xwe nêzîkî otonomî yan jî serxwebûnê nake û xwe wekî perçeyeke hêza 'Sûriyeya Demokratîk' dihesibîne. Yên din çi dibêjin gelo? Baş e, xelkê rojavayê li benda çareseriyeke çawa ye gelo, li gor bîr û baweriya te? Hewldanên PYD û YPG'ê dê bersiva hêviya wan bide yan na?

**Tengezarê Marînî:** Eger em bibêjin, navenda gerim ya sedsala 21ê rojhilata navîn e, pirsa kurd di rojhilata navîn û naverast de pirsa sereke ye û ez bawer im aştiya cîhanî, eger di vê sedsalê de cengeke mezin çêbibe, di gel ku heye, cîhanê di 2003an li Iraqê da, berya wê Afganistan, niha jî di Sûriya de, cengeke cîhanî biçûk heye û di wê cengê de USA, Rûsiya Îran, Siûdiya erebî, Turkiya, Iraq, Urdun û Libnan hene. Pirsa kurd eger çareser nebe, wê gelek welatên herêmê parçe bibin, bo nimûne Turkiya û Iran. Îro berjewendiyê Cîhana zilhêz û demoqrat û azad û kurdan digihin hev û di cokekê de diçin. Tişta giring, kurd hev bigirin û pêdivî ye, serxwebûn di parçeyekî de peyda bibe, eger peyda nebe, dê gelek kuşin û qetlîam li dijî kurdan pêk bihê. Projektê PYD, YPG û derdorên PKK bo çareserkirina pirsa kurd nebersiv e. PYD bi tena xwe nikare û dê agendên rêjîmê û Îranê serdestî wê bin, wate wê bibin alavê di dest wan de, eger kurdên din bi xwe re neke hevpişk. Hêvî û xewnên kurdan, bi xweseriya demoqratîk çareser nabe. Niha PYD ddaxwaza Sûriyayek federal dikin, lê nabêjin Federalî bo rojavayê Kurdistan. Bi kêman î niha nezelal e.

**Ali Gurdilî:** Li gor bîr û baweriya te partî û tevgerên siyasî yên kurd, ji bo temamiya Kurdistanê dipirsim; gelo têra xwe giraniyê didine zimanê kurdî yan na? Çimku meriv dema li wan mêze dike, ji aliyê siyasetê ve xurt in, lê ji hêla piştgiriya zimanê kurdî ve hebekî qels in yan ez çewt im? Li gor baweriya cenabê te dikare çi were kirin?

**Tengezarê Marînî:** Niha kêşa zimanê kurdî, ji bilî siyaset û partî guh didin vê meselê an jî nirxê zimanê kurdî dizanin an na, kêşeya perwerdekirina bi ziman heye, kêşeya ABC ya kurdî heye, ku niho 2 ABC, kêşeya zaraveyan heye, ku ta radeyekê sinorê zarave derbas kirine û bûne zimanên bi serê xwe. Bi rastî em dikarin bibêjên zimanên kurdî û ev ji hela zanistî ve jî rast e. Tu binêre li regezê nêr û mê, di kurmanciya jor de heye û li ya xwar de tune ye. Lê ji bo bersiva pirsa we jî, bi rastî guh nadine zimên û han nadin, ku xelk fêr bibe. Em niha dibînin, ku gelek nivîskarên me, yên ji destpêkê ve bi kurdî dinivîsîn, niha bi erebî dinivîsin. Ev cihê mixabiniyê ye.

**Ali Gurdilî:** Navbera cenabê te û felsefeyê, ez dizanim ku baş e. Ji kerema xwe re tu dikarî hinekî destnîşan bikî, ka çima pêdiviya mirovan bi felsefeyê heye?

**Tengezarê Marînî:** Pêdiviya kê bi felsefê nebe, ya me –çi nebe ji bo ziman- pê heye. Li ser pirseke weha, Çima felsefe giring e, ji nivîskarê Norvêjî, Jostein Gaarder, nivîserê pirtûk Sofîzim kirin?

Bersiva wî jî ev bû? “ Zor giring e. Tîtala rexneyê li Europa bête naskirin. Felsefe, mirovî fêr dike, çawa bi hişekî û nêrîneke rexneyî biramê. Eger em Hegel deynin ber çavan, ku çawa xwe bi nerêniyê mijûl kir û nerênî jî mirovî fêrî rêka ramandinê dike. Çendî giring e, bo nifşên nû, yên genc xalên nerênî di civaka xwe de bizanin” Focus Magazin, Duşemb, 20.12.1993

Di kongirê Felsefê yê Elmaniya li Düselldorfê, kovara der Spiegel, di 20.10.1969, bi Profesor Löwith re kirin û ev pirs jê kirin: “ Ma felsefe dixwaze, şirovekirina zimanê siyasî, kartêkirinek rasterast li

siyaseta civakî ya rojane bike"? Bersiva Prof. LÖWITH: Rasterast nikare, eger bixwaze jî. Zimanê siyasetê û yê zanista civakî zimanekî nêzîkî rastiyê ye lê cihê pirsê ye jî û ji lêvegerên felsefê re vekirîne. Felsefe dihêle, pirsiyar li ser zimanê polîtolog û sosiyologan çêbibe. Mirov bi xwe bûnewerekî civakî ye, û vê hebûna xwe nake cihê pirsê" Piştî van bersivan, belê felsefe ji mirovayetiyê re pêdivî ye, daku civak, siyaset, teknolojiya û aborî, zimanê guman û şirovekirin û zimanê rexneyê, derbasî jiyana rojane ya mirovî bike û felsefê ji nav çar dîwarê zanîngehê rizgar bike, daku zimanê rexneyê di pozîtîvîzmê û Neopozîtîvizmê, bigihe radeya lixwevegerînê.

**Ali Gurdilî:** Kitêbeke felsefî ya ku te gotiye 'xwezî ev kitêb bi kurdî bûya.' heye gelo? Yan te dixwest ku kija berhema felsefî bi kurdî bixwînî?

**Tengezarê Marînî:** Min gelekî dixwest pirtûka Martîn Heidegger ya bi navê " Sein und Zeit= Heyîn û Dem" bo kurdî bihata wergerandin.

**Ali Gurdilî:** Ji bo vê hevpeyvînê, ez gelekî spasiya cenabê te dikim û di kar û xebatên te de jî serkeftina te dixwazim. Malî ava kekê Tengezar.

**Tengezarê Marînî:** Spas bo vê derfetê û spas bo keda we ya hêja.

**Hevpeyvîn: Ali Gurdilî**

felsefevan@hotmail.com

**27.02.2016**

***Jêder***

***1-*** *https://ku.wikipedia.org/wiki/Tengezarê-Marînî*

***2-*** *http://www.pen-kurd.org/kurdi/tengezar-marini/tengezar-marini.html*

***3-*** *https://www.facebook.com/tengezar.marini*

**Tengezar Marînî kî ye?**

Tengezarê Marînî, nivîskariyê di warê û helbestê de, bi zimanê kurdî dike. Di 04.09.1959an de li Tirbespiyê, li Başûrê Rojavayê Kurdistanê hatiye dunyayê. 2 salan edebiyata erebî li zanîngeha Helebê xwendiye. Pisporiya karmendiya mediya nû (communication, relation, Rethorik, Derûnasiya xîtaba ragehandinê û şiroveya zimanê wê ) xwendiye. Di gel Prof.Dr. Hartmut Griese, li zankoya Hannoverê û Duhokê kar kiriye. Pisporiya wergerandina derûnasî û nojdariyê xwendiye, kar kiriye û rahêner e, li nik EMZ=Navenda nojdariya regezan û bajarê Hannover. Di bîr û raya giştî de, bi helbestên xwe û nivîsên xwe yên li ser rexneya toreyî û wergerandina helbestvanên elmanînivîs tê naskirin. Şarezayî di zimanên kurdî (Kurmancî-Soranî), erebî, engilîzî, Elmanî û Suryanî de heye. Di gelek rojname, Kovar û malperên kurdî de, li cih û welatên cuda de dinivîse

**Berhemên Tengezarê Marînî**

**Pirtûkên çapkirî (Kurdî):**

**1-** Kilît, helbest, sala 1992/ Beyrût

**2-** Çirûska Xewneke Bazdayî, helbest/ 1993 şam

**3-** Evîna Leylan û Mijê, helbest 1998/ Hannover

**4-** Şevnema şînê, helbest, 2001/ Hannover

**5-** Nesrîna Qedexe ji bêcirriya te 2005/ Amed

**6-** Kalo: Bêdengî nepara te ye(1 Helbest e) 2006/ Hannover

**7-** Helbest ên rengîn, amadekirin û werger ji Elmanî, Erich Fried, lêkolîn û helbest, 2006/ Duhok

**8-** Pantelonê Şeytanî, Îtalo Kalvîno, ji Elmanî, 2008/ Duhok

**9-** Zanista Rexneyî di navbera Tiyorî û Praktîkê de,

Rexne, 2014/Duhok

**10-** Çend berhevok ên tendurustiyê, mîna sîstema Tendurustiyê li Elmaniya, Memografî û penceşêra singê û Trauma (Xemnakî) û Derûnnasî

**Pirtûk ên bi elmanî:**

**1-** Der Baum der Freiheit (Dara Azadiyê)

Dokumentation, 1998/Hannover

**2-** Funken des Nebel=Tîrêj ên Mijê, helbest,

2000/1 2002/2/ Hannover

**3-** Was hast du gesagt=Te çi got, helbest, 2010/ Hannover

**<u>Li Ser Pêdiviya Felsefeyê</u>**

Mirov bê navber li wateya tiştan, li wateya jiyan û hebûnê digere. Kodên xwezayê, raz û esrarên jiyanê dinase û navekê li lêgerîn û lêpirsînên xwe dike. Hêza mirov bi hikûmraniya wî ya li ser tiştan ve girêdayî ye û zanyariyên wî ya li ser tiştan çendî kaîm û qewî be mirov ewçend xurt e. Felsefe daxwaza zeftkirina mirov ya li ser zannyarî û zanistê hez û mereqa wî/wê ya digel gumanbariyê ye. Jiyan bi pirsê destpê dike. Pirs bersîvê bersiv heqîqetê diafirîne. Ew bazina ku mirov li dor xelekên rastiyê digerîne ji alîyê dî ve mija gumanê zédetir dike û rê li ber felsefeyê vedike. Ji ber ko felsefe pirs û pirsgirêkên bi giştî mirovî eleqedar dike weke mijar hildibêjere û ravekirina van kêşeyan weke problemeke sereke dibîne. Ji ber ko temenê mirov bi wextî ve girêdayî ye û heta îro kesê şerbeta nemiriyê venexwariye hebûn û ti (nebûna) mirov weke êşeke bê dawî serê mirov diêşine. Mirov ji kû hatiye û ber bi kû ve diçe.Jiyan li kû despêdike û li kû diqede. Piştî mirina fîzîkî cîhanek dî ya mirov xwe lê vejîne heye an nîne? Pirs pirsê bersiv pêdiviya felsefeyê ferz dike.

Di gelek ol û bawerîyan de zanyariyên pîroz, tekstên dernîqaş hene ku mirov nikare gumanê bibe ser rastî û xeletiya wan. Lê ji bo felsefeyê tişta herî pîroz pirs bixwe ye û di felsefeyê de pirsa neyê kirin tişta guman jê neyê birin nîn e. Mirov qadir e her tiştî bi eqil û felsefeyê bikêşe û bipîve. Mija li ser zanyariyan heta ko neyê rakirin û heta ko sînorên raz û nepeniyan neyê bezandin heqîqet nayê kifş kirin. Felsefe vekolîna hiş û mejî, gumanbariya digel hemî pergal û rastiyên damezirandiye. Her wisa guman dikare bibe egera ruxandina hemî ezber, kevneşopî û pergalên dîrokî. Felsefe pirs e, guman e û tevger û daxwaza guhertinê ye û meşek bê dawî ye.

**Ali Bayram**
27.02.2016

**Pêdiviya Felsefeyê**
**Çetoyê Zêdo**

Bi ya min, malkambaxiyeke xedar e ku mirov pêdiviya ‘ez’ a xwe bi ‘em’ ê ve girê bide. Ez ne bawer im ku yek derkeve û bibêje ‘pêdiviya me’ bi felsefê tuneye! Pêdiviyên kurdan ewqas zêde û bi teşqele ne ku, mirov nizane kîjan berî kîjanê pêdivîtir e.

Felsefe jî weke hunerê bi ‘ez’ a mirov ve girêdayî ye, ya ku wê bi civakê dide qebûlkirin ‘em’ a wê ye û ev ji bo hemû jiyanê wiha ye, pêşî bi raman û xwestina şexsî dest pê dike û ji bo piştgiriya ‘civakê’ tê ko-kirin, an jî tê veguhestin. Ku ne wiha be nabe ya kesekî û nabe ya me jî, bi vî hawî jî ewê di tenêtiya xwe de her û her bimîne, ji bo wê ye ku ‘estetîk’ dikeve navbera ez û em ê.

Ji bilî van hemû tiştan, dema ku mirov bi kurmancî li jiyanê binêre, an bixwaze xwe û civaka xwe nas bike, pirs ewqas zêde dibin ku mirov nema dizane ji ku hatiye ber bi ku ve. A xerab û xedar ew e ku di rewşa niha de ji bo ramaneke ‘kurmancî’ her tim mirov li ‘destpêkan’ diqeside, dixwaze xwe li destpêkekê bi cî bike, fam bike an bipirse. Weke vê pirsa ‘pêdiviya felsefê’; ma pêdiviya kurda bi çi tuneye? Ne tene bi serxwebûn an jî bi xweseriyê, bi hemû huner û zanînê heye.

Derd û kul ne yek e ne dudo ne…
Xwezî bi dilê wan kesên ku serê xwe bi mijarên giştî naêşînin û yên li xwe naheyirin. Nezanîn mirov ji berpirsyariyê xelas dike, pêdiviyekê danayne ber kesan. Her roj bi kuştinê, kavilbûnê dor li ramana kurdî teng dibe, naxwazim vêya zêde dirêj bikim, ji xwe weke her kesê ku bîr dibe, rewşa malkambaxiyê li ber çava ye…
Di vê rewşê de bi ya min divê mirov motîvasyonên din ji xwe re peyde bike ku bikaribe bi huner û zanîne dakeve.
Ji wan tiştên ku şaş tê zanîn yek jê jî, piranîya çi xwende, çi rewşenbîr an çi hunermend û nivîskaran ew e ku, berê wan ne li

erdinîgarî û raboriya wan in, an jî berê wan ne li hevtayê wan in. Her çiqas weke gelek tiştan li Bakur nû tê dîtin-zanîn, piştî hinek lêkolînan tê dîtin ku li Başûr berî 40-50 salî dest pê kiriye. Ev ji bo felsefê jî wiha ye, bi ya min divê kesên ku serê xwe bi felsefê re diêşînin bala xwe xweş bidin serboriya Başûr û tecrubeyên wan û yên hevtayê xwe, divê mirov hesabê yên beriya xwe û yê nifşê xwe jî bike, ne ku mirov weke 'nexweşiyekê' ji xwe û dora xwe pê ve nehesibîne. Baş an xerab, zanîn û hunereke bi kurdî divê ewil di paxila her 'felsefavanekî' de cihê xwe girtibe an bigire ku piştre mirov ber bi gerdûniyê ve hewl bide.

Felsefe ne tenê bi dîroka Felsefeya Ewrûpî ku bi ravekirina kurdî were kirin, bi hiş û ramanê hemû kelepora cihanî ya felsefê ji bo îro di rewşenbirîya civaka kurdî de, ji bilî 'agahiyên wikipedia' weke rengekî ramanê bikaribe bi kurdî jî hebe. Bi zanîna zimên tenê, felsefeyeke bi kurdî helbet wê ji neqilkirin an jî ji dubarekirinê nikaribe xwe xelas bike. Di serdema îro de hemû zanyarî ji kurdî re vekiriye, mesele ew e ku kesê ku bikaribe mesaiyekê lê xerc bike.

Pêşî xwemaliya ramana zimanê kurdî, di hişê mirovên kurd de serdest û zelal be, pişt re ji xwe ew ê felsefeya min û te û me hemûyan jî wê bibe xwedîkarakter û ciyawaz.

Xwedê yardimciyê felsefevanan be, bi xweziya ku wê roja ku me dilê xwe bijand halê wan…

**Çetoyê Zêdo**

05.03.2016

## Ziman, Huner û Felsefe

### Felsefe çi ye?

Di dîroka mirovahiyê de felsefe, hezkirina ji zanebûnê û di heman demê de, navê hunera fêrbûnê ye. Cudahiya di navbera ajal û mirovî, destpêka felsefeyê ye. Felsefe bi fikirandinê re ketiye jiyana mirov û tişta mirov û ajalan ji hev cuda kiriye jî felsefe ye. Ji bo ku kesayetî ji zanebûnê hez bike, pêdivî bi fikirandinê heye. Fikirandin destpêka afirandinê ye. Kesên ku di şibakeya felsefeyê de li mijar û bûyeran binihêre, bi mantiq nêzîkî mijar û bûyeran dibe, kesên ku di felsefeyê de têgihiştî nebin jî, bi kelecanê reaksiyon nîşanî bûyer û mijaran didin. Loma jî; ji bo jiyaneke maqûl û pêşeroja mirovahiyê, pêdiviya mirov bi felsefeyê heye.

### Huner û Felsefe

Di Felsefeyê de, tişta herî sereke ziman e. Ez dixwazim balê bikşînim ser ziman û hunera kurdî. Û dîsa, ez ê ji Omer Xeyam, ji Nietzsche û ji dengbêjiya kurdî hinek mînakan bibim û li ser mijara ziman, huner û girêdana wan a bi felsefeyê re rawestim. Serkeftina Xeyam ya afirandina hunera wî, di heman demê de, a di warê zimanê wî de jî, xwe rave dike û bi qasî hunera wî, zimanê wî jî serkeftî bûye. Mînak:

*‘Xweş qedeh e, aqil jê re li çepikan dide*

*Radimûse û bi sedan maç li rûyan dide*

*Ax ji destê cerçêkerê ku bi ked û xebat;*

*Wan çêdike û dîsa radike û li erdê dide’*

Omer Xeyam di çarinên xwe de serkeftina xwe a ziman jî, bi qasî hunera xwe li ber çavên mirov radixe.

Em çawa zimên wekî amûra di navbera felsefe û hunerê de dibînin, Nietzsche jî, çakûçê destê pêykêrvan, wekî amûra navbera huner û felsefeyê bi nav dike. Disa Dengbêj Şakiro û gelek Dengbêjên kurd, di kilamên xwe de serkeftina xwe a di warê ziman de, wekî Omer Xeyam li ber çavan radixin û di kilamên xwe de zimên orgazm dikin û wekî hespeke kihêl radikin çar nalan û dibezîn in. Di navbera dengbêjiya kurdî û hunermendiya kurdî a modern de, bi qasî çiya û baniyan cudahiyeke ji hev dûr heye û ev jî mînaka ku me li jor dabû û rûmeta ziman a di navbera hûner û felsefeyeyê de sererast dike û hêzdartir dike.

*Mînak:*

*'Tu nizanî ez Xezal im,*

*xezala Egîd im,*

*gerdena min zer e,*

*çepilên min dirêj e,*

*porê min kej e,*

*nava min qendîl e,*

*zenda min bi bazin e,*

*tiliya min bi gustîl e,*

*lêva min tenik e,*

*pozê min bi qerefîl e,*

*sî û sê gulî li ser bejna min a tenik û zirav bûne çît e.*

*Dêrisê gundê me de bist û çar eşîr in,*

*loooo loo yooo lo Sekvano,*

*tu nizanî sev xatirê çav û birûyên  min,*

*yên reş û belek ketine dawê,*

*ocax koro bist û çar serî sekvanoooooo...*

*Egîdo sibehe tu nizanî sev xatirê çav û birûyên min, yên reş û belek ketine dewê,*

*heywax li minê, bîst û çar serî, de looooo lo sekvano, biçûko, xeşîmo, nezano lo nijdevano' ....*

Hunera ji Felsefeyê dûr.! Bişaftina li ser zimanê kurdî û jiyana hunermendên kurd, ên vê dema em tê de dijîn, ku bi zimanê serdestan rojane dijîn û qaşo 'hunera' kurdî diafirîn in, dişibe Hespê bê Zîn û Zengî, bê Hevsar û Gem, bê Teng û Bêleme. Ev tişt jî, nîşana hunara bêfelsefe ye. Ez sebebê vê hunera bêfelsefe, wekî dûrbûna ji ziman bi nav dikim.

'Tişt hene, bi qasî tiştên, di hundirê tiştan de.'

**Xakî Bîngol**

06.04.2016

<u>**Civaknasî**</u>

<u>**Prensîp û Unsûrên Bingehîn Yên Demokrasiyê**</u>

1) **Serwerîya Gel**: Yên rêveber, nûnerên gel in ku ji aliyê gel ve; bi îradeyeka serbest, hatine hilbijartin. Dema ku gel xizmeta nûnerên xwe neecêbîne, dikare wan ji karê rêveberiyê dûr bike.
2) **Wekhevî**: Di demokrasiyan de; hemû hemwelatî, li hemberî zagonan xwediyê mafên wekhev in. Tu kes, kom yan jî komik; ne xwediyê îmtîyaza ne.
3) **Serbestî**: Di demokrasiyan de; şexs, xwediyê maf û azadiyên ku di makezagon û zagonan de hatiye nivîsandin in. Bi awayekî azad bikaranîna wan mafan, di bin parastina dewletê de ye. Serbestiya hilbijartin û hilbijêrînê, ragihan, geşt, karkirin, raman, îbadet û hwd.
4) **Cudahiya Hêzan (Cudahiya Erkan)**: Di prensîpa cudahiya erkan de, erkên zagonçêkirin, rêvebirin û darazdanînê, ji aliyê livokên cuda ve tê cîbicîanîn. Mesela li Tirkiyeyê hêza zagonçêkirinê di destê meclîsê de ye, erka *(hêza)* rêveberiyê ya hiqûmetê ye û darazdanîn jî, erka dadgeha ye. *(Dadgeha Makezagonê, Dadgehên Darazdanînê yên cihêreng û hwd.)*
5) **Hilbijartin**: Di hilbijartinên ku di demên kifşkirî de pêk tên de, armanc hilbijartina nûnera ye, ku wê piştra ev nûner di livokên zagonçêkirinê de cîh bigrin û wê hiqûmetê ava bikin.
6) **Partiyên Siyasî**: Partiyên siyasî, saziyên birêxistî yên ku ji aliyê şexsan ve bi armanca çareserkirina pirsgirêkên welat û gel, hatine damezrandin in, ku xwediyê bernameyekî ne û endamên wê, li gor vê bernameyê tevdigerin.
7) **Rêxistinên Civaka Siwîl:** Di civakê de komên cihêreng yên kar û pîşeyî xwe birêxistî dikin û ji bo parastin û berfirehkirina mafên xwe, bi awayekî rêxistî tevdigerin û çalakiyan pêk tînin. Ji van rêxistinan re, rêxistinên civaka siwîl tê gotin. Mînak: Sendîqe, komele, kooperatîf, baro û hwd.

8) **Çapemenî (Medya)**: Çapemenî, di demokrasîyan de xwediyê roleka girîng e. Gel, bi riya çapemeniyê mafê xwe yê ragihandin û beşdarbûna pêvajoyên demokratîk, bikartîne. Herweha mirov dikare bibêje ku di pêkhatîna bîrûraya giştî de, rolê çapemeniyê gelekî girîng e. Ji ber vê taybetmendya xwe çapemenî, di civakê de wekî 'Hêza Çaremîn' tê dîtin.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
15.04.2016

**Çavkanî: Destpêka Zanista Civaknasiyê – Ali Gurdilî**

**Zanistên Din û Psîkolojî**

Zanistek bi serê xwe tenê, beyî ku bi zanistên din re bikeve hevkariyeke, nikare bûyer û kirûyên ku li wan vedikole rohnî bike. Bi taybetî jî, ji bo zanisteke weke psîkolojiyê meriv dikare bibêje ku ev yek, ne pêkan e. Psîkolojî, ji bo misogerkirin û peyîtandina encamên xwe û ji bo qontrolkirina wan, pedivî bi hevkariya zanistên wekî îstatîstîk û matematîkê dibîne. Ji bilî vê yekê psîkolojî, ji bo têgihiştina çewtiyên sehekî, mecbûr e ku bi zanista fizîkê re jî hevkariyê bike. Mesela: carinan dema ku şewq li berdaxeke me ya çayê dide, kevçiyê ku di nava berdaxê de ye; mirov dibêje ku qey ew xwar e, yan jî şikestiye. Lê em pê dizanin ku ew kevçî ne şikestiye, bi tenê sehekên me wisa me dixapînin û kevçiya di berdaxê de, bi me wisa didin xwiyakirin. Ji bo têgihiştin *(şirovekirina)* vê bûyerê jî, pêdiviya psikolojiyê, bi optîkê *(fizîkê)* heye. Ji bo şirovekirina bandûra avzêya derûnî ya li ser tevgerên mirovî, psîkolojî hewcedarê bîyolojiyê ye û bêgav e ku hevkariyê pêre bike. Herweha ji bo zelalkirin *(şirovekirina)* têkiliyên mirovan yên bi mirovên din û dorhêla xwe re ku organîzmayeke zindî ye, pêdivî bi bîyolojiyê heye. Dîsa wek vê yekê; psîkolojî bêgav e ku bi zanistên din, yên ku babeta wan jî mirov in re hevkariye bike. Zanistên, weke zanistên sosyal yan jî em bibêjin zanistên civakî. Ji bo têgihiştin/şirovekirina tevgerên mirovan yên civakî, ku mirov ji adet, kevneşop, bawerî û helwestên civaka xwe ketumet dibe; pêdiviya psîkolojiyê bi zanista sosyolojiyê heye. Mirov di heman demê de, çalakiyên ekonomîk jî pêk tîne. Hildibirîne, serf dike û parve dike. Ji bo têgihiştina bandûra van têkiliyan ya li ser tevgerên mirovan, psîkolojî divê bi zanista ekonomiyê re jî bikeve nav têkîliyan *(danûstandinan)*.Psîkolojî carinan, dixwaze ku serî li jiyana mirovên berê jî bide û ji bo vê yekê, carinan serî li zanista antropolojiyê jî dide.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
**Çavkanî: Destpêka Zanista Psîkolojiyê**

## FERHENGOKA FELSEFEYÊ (06)

**1- Felsefeya Fizîkê:** Bineşxeka felsefeyê ye û li pirsgirêkên bingehîn yên fizîka nûjen de hene vedikole û li made û vejenê *(enerjî)* hûr dibe, ye. Pirsên wê yên sereke li ser wusat, dem û perçe û piçika *(partîkul)* ye. Herweha li ser kozmolojî *(zanista gerdûnê)*, mekanîka kuantum, mekanîka îstatistîkî, bandûr û bertek, determinîzm, xwezaya zagonên fizîkî jî radiweste û bi awayekî rexnegir nêzîkî wan mijaran dibe. Di roja me ya îroyîn de felsefeya fizîkê, bineşaxa herî girîng ya felsefeya zanistê ye.
ing: philosophy of physics
fr: philosophie de la physique
tr: fizik felsefesi

**2- Felsefeya Hemdem:** Felsefeya ku di sedsala 19an de dest pê kiriye û heta roja me ya îroyîn hatiye. Wisa tê pejirandin ku Felsefeya Hemdem, piştî felişandin û belavkirina, spekulasyona mengîwer dest pê kiriye. Ev felsefe wiha dixwaze ku xwe berde kûrahiya mirovê girgîn, jiyana wî/wê ya dîrokî û hemû hêla jiyanê. Serdema Navîn, <*Xwedê*> û mengîweriya *(îdealîzma)* Serdema Nû jî, tîn *(zêhn û aqil)* û ramanê derxistibû ser text. Felsefeya Hemdem, tîn û ramanê ji text tîne xwar. Çimkî ev herdu têgeh jî, encax di fenomenên jîyana mirovî de dikarin werin dîtin. Tîn û raman avahiyên raser in ku di her çandê de bi fesaleke *(şekleke)* cihêreng dertêne holê û dengvedanên jiyana mirovî ne. Îdeyeka *(ramaneka)* ku serwerê hemû mirovahiyê ye, tune. Di dewsa aqlekî gerdûnî de, sîstemên metafizikî hene; ku bûne wesfên xwerû yên kulturên cihêreng. Di dawiyê de bi kurtî mirovî dikare bibêje ku, felsefeya serdema me ev e: Weke hemû fenomenên *(bûyerên)* kulturê, felsefe jî hilbereke <*watedayînên mirovî*> ye û ji bo hêşinbûna wê, axa herî baş modela civaka pluralîst e, civaka piranîperêst e.
ing: contemporary philosophy
fr: philosophie contemporaine
tr: çağdaş felsefe

**3- Felsefeya Alman:** Felsefeya alman, ji felsefeya feylesofên alman û kevneşopiya felsefeya alman a ku di dawiya sedsala 18an dest pê kiriye û ji destpêka sedsala 19an ve jî, giraniya wê zêdetir hatiye hîskirin re tê gotin. Lewma jî, nabe ku em vê têgehê bi tenê ji bo komeka feylesofên alman bikar bînin. Dema em dibêjin felsefeya alman, mexseda ma ya pêşîn îdealîzma alman a klasîk e, lêbelê em dizanin ku felsefeya alman ne tenê ev felsefe ye û ekolên dijber yên vê felsefeyê jî derketine holê. Di loda felsefeya alman de feylesofên mîna Leibniz, Friedrich Schelling, Johann Gottlieb Fichte, Kant, Hegel, Feuerbach, Marks, Arthur Schopenhauer, Nietzsche û Karl Jaspers hene û hinekên wan îdealîst, hinekên wan materyalîst, sansualîst *(sehekparêz),* aqilparêz *(rasyonalîst)* û yan jî ezmûnger in. Felsefeya alman ya klasîk, bi navê îdealîzma alman tê naskirin û di navenda vê felsefeyê de, feylesofên mîna Kant û Hegel hene. Li milê din feylesofên mîna Feuerbach jî ku wekî materyalîstên klasîk têne dîtin jî, di loda vê felsefeyê de têne nirxandin. Ev tevgera xurt ya felsefeyê, di destpêka sedsala 20an de xwe daye paş, lêbelê dîsa jî meriv dikare bibêje ku feylesofên navdar yên wekî Edmund Husserl, Martin Heidegger û Hannah Arendtî gihandiye, ku ew bi xwe jî feylesofên navdar yên heyînparêz û fenomenolojiyê ne. Dîsa di sedsala 20an de Dibistana Frankfurtê derkete holê û piştre jî feylesofên Max Horkheimer, Theodor W. Adorno, Herbert Marcuse û Habermas, wekî şopgerên vê felsefeyê hatin dîtin.
ing: german philosophy
fr: philosophie allemande
tr: alman felsefesi

**4- Felsefeya Dîrokê:** Peyva *'Felsefeya Dîrokê'* girêdayê peyva *'Dîrokê'* tê du wateyan. Peyva *'Dîrokê'* hem kirû û bûyerên civakî yên rabirdûyê û hem jî, zanista ku li vê jiyana derbasbûyî digere de tê bikaranîn. Hinek fîlozofan, ji demeka gellek kevin ve cudatiyekî xistina navbera herdu peyvan *(wateyan)* û xebatên xwe wiha pêk anîne. Ji bo dîroka mirovî û civakî a rabirdûyê, peyva

*'resgestae'* û ji bo zanista ku li van bûyeran vedikole jî, peyva *'historia rerum gestarum'* bikar anîne. Lê dîsa jî mirov dikare bibêje ku pirranîya fîlozofan ji bo herdu wateyan ku me li jor qala wan kir, peyva *'historia-dîrok'* bikar anîne. Di roja me de jî, bi herdu wateyan jî tê bikaranîn.

*Girêdayê wateya peyva dîrokê; ji felsefeya dîrokê jî, mirov têdigihêje du tiştan:*

***1-*** *Felsefeya Dîrokê, a ku li rabirdûya hatiye jîyin vedikole.*

***2-*** *Felsefeya Zanista Dîrokê.*

Di wateya xwe ya yekemîn de, felsefeya dîrokê bi lêpirsîna wateya bûyerên rabirdûyê dest pê dike û ber bi hemû jiyana mirovahiyê, ya derbasbûyî ve diqeside. Ango, mirov dikare weke xebateke felsefî ya ku ber bi <*dîroka dinyayê*> ve qesidiye jî lê mêze bike.

Ev xebat *(kar yan jî mijûlahî)* dikare heta bidestxistina nêrîneka berfireh/bergehdar ya ku dixwaze hemû dîroka mirovahiyê fêr bibe û di vî warî de felsefeyeka sîstematîk ava bike jî, here. Di wateya duyemîn de jî felsefeya dîrokê, li zanista dîrokê û rê û rêbazên dîrokzanan vedikole, rexne li hêman û rêbazên zanista dîrokê digre, li ser wesfên zanayiyên dîrokî û dibetiya wan dahûrandinan, radiweste. Bi kurtasî, mirov dikare bibêje ku felsefeya zanista dîrokê; rexnekirina zanayiya dîrokî ye. Bi wateya xwe ya duyemîn bingeha felsefeya dîrokê, ango bingeha felsefeya zanista dîrokê; digihêje beriya hezar salan. Lê wekî disîpleneka felsefeyê, ew encax di sedsala 19 an de derketiye holê. Zanista dîrokê ya ku bi xebatên *Xwendegeha Dîrokê ya Alman* re gellekî berfireh bûye, ku ev xwendegeh girêdayê fîlozofê *Herder* ma ye; ber bi dawiya sedsalê ve, bi taybetî jî di dema xebatên *W. Diltey* yên hîmdarkirina <*zanistên manewî*> de, bi awayekî pirr dijwar hatiye rexnekirin û *Dilteyî,* wisa xwestiye ku zanistên manewî, li gor mînaka *Xwendega Dîrokê ya Alman*, hîmdar bike. Ji wê rojê ve, mirov dikare bibêje ku felsefeya zanista dîrokê wekî felsefeyekê hatiye avakirin û berfireh bûye. Lê bi rastî mirov dikare herdu felsefeyan ji hevdu veqetîne, çimku herdu felsefe ber bi hêlên cihêreng ve diqesidin. *Ya yekemîn*, li hemberî hemû rabirdûyê

felsefeya ku ji aliyê fîlozofan ve, di bin nêrînek gelemperî de tê pêkanîn e. *Ya duyemîn* jî, felsefeya zanistekî û rexnekirina metodolojiya wê ye. Lê dîsa jî ev herdu felsefe, bi awayekî jidyayî; bi hevdu re girêdayî ne.

Ev yek eşkere ye ku herdu berbiçûn jî, hewcedarê <*hêza pêzanîna*> bûyerên dîrokî ne. Heke rawêjeke *(ferazîyeke)* wiha tune be, wê demê sedemê hebûna wan *(ya herdu felsefeyan)* wê ji holê rabe. Dîsa di wateya yekemîn de dîroka felsefeyê, ango felsefeya rabirdûye; mirov dikare bibêje ku bi awayekî gelemperî rahijmendiyeke şirovekirina <*hemû mirovahiyê*> ye. Felsefeya dîrokê ya ji celeba duyemîn jî, ango felsefeya zanista dîrokê jî li hember zanista dîrokê; di helwestek septîk *(gumanker)* de ye. Felsefeya zanista dîrokê, daneheva xwe axlebî ji <*raveyên dîrokî yên felsefî û gelemper*> yên fîlozofan girtiye. Lewma jî, di navbera herdu celeb felsefeyan de girêdanek bivênevê heye û wiha dixweyî ku wê ev girêdan berdewam jî bike. Li hêla din jî em dibînin ku felsefeya zanista dîrokê, her ku diçe qada vekolanên xwe berfirehtir dike û ji ber vê berfirehkirinê jî, rexneyên dijwar li felsefeya dîrokê *(felsefeya rabirdûyê)* digre. Lê dîsa jî em dikarin bibêjin ku felsefeya dîrokê *(rabirdûyê)* weke berê berdewam kiriye. Li gor baweriya min; sedemê vê yekê jî jênegera mirovan ya lêgerîna wateya rabirdû û siberojê ye. Wekî ku *Kant* jî dibeje: <*ji bo mirovan pirs û lêgerîna bersiva pirsan, du mijarên jêneger in.*> Mirov di nav sêbareya rabirdû-dema niha-sibêrojê de, tê dîtin ku hewldana dîtina bersiva pirsên <*em ji kû hatin, niha li kû ne û ber bi kû ve diçin?*> her berdewam kiriye.

Dema ku em bi çavekî sade lê mêze bikin, helwdana dîtina bersiva beşa yekemîn *(em ji kû hatine?)* berdewam bike jî, mixabin têrbersiveke ku em bikaribin ji beşa duyemîn re *(em ber bi kû ve diçin?)* bibînin, tune.

*Li gor vegotineke din jî:* Felsefeya Dîrokê, beriya her tiştî li zagonên ku bûne sedemê pêşveçûna şarîstanî û pêşketina dîrokê vedikole û li ser wateya guherînê û siberoja mirovahiyê, ramanan pêşkêş

dike. Herweha, hewl dide ku qodên kulturî yên ku aîdê medeniyet û mirovahiyêne jî, destnîşan bike.
*Ji vê hêlê ve jî Felsefeya Dîrokê dibe sê beş:*
***1-** Felsefeya Dîrokê a Metafizîkî*
***2-** Felsefeya Dîrokê a Şexsparêz*
***3-** Felsefeya Dîrokê a Diyalektîk.*
*Li gorî Felsefeya Dîrokê a Metafizîkî: Dîroka mirovan, bi îradeya xwedê pêk tê. Xwedê wiha xwestiye û ev yek, bûye dîrok û wê her dem, ev yek wiha be. Li gor Felsefeya Dîrokê a Şexsparêz: Dîrok ji layê şexsên mezin, ramanwer û serokên xwedîbandor ve tê birêvebirin û ji ramaneka bi vî rengî, dest pê dike.*
*Li gor Felsefeya Dîrokê a Dîyalektîk: Ramana <dîrok, ji aliyê civakên ku bi têkiliyên hilberandinê têne destnîşankirin tê birêvebirin.> Serwer e.*
Hasilê mirov dikare bibêje ku rastqîniyên dîrokî, girêdayê îfadekirina rasteqîniya ne. Kirûya rasteqîniyê jî, li gorî avahiya bûyer, war û demê, şekil digre.
ing: philosophy of history
fr: philosophie de l’histoire
tr: tarih felsefesi

**5- Felsefeya Îslamê:** Dema ku meriv, rûbirûkirinekê banegehî <*surface*> çêbike; wê demê mirov bi hêsanî dikare bibêje ku felsefeya îslamê jî, mîna felsefeya xiristiyaniyê *skolastîk* e û bêguman, di navbera wan de çend xalên hevpar jî hene. Belam, felsefeya îslamê di nava medeniyeta îslamê de derketiye û li gorî felsefeya xwe, xwerû ye. Lê ev felsefe, ji rûyê çend astengiyan bi dinyayê re têkiliya xwe birrî ye û xwe xistiye nav ramaneka skolastîk; têde maye û ev raman, bûye xwendegeh. Belam pirsgirêkên ramanwerên cîhana îslamî, ji pirsgirêkên skolastîkê cuda ne. Dema ku em li rojavaya nûjen dinihêrin, em dibînin ku ramana pêşketinê giraniya xwe zêdetir nîşan dide. Ango hest û ramana çêbûnê, pêşdetir e. Ramana rojavayê, li ser pêşketina dinyayê û li ser şeklê guherînê rawestiya ye. Lewra, ramana rojavayê a bingehîn; li ser pirsa zanayiyê digere da ku bizanibe ev

zanayî ji ku tên û sînorên vê zanayiyê, çî ne? Beguman di ramana rojava de, têgeha zanayiyê li pêş e.

*Di felsefeya îslamê de:*

***A-** Ramaneka bêform, bêtevger û neguhor; ezelî û ebedî ye.*

***B-** Pirsa herî mezin, <Gelo, di navbera Xwedê û ebdên wî de danûsitandineke çawa heye?> ye. Ev pirs jî, me dibe pirsa; <gelo mirov xwedîsemax in, yanê na?> û <Mirov, azad in yanê na?>*

***C-** Xwestekên mirovan, arîşa jiyanê, rastî û çewtî û riya jiyaneke rast, li gorî ramana îslamî têne ravekirin. Lewma jî, di di ramana îslamî de, guftegoya ol û ehlaqê zêdetir derketiye pêş.*

ing: islamic philosophy
fr: philosophie islamique
tr: islam felsefesi

**6- Felsefeya Jiyanê**: Di nav sîstema tevayî de, rola aqil û zêhna mirovan, girîng tê dîtin. Ev felsefe li hemberî felsefeyên ku <*mirovan*> ji bîra kirine; jiyana berbiçav *(girgîn)* ya mirovan, armanca jiyana wan, nirx û wateya jiyana wan derdixe pêş û li pirs û pirsgirêkên bi vî rengî vedikole.

ing: philosophy of life
fr: philosophie de la vie
tr: yaşam felsefesi

**7- Felsefeya Kulturê (Felsefeya Çandê):** Felsefeya kulturê, bineşaxeke felsefeyê ye û bi awayekî giştî li cewher, hilik, avahî û berfirehbûna kulturê vedikole. Meriv dikare bibêje ku hinek mijarên *(qadên)* vê felsefeyê û felsefeya dîrokê, hevpar in. Herçuqasî binavkirina navê felsefeya kulturê nû be jî, xebatên li ser vê mijarê di dema feylesofên beriya Sokrates de jî, hatine dîtin. Helwesta cudakirina yên xwezayî û derxwezayî, ku wê demê li cem sofîstan hatibû dîtin, wekî destpêka vê çalakiyê *(rahişmendiyê)* tê dîtin û pejirandin.

Ligel vê yekê, felsefeya kulturê di felsefeya sedsala 18an de, digihêje wateya xwe ya esasî. Di sîstematîzekirina vê felsefeyê de,

bêguman rola Dilthey gellekî mezin e. Li cem feylesofên wekî Rousseau jî, ev felsefe vediguhere rexnekirina kulturê û redda wê. Bi Nietzsche re, ev qesidîn berfirehtir dibe.
ing: Philosophy of culture
fr: Philosophie de la culture
tr: kültür felsefesi

**8- Felsefeya Mantiqê:** Armanca felsefeya mantiqê ew e ku bi wateya mantiqê, prensîb û spartekên mantiqê bizanibe û li ser hindek pirsgirêkên mantiqê yên têgehî *(têgînî)* hûr bibe ku wekî bingeh û xîmê mantiqê xwiya dikin, wan zelal û eşkere bike. Armanca felsefeya zanistê jî, li vekolandina avahiya zanistê ya zimanî ye, rexnekirin û têgihîştina wê ye. Zanist û mantiq, bi hev re hewl didin da ku rêya fikirîn û tiştên ku têne fikirîn, rast werin vegotin. Ji bo vê çendê jî hewl didine xwe, da ku bikaribin delkên *(zagonên)* fesalî û *zimnî (navxweyî)* yên fikirînê raxin holê. Bi vê yekê re jî, riya bidestxistina zanayiya rast, tê vekirin. Felsefe jî ji mantiqê, ji bo bidestxistina zanayiya heyînê sûd werdigre, di vê xalê de jê sûd werdigire. Ji bo vê yekê jî felsefe, awayên fikirînê yên mantiqî bikar tîne. Felsefe, bi naveroka ramanê re mijûl dibe û di vê navberê de mantiqê jî ji xwe re dike mijar.
*Çend pirsgirêkên (pirsên) felsefeya mantiqê yên Sereke*
*Felsefeya mantiqê, li çavkaniya hêmanên/prensîbên mantiqê û naveroka têgeha mantiqê vedikole. Di heman demê de, dest diavêje pirsgirêkên ku bi mantiqê re dertên holê jî...*
***1-*** *Pirsgirêkên ku bi têgeha mantiq û derbasdariyê re têkildar in.*
***2-*** *Pirsgirêkên ku bi têgeha neguhêrbara mantiqê re têkildar in.*
***3-*** *Nirxa rastiyê û pirsgirêkên, ku bi têgeha mantiqê re têkildar in.*
***4-*** *Pirsgirêkên ku bi hêmanên mantiqê re têkildar in.*
*Pirsgirêkên ku bi têgeha mantiqê re têkildar in.*
Bersivên cihêreng ku ji bo <*mantiq çi ye?*> têne dayîn, du pirsgirêkên cihêreng derxistine holê.
**1-** Gelo mantiq disiplineka felsefeyê ye, yan zanistek e?

**2-** Jiber ku bingeha fikirîna rast xwe dispêre daxuyandinên aqlî yên derbasdar, pirsgirêka *derbasdarî çi ye?* dertê holê. Jiber ku derbasdarî girêdayê neguhêrbarên mantiqê ye, neguhêrbarên mantiqê jî pirsgirêkekê cihêreng derdixe holê. Jiber ku texlîdên deranê *(çikarimê)* yên cihêreng, di heman demê de neguhêrbarên mantiqê ne jî, mirov dikare ji bo venihêrtina *(kontrolkirina)* her cure deranê, sîstemeka cihêreng ya mantiqê ava bike. Hebûna cureyên cihêreng yên mantiqê jî, dikare rê li yekîtiya ku di mantiqê de heye veke. Di vê xalê de tiştê ku ji felsefeya mantiqê tê xwestin ew e ku di derheqê hêmanên bingehîn yên mantiqê de bi awayekî aqilane û rexnekar tevbigere, lêbikole û di vê babetê de hilbijartinên herî amizger biafirîne.

*Pirsgirêkên têkildarê têgeha heyîn û nirxa rastiyê:*

Mantiq, bi naveroka deran û pêşniyaran re mijûl nabe. Bala mantiqê mirov dikare bibêje ku herdem li ser lewnê *(şeklê)* deran û pêşniyara ye. Rastiya naverokê, rastiya zanayiyê û rastiya lewnî-fesalî jî, rastiya mantiqê pêk tîne. Rastiya mantiqê, bi sepandina *(cîbicîanîna)* hêmanên *(prensîpên)* mantiqê, dertê holê. Pêşniyarên mantiqî divê ne pêşniyarên nakok bin. Heke pêşniyara mantiqî ne xwediyê rastiyekê be yan jî deran nakok be, wê demê wê ji hêla naverokê ve jî çewt be. Hinek ramanwerên ku bi zanista heyînê re têkildar in, wiha parastine ku zagon û hêmanên, ku heyîn xwediyê wan e û zagon û hêmanên ku aqil xwediyê wan e, zanav *(wekehev)* in. Li gor vê yekê di navbera aqil û heyînê de, amizgeriyek heye.

*Yên ku vê ramanê parastine, hêmanên mantiqê li heyînê wiha sepandine:*

***1-*** *Hêmana Zanaviyê: Her heyîn, zanavê xwe ye. Digel hemû guherîn û çêbûnan, di her heyîneke de hilikeka naguhêrbar heye.*

***2-*** *Hêmana Bênakokîtiyê: Tu heyîn di heman demê de nikare hem bibe wekexwe (xwe) û hem jî heyînek din. Tu heyîn di heman demê de nikare, hem hebe û hem jî tunebe.*

***3-*** *Negengaziya Rewşa Sêyemîn: Heyînek yan heye, yan jî tune. Rewşeka sêyemîn tune û ne pêkan (gengaze) jî.*

Ramanwerên Serdema Nû, li dijî vê nêrîna ku hêmanên heyînê û hêmanên mantiqê wek hevdu dibîne derketine û nerazîbûna xwe

anîna zimên. Ramanwerên Serdema Nû, gotine ku ji ber ku aqil ji sehekan xwe xwedî dike, têgînkirinên *(têgehkirinên)* me jî, herdem guhêrbar *(rolatîv)* in. Jiber vê yekê jî mantiq, divê ji wan hêmanan pêk were ku em bikaribin wan hêmanên hevgirî û derbasdariyê bikar bînin û riya rast ya fikirînê bidest bixin.

*Pirsgirêkên ku bi hêmanên mantiqê re têkildar in:*

**1-** *Hêmana mantiqê gelo herdem û li her derê hêmanek derbasdar û gerdûnî ye yan na?*

**2-** *Çavkaniya hêmana mantiqê çi ye?*

**3-** *Hêmanên mantiqê gelo ji zayîna mirov ve hene, yan ew bi riya-alîkariya ezmûn û çavdêriyan têne bidestxistin?*

**4-** *Gelo mirov dikare hêmanên mantiqê di heman demê de wekî hêmanên heyînê jî bipejirîne?*

Hêmana zanaviyê, ne tenê di sîstema mantiqê ya dunirxî *(iki değerli)* de, herweha di mantiqa pirnirxî *(çok değerli- ji du nirxa zêdetir)* de jî û di mantiqa heyînê de jî derbasdar e. Di roja me ya îroyîn de di vê babetê de pirsgirêka herî mezin, di mantiqê de man û nemana van hêmana ye. Ango, gelo wê ev hêman wekî hêmanên mantiqê bimînin yan dê nemînin?

ing: philosophy of logic
fr: philosophie de la logique
tr: mantık felsefesi

**9- Felsefeya Matematîkê:** Felsefeya matematîkê, binaşaxeke felsefeyê ye û dixwaze ku hewldanên têgihiştina matematîkê, bisenifîne. Pirsên wê yên sereke li ser matematîk û çavkaniya nesneyên ku mijara matematîkê ne, ye. Bi taybetî jî, li ser wesfên pêşniyara rast disekinin û lêvedikolin.

*Pirsên vê binaşaxê yên sereke ev in:*

*1- Çavkaniyên mijarên matematîkî çi ne?*

*2- Wateya nesneyeke matematîkî, bi çi re têkildar e?*

*3- Wesfa pêşniyareka matematîkî çi ye?*

*4- Têkiliya matematîk û mantiqê çi ye?*

*5- Di matematîkê de rola Hermeneuticparêzan çi ye?*

*6- Nesneya lêpirsîna matematîkî çi ye?*
*7- Taybetmendiyên mirovî, yên li pişt matematîkê çi ne?*
*8- Spehîtiya matematîkî çi ye?*
*9- Çavkanî û xwezaya rasteqîniya matematîkî çi ye?*
*10- Têkiliya cîhana matematîkî ya nedîtbar û cîhana materyal çi ye?*
Mijareke din a girîng jî, rasteqîniya teoriyeke matematîkî ye. Jiber ku matematîk ne ezmûnî ye û nikare were ezmûnkirin, li sebebên ku delîlên teoriyên matematîkî ne, tê gerîn. Matematîka ferasetxwaz ku ji aliyê Luitzen Brouwer ve hatiye damezrandin, mînakeke baş ya vê nêrînê ye. Matematîka Mantiqparêz jî, ji aliyê Bertrand Russell û Gottlob Frege ve hatiye parastin. Di felsefeya matematîkê de mijareke din a girîng jî, pirsgirêka misogeriya *(esehîbûna, vebiriya, teqeziya)* matematîkê ye. Li ser vê mijarê jî, xebatên matematîkzanê avusturyayî Kurt Godel, girîng têne dîtin.
ing: philosophy of mathematics
fr: philosophie des mathématiques
tr: matematik felsefesi

**10- Felsefeya Parzemînê:** Felsefeya parzemînê yan jî parzemînan, ji bo nasandina kevnoşopiyên felsefî yên sedsala 19 û 20an, ku li Ewropayê hatine dîtin tê bikaranîn. Di sedsala 20an de ji aliyê feylesofên ku zimanê wan ê dayê ingilizî ye, ji bo nêrîn û ramanên ku li derveyê felsefeya analîtîk *(dahûranî)* in, hatiye bikaranîn.
Felsefeya parzemînê felsefe û tevgerên mîna îdealîzma alman, fenomenolojî, heyînparêzî, binyatgerî, felsefeya postbinyatger, feminîzma fransî, teoriya rexneyî ya Dibistana Frankfurtê, Marksîzma Rojavayê û çend beşên teoriya psîkodînamîkê, dihundirî ne. Lêbelê, têgeha 'Felsefeya Parzemînê' ne ji bo nasandina cihêtiyên erdnîgarî, lê bêtir ji bo kevneşopîyeke felsefî û karîgeriyên wê kevnoşopiyê tê bikaranîn.
ing: continental philosophy
fr: philosophie continentale
tr: kıta felsefesi

**11- Felsefeya Rojava:** Felsefeya Rojavayê, dilêrîna rojavayî ya dîroka felsefeyê ye, ji Yewnana Antîk dest pê dike û heta roja me îroyîn berdewam dike. Cîhana rojavayê bi taybetî jî welatên Ewropayê, di sedsala 19an de dema ku dîroka felsefeyê nivîsandine, kevneşopiya xwe ramanê kategorîze kirine û vî navî lê kirine. Ev felsefe, ji Platon dest pê dike û heta roja me ya îroyîn didome. Li gor vê dilêrînê, li 'Rojhilat felsefe tune.'
Herçuqasî çanda Mezopotampa, Misira Antîk, Îran, Çîn û Hindê kevintir be jî û mirovên ku li van deveran jiyane xwediyê kevneşopiyên ramanî bin jî, Felsefeya Rojavayê ji Yewnana Antîk tê destpêkandin û yên mayî jî, nayên hesibandin. Rastî ew e ku Felsefeya Rojhilat, Hînd, Mezopotamya û Çînê, beriya Felsefeya Rojavayê dest pê kirine, di bin bandûra hev de mane û hebûnatiya xwe berdewam kirine. Lêbelê, Felsefeya Rojavayê naxwaze ku wan jî bihesibîne û helwesteke wuha nîşan dide. Pirtûkên felsefeyê jî, felsefeyê Beriya Zayînê di sala 500an de didin destpêkandin û felsefeya ku li erdnîgeriya rojavayê dest pê kiriye û heta roja me berdewam kiriye jî, wekî Felsefeya Rojavayê dinasînin. Meriv dikare feylesofên ku kevneşopiya Rojavayê pêk anîne wiha bihêjmêre: Herakleîtos, Pîsagor, Anaksagoras, Cîcero, Parmanîdes, Demokrîtos, Epîkuros, Sokrates, Platon, Arîstotales, Thomas Aquînas, Augustînus, Montaîgne, René Descartes, Francis Bacon, George Berkeley, David Hume, John Locke, Spinoza, Jean-Jacques Rousseau, Kant, Hegel, Marx, Arthur Schopenhauer, Friedrich Nietzsche, Henri Bergson, Bertrand Russell, Edmund Husserl, Ludwig Wittgenstein, Martin Heidegger, Hannah Arendt, Albert Camus, Maurice Merleau-Ponty, Jean-Paul Sartre, Simone de Bovaire, Theodor W. Adorno, Jacques Derrida, Willard Von Orman Quine û Karl Popper. Hinek bineşaxên Felsefeya Rojavayê jî ev in: Ciwannasî *(Estetîk)*, Etîk, Epîstemolojî *(Felsefeya Zanayiyê)*, Dîroka Felsefeyê, Mantiq, Metafelsefe, Metafizîk, Felsefeya Ziman, Felsefeya Matematîkê, Felsefeya Fizîkê, Felsefeya Ol, Felsefeya Dîrokê, Felsefeya Derûnnasiyê, Felsefeya Zanistê, Felsefeya Siyasetê û Felsefeya Nirxan.

ing: western philosophy
fr: philosophie occidentale
tr: batı felsefesi

**12- Felsefeya Rojhilat:** Mexseda bilêvkirina vê têgehê, kevneşopiya felsefeya ku li Hindîstan û Çînê dest pê kiriye, ye. Lêbelê, divê felsefeya Afrîkayê, Japon, Îslam, Îran û Mezopotamyayê jî, lê were zêdekirin. Felsefeya rojavayê dîroka xwe bi Antîk Yewnanê dide destpêkandin, bi raman û helwesteke oryantalîst, xwe dike xwediyê kevneşopiya ramana rasyonel û sîstematîk û xwe wuha jî dinasîne. Ramana rojhilat, di vê xalê de li derveyê felsefeyê tê dîtin û wekî kevneşopiyeke felsefî ya ku xwediyê gelek hêlên mîstîk, nepen û nîşaneyî ye tê nirxandin. Lêbelê, heke ev bandûr *(karîgerî)* û kok hebe jî, bilêvkirineke bi rengî; encax bi kategorîzekirina felsefeyê pêkan e. Ev dilêrî û têgihiştin jî, encax bi rêya xwenasandina felsefeya rojavayê dikare pêk were. Heçku ev herdû felsefe ligel hemû cihêrengiyên xwe, bandûrê li hev kirine û bi vî hawî, xwe gihandine roja me ya îroyîn. Di vê xalê de meriv dikare bibêje ku 'Rojhilat' hê beriya felsefeya rojavayê hebû û xwediyê naverokeke ramanî ya dewlemend bû jî. Mesela di Serdema Navîn de, berfirehbûna felsefeya rojavayê, meriv dikare bibêje ku bi saya rojhilatê pêk hatiye. Vedaparêzî, Brahmanîzm, Felsefeya Têkel, Dharma, Yoga, Samkya û Budîzm bineşaxên Felsefeya Hindîstanê *(Hindû)* ne. Yin Yang, Felsefeya Konfiçyûs, Daoîzm, Zen, Budîzma Çînê û Feng Shuî, bineşaxên Felsefeya Çînê ne. Shintoîzm, Budîzma Japon û Legalîzm, bineşaxên Felsefeya Japon in.
Sufîzm, Kelam, Îhvan-î Safa, Eşarîtî, Durzîtî, Mutezîle, Maturidî, Îşrakiyye, Selefiyye, Tabîyyun, Dehriyyun û Meşraîtî, bineşaxên Felsefeya Îslamê ne û Hurûfîtî, Manîheîzm, Bahaîtî û Zerdeştî jî, wekî binaşaxên Felsefeya Îranê têne dîtin.
ing: eastern philosophy
fr: philosophie orientale
tr: doğu felsefesi

**13- Felsefeya Serdema Antîk:** Felsefeya Serdema Antîk yan jî Felsefeya Yewnan ya Serdema Antîk, ew felsefe ye ku Beriya Zayînê di sala 700an de dest pê kiriye û heta *(Piştî Zayînê)* sala 500an ango heta Serdema Navîn berdewam kiriye, ye. Ji berbiçûn, dazanîn û kultura Yewnana Antîk û Romayê pêk tê. Bi navê felsefeya Serdema Pêşîn ya klasîk jî tê zanîn.
ing: ancient philosophy
fr: philosophie antique
tr: antik çağ felsefesi

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com

**Çavkanî: Ferhenga Felsefeyê – Ali Gurdilî**

**&**